

K.T.  
ZANÎGEHA WAN YÛZÛNCÛ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

TÊZA LÎSANSA BILIND



Dîroka Wêjeya Kurdî a Merif Xeznedar û Rol û Taybetmendîyên Wî

Jamal Mustafa Hamad

ŞÊWIRMEND

Alk. Doç. Dr.Nesim SÖNMEZ

Wan - 2017

T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ  
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI  
YÜKSEK LİSANS TEZİ



Maruf Xeznedarın Kurd Edbyat Tarihi , Rol Ve Özellikleri

Jamal Mustafa Hamad

DANIŞMAN

Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

VAN-2017

## ETİK BEYAN SAYFASI

Yüzüncü Yıl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü Enstitüsü Tez Yazım Kurallarına uygun olarak hazırladığım bu tez çalışmasında (Dîroka Wêjeya Kurdî a Merif Xeznedar û Rol û Taybetmendîyên Wî):

- Tez içinde sunduğum verileri, bilgileri ve dokümanları akademik ve etik kurallar Çerçevesinde elde ettiğimi,
- Tüm bilgi, belge, değerlendirme ve sonuçları bilimsel etik ve ahlak kurallarına Uygun olarak sunduğumu,
- Tez çalışmasında yararlandığım eserlerin tümüne uygun atıfta bulunarak kaynak Gösterdiğimi
- Kullanılan verilerde herhangi bir değişiklik yapmadığımı,
- Bu tezde sunduğum çalışmanın özgün olduğunu bildirir, aksi bir durumda Aleyhime doğabilecek tüm hak kayıplarını kabullendiğimi beyan ederim.

Jamal Mustafa Hamad

8-8-2017

## NAVEROK

MIJAR	RÛPEL
PÊŞGOTIN .....	III
KURTE .....	V
ÖZET.....	VII
ABSTRACT.....	IX
KURTEBÊJE .....	XI
SPASNAME .....	XII
DESTPÊK .....	1
1. Pêwîstiya Dîroka Wêjeyê û Girîngîya Wê : .....	1
1.1. Destpêk ji Dîroka Wêjeyê : .....	1
1.2 Zarevayê Dîrok - Wêjeyê : Pênaseya Dîrokê.....	2
1.3 Wêje û Girîngîya Wê Pênaseya Wêjeyê ( Edeb ) .....	3
1.4 Dîroka Wêjeya Kurdî .....	4
1.5 Hewlên Ji bo Nivîsandina Dîroka Wêjeya Kurdî.....	7
1.6 Nivîsîna Dîroka Wêjeya Kurdî Li gorî Serdem û Dibistana Wêjeyê.....	9
2. Bizotneweya Wêjeyê û Çawenî Nivîsandina Dîroka Wêjeya Kurdî .....	12
2.1 Çawenî Nivîsandina Dîroka Wêjeya Kurdî.....	12
2.2 : Sinorê Dîroka Wêjeya Kurdî Birîna Ramyarî û Coxrafî.....	14
2.3 Dariştina Dîroka Wêjeya Kurdî û Dema Nasandina Wêjeya Kurdî .....	28
3. Kurtîyek Di Derbarê Jîyan Nameya Prf. Dr. Meruf Xeznedar De: 1930-2010 .	36
3.1 Dîroka Wêjeya Kurdî Meruf Xeznedar Rol û Taybetmendiyên Lêkolîna Şîroveya Rexneyî .....	37
3.2 Berhemên wî .....	38
3.3 Nasandina Meruf Xeznedar Ji Alîyê Hevalên Wî Ve .....	39
3.4 Meruf Xeznedar û Dîroka Wêjeya Kurdî.....	41
3.5 Peywendîya Dinavbera..... Nujenîya Helbestên Kurdî û Meruf Xeznedar De	44
3.6 Meruf Xeznedar û Peywendîya Bi Yeketîya Nivîskaran Re.....	48
3.7 Rolê Meruf Xeznedar Di Pêşxistina Zanist û Wêjeya Kurdî De .....	50
3.8 Peywendîya Meruf Xeznedar Bi Helbestvan Nalî Re.....	53
3.9 Jin Di Helbestên Kurdî De .....	53
3.11 Bersiva Nameya Nalî Ji Alîyê Salim Ve.....	58
3.12 Jîyan û Serpêhatîya Salim .....	59
Encam.....	61

ÇAVKANÎ .....	62
Hinek Wêneyên Meruf Xeznedar.....	66



## PÊŞGOTIN

Wêje di alîyê hemû neteweyan de gelek girîng û pîrozîn . Ji ber wê min ev nivîsin li ser dîroka wêjeya kurdî a Meruf

Xeznedar û rol û taybetmendîyê wî da nivîsandin. Min ev navnîşane ji ber heskirina min a ji bo nivîskar û rewşenbîrê mezin yê kurd ( Prf. Dr. Meruf Xeznedar ) hîlbijart. Ez bi xwe xwendevanê vî birêzî bû. Wekî wefayekê bû, zilamekî xwedî zanîst, xwedî ferheng û fikrekî taybet bû ji bo alîyê hestên netewî û nivîsandina Dîroka Wêjeya kurdî û nasandina vê wêjeyê bi wêjeya cîhanê. Wêjeya neteweyan bi dirêjahîya temenê xwe bi demekî dîyar de derbaz dibe. Ev pêngava wêjeyê jî hertim di goherîn û pêşketinê de xwe dibîne. Di nava xwe de ev wêjeye rêzîknameyekî, berhemekî ,nûjenîyekî û tevlihevîyekî cîyawaz jê derdikeve holê.

Dema em behsa dîroka wêjeyê dikin, armanca me ewe ku destnîşankirina wê çaxêye ku hemû nivîskarên dîroka wêjeyê pêve xerîk bûn. Hemû li ser nivîsandina wêjeya serdema xwe ku li gel wê civakê, dem û serdemê bi guncê da ku bandorê li ser xwendevan û wêjeyê çêbikin. Wêjeya hemû neteweyekê bê goman xwedîyê cihekî taybete. Armanca me ne ewe ku tenê wêjeya wê netewê peywendî bi ya xwe ve heye. Li derdora sinora xwe tenê wateya wê heye. Belku berevajî dîroka her neteweyekê ye û dîroka hemû neteweyên din ê cîran û cîhanê ye. Ev wêjeye xwedîyê peywendî û bandora xweye li gele yên cîran û derdorê xwe. Di heman demê de ew hêz jî di bexşîne wêjeye neteweyan ku taybetib vi dîroka wêjeya wê neteweyê ve. Ev hêza taybetmendîyên xwe heye di alîyê Ramyarî, Deronî, Civakî, Ayînî, Aborî, Çandî û Folklorî de. Di vir de em dikarin bêjin, hemû neteweyek bi dîroka xwe bi nav û denge.

Dema nivîskarên wan hewla nivîsîna dîroka wêjeya xwe didin. Hestkirinekî bi dilsozî, wefayî, cihanîna erkê mirovî û reftarî nîştîmanîya xwe ne. Ji ber wê erkê li ser nivîskaran û xwedîyê fikirane. Wekî erkê xwe radibin dîroka wêjeya neteweya xwe ji navçûn û nebûnê rizgar dikin. Ev hêze xemxwerên nivîsîna dîroka wêjeya neteweya xwene. Radibin bi nivîsîna dariştinû dîrokê bi mekanîzmayekî guncawin. Dîroka nivîsî û sinorê û taybetmendîyên nava neteweya dîyar dikin. Ev hêze ji bo nivîsandina dîroka navxweyî û ji derve çî resenbe yan jî ne resen be. Ew sinorê dinavbera wan de bandora wan bi şeweyekî xweşik û guncaw dîyar dike. Her babetek jî di cihê xwe de dîyar dike. Dîroka wêjeya me jî li ser destê gelek nivîskar

û rewşenbîran hatîye nivîsandin. Yek ji van jî Prfê bi nav û deng û pispore di dîrka wêjeya kurdî de ( Dr. Meruf Xeznedare ). Vî nivîskarî dîroka wêjeya kurdî di pirtûkekî hef berg de komkirîye. Xeznedar bandorekî zêde li ser nivîsîn û nasandina wêjeya kurdî hebû di nava neteweya kurd û neteweyên cîran û cîhanê de. Neteweya kurd jî wekî hemû neteweyên cîran û cîhanê xwedîyê maf, kesayetî, mirovê zana, Rewşenbîr, û xwedîyê ezmûnek taybetin di jîyan û dîroka xwe de. Di heman demê de neteweya kurd jî xwedî dîrokek taybet ya xwene. Mirovên kurd jî wekî hemû mirovên li ser ruyê xwezayî xwedîyê pisportî û çalekîyên cor bi

Hertim hewla afirandina goherîna baş û xweşik de bû, ji bo bi destxistina babetên baş û wan babetan derxîne holê. Dinava wêjeya kurdî de cihek taybet yê xwe ûhêzekî tayber yê wêjeyî hebû. Lê belê rewşa ramiyarî û pirsgirêka coxrafi niştîmanî ev hemû rêgir bûn li ber pêşdeçûna vê wêjeya nemir . Gelek faktorên din yê cîyawaz hemû li beramberî dîroka wêjeya kurdî. Cîyawazîyekî wêjeya neteweyên din azadbîn û xwedîyê wan jî serbixwe bûn. Li gel van hemû şert û mercan hertim rewşenbîr û nivîsakarên kurd berdewam bûn di tekoşîn û hewildana ji bo nivîsandina dîroka wêjeya kurdî û rizgarkirina wê ji navçûn û nebûnê. Ev jî bû sedemê ku cihê dîrokê dîyar û di cihde bimîne.

Di alîyê xwe girtinê de jî bandorekî bi hêz li ser vê wêjeyê hebû. Di vir de nivîsakarên dîroka wêjeya kurd hertim hewla wê dayîne cihê wêjeya xwe serbixin û bi gehînin milê wêjeyên din. Em dikarin bêjin wêjeya me tevî wêjeyên din yê bîyanî bûn. Em dikarin bêjin peywendîyek bi hêz heye li gel wêjeyên din. Di vir armanca me ewe em bêjin wêjeya me wêjeyekî nûjene û taybet ya meye. Çipeywendîya wê bi wêjeya cîran û bîyanîyan re nîne. Dikarin bêjin berhemên hizir û fikrên me yê resen û bes. Ne armanca me ne ewe, belku armanca me ewe em bêjin wêjeya me ji bilî wê peywendîya wê bi wêjeya din re jî heye. Ji bilî hemûna hêza wergirtinê wê bandorîya pîlana dîroka wêjeyê bi şeweyekî giştîye. Li gel vê jî xwedîyê hêzekî û pîlanekî dîrokî taybet û berjengekî taybet a xweye. Pêwîste em temaşeyî wêjeya xwe rêya pêşketin û goherîna wê bikîn.

Jamal Mustafa Hamad

8-8-2017

## KURTE

Teza min pêkhatîye ji Pêşgotin, sê beş û encamê.

Beşê yekem pênc mijaran di nava xwe de digire. Mijara yekem, behsa zarevayê dîrok- wêje û girîngîya wê dike. Mijara duwem jî behsa rêbaza dîroka wêjeya kurdî dike, Ev jî li gorî Serdem, babet, qonax û wêjeyê.

Beşê duwem, ji sê mijaran pêk hatîye. Mijara yekem sinorê wêjeya kurdî, birîn, ramiyarî û coxrafî di nava xwede digire. Mijara duwem, dariştina dîroka wêjeya kurdî û dema nasandina wêjeya kurdî, di nava xwe de digire.

Beşê sêyem, diwazde mijaran di nava xwe de digire. Meruf Xeznedar rola wî dinava dîroka wêjeya kurdî de. Mijara yekem, Kesayetî û Rewşenbîrîya Meruf Xeznedar di nava wêjeya kurdî de behs dike. Mijara duwem, şewaza dîroka wêjeya kurdî Meruf Xeznedar çawenî zindîkirina dîrokê behsa dike. Mijara Sêyem, Behsa Wêjeya parçeyên din yên Kurdisatanê dîroka wêjeya kurdî a Meruf Xeznedar dike. Ev Teze lêkolînekî zanîstî û şîrovevî rexneyî di dîroka wêjeya kurdî a Meruf Xeznedar de rolê taybetmendiyên wî lêkolîn dike. Hilbijartina min ya vê navnîşanê dizivire ser heskirina min a ji bo Dîroka Wêjeya Kurdî. Soz û wefaya min bu ku Prf koça dawî kir. ( Dr. Meruf Xeznedar ) rojekê ez xwendevanê vî Mirovê nemir bûm. Bê goman hemû neteweyek xwedîyê Dîrok, Wêje, Folklor, Pexşan, Çîrok, Roman, Çand, Destanên cor bi corin. Di virde em behsa dîroka wêjeya kurdî dikin. Ka çi girîngîyek ya wê heye ? Ev bi şeweyekî pêwîst min dîyar kirîye di çawenî nivîsîna rêbaza wêjeya kurdî de.

Bêgoman ev jî li gorî dem û serdeman goherîn bi serde tê. Ev wêjeye di dirêjahîya dîrokê de bi şeweyekî cor bi cor goherîn bi ser de hatîye. Ji ber rewşa navçeyan di alîyê coxrafî, sîyasî û hebûna Mîrnîşana ku tê de wêje serî hildaye. Ji ber ku goherîna sinorên coxrafî bandorê li ser wêje û çandê dike. Dr. Meruf Xeznedar wekî xezîneya komkirina dîroka wêjeya kurdî tê zanîn. Ji ber ku gelek li pey zanîsta li ser dîroka wêjeya kurdî geraye û wesatn tê de dîtîye. Lê belê gelek girîngî bi helbestan daye, Pexşan, Çîrok û Destan pişt goh xistîye. Ev jî dikeve ber xala rexneyê.

Ji ber ku wêje tenê ne helbeste. Belkû tiştêkî mezin ji bo kurd û dîroka kurdî kirîye. Bi komkerê dîroka wêjeya kurdî tê zanîn. Eladîn Secadî gelek bi xweşik behsa dîroka wêjeya kurdî dike, behsa hemû helbest, Pexşan, Çîrok û Destanê dike. Lê belê



gelek bikurtî ne karîye wekî Xeznedar tiştan kombike. Her wiha Sedîq Boreky jî li ser dîroka wêjeya kurdî nivîsandîye. Lê belê gelek bêhêz dibînim. Xeznedar bandorekî zêde bi ser helbestvanên Kîlasîzmê hebû. Cihê nivîsîna wan gelek dîryar bû. Mirovekî dîyar û wêjevan xwedî hêza wêjeya kurdî tê naskirin. Xeznedar peywendîyekî zêde bi nûjenîya helbestên kurdî ve heye. Rolekî baş û dîyar bi ser helbetên nû yên kurdî de hebû. Ji ber wê jî Meruf Xeznedar wekî nasnameya Dîroka Wêjeya Kurdî tê zanîn.



## ÖZET

Bu tez önsoz, uç bölüm ve sunuđtan oluşuyor. Birinci bölümde beş konu yer alıyor, birinci konu, lehçe- tarih ve edebyatın öneminden bahsediyor. İkinci konuda kurdçe edebyatının işleyişin tarihini anlatıyor. Bunuda edebyat, konu, asır ve zamana göre işliyor.

İkinci bölüm, üç konudan oluşmaktadır. Birinci konu kurdçe edebyatın sınırlarını, politika ve cografi konulardan oluşmaktadır. İkinci konunun içinde de kurdçe edebyatın turemesi, kurd edebyatının tanıtım zamanını yer almaktadır.

Üçüncü bölüm, oniki bölümden oluşmaktadır: Meruf Xeznedarın kurd edebyatındaki rolunu içermektedir. Birinci konu: Dr.Meruf Xeznedarın şahsiyeti ve aydınlığını kurd edebyatındaki önemini anlatmaktadır. İkinci konu,Dr. Meruf Xeznedarının kurd edebyatının tarihi edasını nasıl canlandırdığını anlatmaktadır. Üçüncü bölüm, diğer kurdistan parçalarındaki edebyatı ve Dr. Meruf Xeznedarın kurd edebyatının tarihini anlatmaktadır.

Bu tez, Dr.Meruf Xeznedarın kurd edebyatındaki rolulun, özelligini, bilimsel ve bir eleştiri biçiminde kurd edebyatındaki etkinsini araştırmaktadır. Bu konuyu seçmemin sebebi de, kurd edebyatının tarihine olan sevgimdedir. Söz ve vefadarım ki Prf sozsuzlüğa uğurlandı. Bir gün( Dr. Meruf Xeznedar) öğrencisi oldum. Şüpesızki bütün halklar, bir Tarih, Edebyat, Folklor, Şiir, Destan, Öykü ve Kültürlere sahibtirler. Burada biz kurd edebyatının tarihini bahsediyoruz. Ne önemi var? Bu şekilde belirlememin ihtiyacımıydi kurd edebyatının anlatımınıda ve yazılmasında. Şüpesiz ki zaman ve asırlara göre deęişiyor. İller durumunuda cografi ve siyasi bir biriçimde ve o beęliklerin ki içinde edebyatın olduğunuda ele almaktadır. Çünkü sınırların deęişmesi edebyat ve kültür üzerinde büyük bir etkisi vardır. Dr. Meruf Xeznedar kurd edebyat tarihinin hazinesi olarak görölmektedir.

Çünkü Xeznedar kurd edebyatının üzerinde çok araştıрма ve kendide çok yer gezmiştir bu tarihi toplamak için. Ama şiirlere daha fazla önem vermiştir.Öykü ,Masal ve Destanlara fazla önem vermemiştir. Buda eleştirme yeridir.Çünkü edebyat sadece şiir deęildir. Kurdler ve kurd tarihi için büyük emek vermiştir.Dr. Meruf Xeznedar kurd edebyat tarihinin toplayıcısı olarak görölmektedir. Eladin Secadi de çok güzel bir şekilde kurd edebyat tarihininden bahsetmektedir. Bütün Şiir, Öykü,Masal ve Destanlardan bahsetmektedir.Ama kısa kısa toplamıştır Xeznedar

gibi deęildir. Aynı zamanda kurd edebyat tarihini üzerine yazılar yazmıřtır. Ama çok g¼çlü görmüyorum. Xeznedar kilasizim řairleri üzerinde büyük etkisi vardı. Xeznedarın modern kurd řiirlerinin iliřkısı vardır. Yeni kurd řiirleri üzerinde büyük ve iyi bir etkisi vardı. Bu yüzden Xeznedar kurd edebyat tarihinin kimlięi olarak bilinir.



## ABSTRACT

My research has been divided into an introduction, three sections and the last part is the conclusion. The first section is divided into five sub-sections. The first one is about the terms of the history of literature and the importance of it in this process. And the second sub-section in the first section explains the history of Kurdish literal doctrines according to the setting and literal doctrines and beliefs. The second section is also sub-divided into three sections. The first sub-section consists of the boundary of the Kurdish literal history and the political and geographical isolation. The second one in this section consists of the composition of the Kurdish literal history and its importance in the identification of the Kurdish literature. The third part is twelve sub-sections. (Marif Khaznadar and his role in composing of Kurdish literal history). The first part of the third section describes Marif Khaznadar and his role in the Kurdish literature.

The next one in this section highlights the style and the way of the Kurdish literal history by Marif Khaznadar and the proven history. The last part of the third section deals with literature of other parts of Kurdistan and the Kurdish History by Marif Khaznadar. This is a critical analysis and scientific research of Kurdish literal history by Marif Khaznadar which explains his role and significance through it. This is my deep love for Kurdish literal history and my being faithful for professor Marif Khaznadar that once a day, I was his student. It is important to say that all the nations have their own history, literature, culture, story and novel...etc that is why we here explain the History of Kurdish Literature and his attempts for it. As possible as I could I have identified them in the part which is related to the composing of the Kurdish literal style, and of course, it is changeable according to the setting.

The Kurdish literature has been changed along the history because of the geographical and political circumstances and the being of some emirates in the area where the literature was born in because the political geographical changes affect the literature and culture. Ph. D Marif Khaznadar is counted as the Kurdish historical haystack because he has a very great role in collecting and getting information about Kurdish history within his wide field searching. But poetry has been paid attention a lot when it seems that prose and story have been neglected by him and this is a critical point.

Because literature doesn't only consists of poetry but he has done something very great for Kurdish history which is counted as the Kurdish haystack for ever. Haladdin Sadadi writes about Kurdish literature in general. He writes about poetry, prose, epics, stories....etc but he briefly explains them not like Professor Marif Khaznadar in detail and great information. Sadiq Buraqi has also written about Kurdish literal history but it doesn't seem as strong as Marif Khaznadar. Marif Kkaznadar had a great affection on classical poets which appears well in his works, he is known as a great, professional and charismatic person in the Kurdish literature. He has a great role in the renewal form of the Kurdish poetry that's why he is known as the identity of the Kurdish literal history.

Key world : classical , political , geographical , Kurdish literal history , attention .

## KURTEBÊJE

Amd	:	Amadekar
B	:	Berg
Ç	:	Çap
H.r	:	Heman rûpel
J	:	Jimar
C	:	Cild
Ko	:	Kovar
R	:	Rûper
T	:	Tercume
Wer	:	Werger
Weş	:	Weşanxane
P	:	Pişt le newa û rû le kirrêwe
H	:	Hespim hewre û rikêfim çiya
d.n.	:	dîwanî nali
d.h.	:	dîwanî hemdî
d.c.	:	dîwanî cizîrî

## **SPASNAME**

Ez wekî pêwîst dizanim, di dawîya Teza xwede spasîya van birêzan bikim.

- Mamosteyê gelek rêzdar rêveberê Teza min ( Dr. Nesîm Sönemz )
- Temamî wan kesên ku di vê Tez û lêkolînê de ji min re bûyîne alîkar.
- Hemû wan kesên ku bûyîne alîkar, ew kesên ku pirtûk û çavkanî dayîne min, ewên ku wextên xwe ji bo min veqetandîn.
- Hemû wan Dr û Mamosteyên ku li zanîngeha Yüzüncü Yil a bajarê Wan ê di dema xwendinê de li gel min bûn.
- Mamosteya birêz ( Dr. Şukrîye Resul ) li zanîngeha Selaheddîn Kolêja Adab alîkarîya min kirîye.
- Mamosteya birêz ( Dr. Pexşan ) li zanîngeha Soran Kolêja Adab, wekî xwebexşekî ji min re bû rêvebir û alîkar . Gelek erk danîye li ser milê xwe heya ev Teza min xilas bû.
- Spasîya Hevjîna xwe dikim ku zêde bi min re bûye alîkar.

## DESTPÊK

### 1. Pêwîstîya Dîroka Wêjeyê û Girîngîya Wê :

#### 1.1. Destpêk ji Dîroka Wêjeyê :

Dîrok, lêkolîneke ji bo pêşxistina civaka mirovahîyê di alîyê sîyasî, civakî, aborî, fikrî, rihî û wêjeyî de. Peyva Dîrok : Şîrovekirina komek bûyerên di jîyana mirovan de çêbûye.

Zanîsta Dîrokê : Ew beşeye ku di zanîsta mirovan de armanc komkirina zanyarîyên serdema bûrîne. Di heman demê de jî piştrastkirina şîroveya bûyerane. Di her wê rêyê de jî armanca wê tomarkirina bûyeran bi şêweyekî rêzbendî yek li pey yeke. Lê belê ev lêkolîne, na sekine tîn berdewam wan bûyeran tomar dike. Belku jî hewil dide di rêya wan peywendîyên di nava bûyeran de heyîn, wan pêşketinên ku di jîyana netewan de çêbûyîn eşkere bike. Piştî jî eşkere bike ku ev bûyerane çawe çêbûne û sedemên wê çîne? <sup>1</sup>

Ji ber wê jî eger em temaşeyî wêjeya kurdî bikîn, emê bibînin dîrokekî mezin û belav heye. Em nikarin sînorekî dîyar ji bo wê dîyar bikîn. Ji ber ku heya niha nekarîne hewlekî dîyar ji bo yekxistina wêjeya kurdî û dîroka wê bidîn. Lê belê Dr. Meruf Xeznedar, bingehekî xweşik di rêya nivîsînê xwe de ji bo vê karî danîye. Lê ev jî ne bûye rêyek ji bo bidestxistina wan berhevan. Wekî dîyar û eşkereye ku ev hewildana li derodora çalekîyên take kesî zivirîye û ne karîye hewlekî di rêya dibistana wêjeyê de bi qirçîne.

Lê belê bi ser van hemû tiştan re eger em temaşebikîn wêjeya kurdî çend girîngîyekî taybet a xwe heye. Karîye di wan grupan de pênaseyekî xweşik ji bo netewa me bike.

Ji ber ku helbestvanên me di nava helbestên xwe de, bi şêweyekî xweşik rewşa jîyana kurdîyê di nava helbestên xwe de wekî wêneyan dîyar kirîne. Girîngtirîn babetên bi bandor di nava helbestên kurdî de nasmeya wêjeya kurdîye. Helbestvanan hewil dayîne bi şêweyekî xweşik wêneyên wan rewş û tirajedyayan dinava helbestên xwe de dîyar bikin.

---

Birwane . Rafit Xenîm, Flsafe Al Tarîx, r,23<sup>1</sup>



## 1.2 Zarevayê Dîrok - Wêjeyê : Pênaseya Dîrokê

Dîrok ew zanîsteye ku me pîspor dike li ser rewşa netaweyetî. Ev jî şaristanyetbe yan jî xwezaya ku ew netewe tê de derbaz bûye. Dîrok, dibistanekî mezine, me fêrî çend waneyên xweşik dike. Wisan bi me dike ku em tim waneya ji xeletîyên bûrî bigirîn û bi wêrekî li gel wan şer bikîn. Her wiha rêbereke ji bo em wêneyê destkeftîyên bûrî bikîn neynikek ya îro û dahatûya xwe pê ronî bikîn.

Dîrok, di bûyeran de şîrovekirin, eşkerekirin û lêkolîne, ne behskirina bûyerane. Her wekî Sîd Qtb, dibêje : (( Ji bûyeran pêknayê, belkû şîrovekirina bûyerane ))<sup>2</sup> . Ji ber wêjî hêza dîroknas jî derdikeve û dikare di rêya şîrovekirinek hur û xwendinekî rastî de wateyê bi bûyeran bide. Da ku bikare hinek pencereyên tarî berbi yên ronî ve veke. Bi kare ji bo rewşenbîriya jîyanê bikar bîne.

Lê belê li gel vê jî eger em bixwazin pênaseyek a dîrokê bikîn, em nikarî bi eşkereyî li ser pênaseyekê bi sekinîn. Ji ber ku her yekê bi şeweyekê pênaseyek kirîne. Di vir de emê hinek pênaseyên dîrokî bidîn dîyarkirin. Em dikarin bêjin : Dîrok tomarkirina bûyerê bûrîne, li ser bingehekî rast û bê alîye. Bingeheke ji bo gehîştina rastî û fêmkirina jîyana bûrîye.<sup>3</sup>

Pîrne ramanekî xweşik heye û dibêje : (( Dîrok, çîroka kar û destkeftîyên wan mirovaye ku di nava civakê de dijîn ))<sup>4</sup> .

Divir de em dikarin bêjin : (( Peyva dîrok di bingeha xwe du wateyên serekî heye : Yekem Buyerên bûrî û babetên dîrokî. Duwem : Zivirandine ke bûyerên bûrî di hêlekî zemande nîşan dike ))<sup>5</sup> .

Ev hemû komek ji wan fikrane. Hinek dîroknas û hizirvanan di vê derbarê dene. Pêwîste ev jî ji bîr neçe ev fikrane ne besin ji bo dîrokê. Ji ber ku dîrok ne zanîstekî babetîye û xwedî zagonekê be hemû li ser kom bibin. Lê belê hunerekî fikrî û lêkolîna şîroveyê pêwîste ji bo naveroka çawenîya lêkolînê. Ji ber wê jî dîrok ji kesekê ta kesê din tê gohertin.

Bi balkêşî di van pênaseyan de komek xalên bingehîn û giştî bi destme dikevin. Dikarin wekî xalekî giştî ya dîrokê jî bê temaşekirin. Ji bo anîna pênaseya

---

Brwane, ma hu Altarîx, Moqsî ( Mntadyat nhr Alhbîb ) Mîjoy Serdan, 20 / 11 /2016<sup>2</sup>

Wîkîbdya, Ahmîye Altarîx, Tarîx Alzyare : 8/11/ 2016<sup>3</sup>

Maykl Asntfûrd, Dramdrî Br Flsfê Tarîx, Trcme Ahmd Kl Mhmd, r, 206<sup>4</sup>

RamanSldn, Rahnmay Nsrye Adbî Mhasr, M. Ebas Mxrb, Grhnû, Thran, Cac Duwem,1377,r,206<sup>5</sup>

din jî dikare wekî alîyekê komek zagon û pîvanên lêkolîna dîrokê bê danîn. Girîngtirîn jî eva li jêre.

-Buyer û bûrîyê mirovan.

- Ji deronîya mirovên bûrî fêmkirin, bûyîna sedema wan a derketina bûyeran. Pêwîste ev jî bê zanîn , hemû pîvanên bûyeran pêwîste li ser bingeha dem be. Nabe dîrok di nihade bê nivîsandin. Pêwîste lêkolînek di wan demên bûrî de dur û desturwedana ayîdlojaya hizbî û desthilat bê kirin. Ji ber ku eger nivîsînên dîrokê bi keve jêr bandora desthilat de wê demê wê rastîya xwe ji dest bide.

- Dîrok li ber hestane dîrok li hember nasîne.

- Dîrok di rêya nivîsandin û mijaran de çêbûye. Eger em balê bidîn lêkolînên dîrokê her çi qas ji hev cîyawaz jî bin, lêbelê ev xalane beşekî girîng ya lêkolîna wane. <sup>6</sup>

### 1.3 Wêje û Girîngîya Wê Pênaseya Wêjeyê ( Edeb )

Di cihê xwe deye, emdi destpêkê de gotinekê li ser danîna pênaseyê ji bo wêjeyê bikîn. Lêbelê bi fikrên dîrokê û asta fikrîna rewşenbîran re, danîna pênaseyekî dewlemend ji bo wêjeyê ne asayîye.

Ji bo vekirina derîyê pênaseyekê di nava wêjeyê de ne asanîye. Ev jî heya di gehe pênaseyekî a wêjeyê berdewame. Di ferhenga wêje nasîya Rusî de hatîye, wêje pêktê ji hunera peyvên nivîsandîbe, yan jî ne nivîsandî be. Peywendîya wêjê î bi berhema xolqêner a serzarî ve hebe, ew jî Folklore. Wêje, beşeke wêneyê jîyana me dikişîne . Beşa bingehîn jî pêktê ji Destan, Helbest, Şanogerî û ( Dirama ) <sup>7</sup>

Her wiha zanayê binav û deng, Mersî dibêje : (( Wêje tomarkirina hizra pesende )) <sup>8</sup> Di vir de ez ne li gel vî fikrîme. Ji ber ku nabe wêje tenê li ser hizrên pesend bisekine Belku wêje tomareke ji bo tomarkirina peywendîyekî temam a jîyana gele. Lê belê divirde ez fikra Sîtîfodbrk, ez bi pesend dizanim ku dibêje : (( Weje, ew hest, soz û hizr û bawerîye ku di dilê hişyaran de perwerde dibe û bi şêweyekî wisan dinivîsîne ku bala xwendekar hemû li cem xweve dikêşîne )) <sup>9</sup> .

---

<sup>6</sup> Hejar Ehmed Abdulfexor Brwane Ruwanînekî Rexneyî Leser Nusînewey Mêjoy Edebî Kurdî, Nemeş Dokuratî, Zanokî Silêman, Dr. Fazil Mecîd Mihemed, Silêmanî, 2013, r, 16  
Şukrîye Resûl, Edebî Kurdî Hunerekanî Edeb, 1989, r, 77

Şukrîye Resûl, Edebî Kurdî Hunerekanî Edeb, r, 88

<sup>9</sup> Ezîz Gerdî, Edeb û Rexne, Çapî Yekem, 1997, r, 6

Her wiha Eladîn Secadî jî dibêje : (( Wêje.... ew coreye ku dinav de, komek zanyarî, helbest û wêneyên ciwan, huner, mûzîk, dilrevîn û peyvên xweşik li xwe di gire ))<sup>10</sup> Em di karin di vir de bêjin, erkê serekî yê wêjeyê hest, hilçûn û xweşikbûnê di demekê de bi me bide.

Lê belê pênaseya herî berfireh, li gorî min ewe ku Mîşal Asî kirîye û dibêje: (( Wêje, yek ji pênc hunerên xweşikin. Wekî nîgarkêş û peyketiraşan ne. Wêje jî wekî wan karekî xweşike ))<sup>11</sup>.

Di encama wan hemû fikir û pênaseyan de em gehiştin wê biryarê ku, wêje ew neynike hemû ew tiştên di nava civakê de hene. Pêwîstî bi kes û civakê giştî heye li ser bandor bibe. Di heman demê de wêje hewil dide wan hemû êş û xemên beraberî civakê tîn wêneyekî xweşik jêre çêbike. Bi giştî em dikarin bêjin; wêje ew neynîkeye ku nivîskar wêneyê rastî ê civakê li ser kêşaye. Hewil dide ruyê rastî yê wê civakê dîyar bike.

Eger em temaşe bikîn, wêje hertim girîngî û taybetîya xwe heye. Ji ber ku wêje neynîka civakê bi giştîye. Wêjeya her neteweyekê heya demekê şanazî bî wêjeya xwe dike. Eger em temaşe bikîn emê bibînin çî neteweyek nîne ne xwedî wêjeyek taybet a xwe be û şanazî pê neke. Ew şakarên wêjeyî ne tenê remzin ji bo wêjeya netewan, belku hêmayekî xweşike ji bo wêjeya cîhanê û mirov şanazîyê pê dike. Mînak : Elyaze, Homîros, Donkîşotê Sîrvantîs, Şer û Aşîtîya Tolsto, Berhemên Şekspîr, Şahnameya Fîrdewsî û Çarîne Xeyam û Mem û Zîna Xanî di wêjeya kurdî de berhemên wêjeyîne. Tenê ne şanazîya neteweya xwene, belku şanazîya ji bo hemû mirovatîyê ye.<sup>12</sup>

#### **1.4 Dîroka Wêjeya Kurdî**

Dîroka wêjeyê beşekî ji dîroka giştî neteweyan û dura dibe ber bernamêyên dîrokî. Di dîroka giştî de hinek rastî hene behs dike kû ser bi serdema bûrîye û li gel niha peywendîya wan hatîye birîn.

Di dîroka wêjeyê de helbest û pexşan her bi bandor û zindîne. Ji ber ku hêza şîrovekirina hizir û sozê heye. Dema dîroka wêjeya her neteweyekê jî çêdibe samanekî wêjeyî jî li cem wan çêdibe û şayena nivîsînêne.

<sup>10</sup> Eladîn Secadî, Edebî Kurdî û Lêkolînewe LeEdebî Kurdî, Bexda,1967,r,9

<sup>11</sup> Dr. Mîşal Easî, Alfn Aladb, Bîrot,1970,r,74

<sup>12</sup> Ezîz Gerdî, Edebî Berawirdkarî, Çapxaney Zankoy Selahedîn,Hewlêr,1987,r,6-7

Dîroka wêjeyê zanîsteke, behsa çawenîya ziman wan helbestan û pexşanên ku ji mere mayîn dike. Bilindî û nizmîya wan derdixe, di derbarê karê jîyana hozanvan û nivîskar û wêjeyê de dibêje.

Dîroknasê wêjeyê hewildide di sedemên serekî yên berhemên wêjeyî bikole. Girîngtirîn xalên ku li ser kardike evên li jêrin.

**Yekem** : Derfetên xwedîyê wêjeyê, bi wateyekî berfireh a derfetan, encama xwezayê û serdema civakî.

**Duwem** : Kesayetî û nava wêjeyê, dîrok nivîsê wêjeyî di karê xwe de dîroka wêjeyê lêkolîn dike.

**Babeta Yekem** : Mijarên wêjeyî, çend taybetmendîyên naverok, form, endîşe, peyv, hevok û dariştinên giştî heye.

**Babeta Duwem** : Derfete, bêjer di jêr sîberê de, mijarên wêjeyî afirandîye. Pêngav pêngav di jîyana taybet de sermayedar û karker bûye.

**Babeta Sêyem** : Jîyana wêjevan, bi ayetan mijarên wêjeyî xolqandîye. Arkolojîkin ji bo wî demî û cihê ku têde jîyayîye.<sup>13</sup> Eger em temaşe bikin emê dîroknasekî mezin ê kurd Dr. Meruf Xeznedar û Eladîn Secadî bibînin. Gelek bi hurî li van xalan fikirîye.

Bê goman hewldanên Dr. Meruf Xeznedar yên ji bo rêxistina dîroka wêjeya kurdî nayê veşartin. Dîyartirîn hewlên wî hemû dîroka wêjeya kurdî di şeş bergan de komkirîye. Di nav de behsa hemû wêjeya kurdî û hemû parçeyên kurdistanê kirîye. Helbestvanên mezin wekî mînanan ji xwe re werdigirin. Hinek ji helbestan têxe ber lêkolînê û fikrên nû yên li ser wê rêyê perdeyê li ser wêjeya kurdî a veşartî radike.

Di vir de hewlên Dr. Meruf Xeznedar girîng bûn. Lê belê hewlekî dî hebû ji bo nivîsandina dîroka wêjeyê kurdî daye. Eladîn Secadî jî hewlên xwe di pirtûka bi navê ( Mêjoy Edebî Kurdî ) yek xistîye. Tê de di destpêkê de behsa dîroka gelê kurd, binegha kurd, şîrovekirina peyva ( Kurd ), hejmar û cihê niştecihên kurdan, jîyana civaka kurdan û her çar parçeyên kurdistanê dike. Piştî jî behsa dîroka wêjeya kurdî dike. Wêjeya kurd wêjeyek nebû ku jîngeyekî guncaw û bê naskirin. Ji ber ku hertim zil û sitemkarî di wan rojên bûrî de bi ser wan de hatibû.<sup>14</sup> Lê belê behsa wê dike ku gelê kurd bi rexmê wan hemû rewşên ku bi ser wêjeya kurdî de hatîye, hîna jî ne hiştîye we wêjeya xweşik a xwe ji dest bide. Belku behsa wê dike

<sup>13</sup> Kamil Hesên, Mêjoy Rexnesazî, Nawendî Xezel Nus, Çapî Yekem, 2015, r, 26

<sup>14</sup> Eladîn Secadî, Mêjoy Edebî Kurdî, Bilawkirdnewe Kurdistan, Çapa yekem, 1391, r, 118

kurd xwedîyê wêjeyekî di cihê xwe deye wekî wêjeya cîhanî bikeve ber girîngî û lêkolînê. Ji ber ku dibêje: (( Wêje bi kurtî di destanên bûrî û di pendên pêşîyan û helbestên helbestvanan deye.

Gelek sitemkaran hizra komkirina wan nekirine. Yan wêneyê wan jî di asîmanê wêjeyê de û sitêrkan de ne dibûn. Belkû hebûn ))<sup>15</sup>. Em dibînin ku Eladîn Sedacî di pirtûka xwe de dîroka wêjeya kurdî di sê rêçkeyan de dîyar dike.

**Yekem:** Behsa efsaneyê wêjeya kurdî dike. Çend mînakek werdigire û lêkolîna li ser dike.

**Duwem :** Piştê gotinên pêşîya û pendê pêşîyan jî werdigire.

**Sêyem:** Helbestên nazik yê helbestvanên mezin ê kurd werdigire. Hewil dide di rêya xwendina yek şîroveya vê dîroka wêjeyî nîşan bide ku heta niha ne dîyar maye.

Di destpêkê de behsa wê dike, destan di nava wêjeya kurdî de girîngî pê daye. Ji ber ku cihên kurdan de hertim cihê ceng û şêr bûye di her parçeyên kurdistanê de ev merdî derketîye holê.

Piştê jî Secadî hewil dide dîroka wêjeya kurdî di rêya çîrokên de nîşan bide. Ji ber ku çîrokê di nava hemû wêjeya cîhanê de girîngîya xwe heye.

Ji ber wê nayê veşartin di wêjeya kurdî de jî hevîkê wêjeya cîhanê jî çîrokên xweşik bandora xwe heye. Babetên çîrokên kurdî jî raste rastbin yan jî ne raste rast bin rewşa kurd nîşan didin. Her wekî Secadî dibêje: (( Kar dikin ser xerîze û atîfa hevdu. Qet çîrokek di kurdî de destnakeve vale be di yek ji wan her du tiştan..... Çîrok mil bi milê wî qewmî tê xwarê û perdeya jêr jîyan civakî, exlaq, bilindî, nizmî di meydana şarstanîyetê de vedibêje ))<sup>16</sup>. Lê belê mixabin beşek zêde ji çîrokên kurdî nemane. Ji ber ku wekî me behskirî xwezaya kurdan hertim cihê şerê dewletan bûye, ne hiştîne binivîsin.

Di beşek din de Secadî hewil dide beşek din yê wêjeya kurdî ku pêktê ji pendên pêşîyan bêxe ber lêkolînê. Wekî dibêje : (( Kurd di alîyê pendên pêşîyan de wêjeyekî bilind heye. Pendên pêşîyan û çend gotinên kurt yê kurdî bi hev re hatîne nivîsandin. Wateyekî bilind di wan de heye. Di çaxekî gelek kevin de ketîne ser

---

<sup>15</sup> Eladîn Sedacî, Mêjoy EdebîKurdî,r,118

<sup>16</sup> Eladîn Sedacî, Mêjoy EdebîKurdî,r,122-123

zimanê kurdî. Çawenîya jîyan retarê hizir û bawerîya, çi di alîyê sîyasû civakû û çi alîyê jîyana xêzanî .... nîşan didin ))<sup>17</sup> .

Em dikarin bêjin hewlên Dr. Meruf Xeznedar ji bo nivîsîna dîroka wêjeya kurdî ji hemûyan mezintir tê li ber çavan. Lê belê nabe em bêjin kêmasîyên wê nebûn. Lê her çi qas girîng jî be her kêmasîyên wê gelek bûn. Ji ber ku ger em balê bidîn dinav wê pirtûkê ku wêjeya kurdî û dîroka wê tê de kombûye bi vî navî hatîye.( Dîroka Wêjeya Kurdî ). Eger em bi hurî li gel naveroka wê berhevbigîn heya demekê na guncê. Ji ber ku Dr. Merud Xeznedar dîroka wêjeya kurdî di çarçêweya helbestan de komkirîye. Nîva din jî ji pexşan pêk hatîye. Mînak : Çîrok, pendên pêşîyan, şano û ev corên babetan pişt goh xistîye. Ev piştîre di mijara duwem de bi dirêjî behs kirîye.

### **1.5 Hewlên Ji bo Nivîsandina Dîroka Wêjeya Kurdî**

Elbet nivîsîna dîroka wêjeya netewan karekî girîng pêwîste. Ji ber ku dîrok neynikekî rone ji bo berçav û ronîkirina demê bûrî. Lê belêdi nivîsîna dîroka her neteweyekê komek rêbaz û bingeha şewaza taybet berçav dike. Ji bo wêjî di dema nivîsînê de bi hurî lê bê fikirîn.

Eger em balê bidîn wêjeya kurdî, ji bo nivîsandinê pewîstî bi rêbazekî taybet axwe heye. Kurd xwedî zimanekî taybet û xwezayekî taybete. Ev jî raste rast û ne raste rast di dema nivîsandinê de bandorê li ser nivîskar dike. Dîrok ne zanîste wekî zanîstên din her çawe be dawîyek encamek heye. Nivîsînê dîrokî ji nivîskarekê ta nivîskarê din tê gohertin. Dr. Meruf Xeznedar jî her çi qas nivîskar û hizirmendekî mezin bû, lê belê xwe di hinek bûyerên girîng de diveşêre.

Ji bo ku ji alîyê kesekêve ber pa bûye û li gel ayîdlojîya xwe ne guncê. Bi taybetî gelek bûyerên girîng li ser şoreşgerên mezin ê Hewlêrê rudaye. Nek amade nebûye behs bike belku dijayetî pêve dîyare. Ji ber wê di nivîsînê dîrokî de hinek caran hinek caran mîzana nivîskar bûyeran mezin dike û hinek caran jî biçûk dike.

Di nivîsînê dîroka wêjeya kurdî de jî gelek nivîskarên mezin derketîn. Ji wana ( Refîq Hilmî, Secadî, Borekey û Xeznedar....hwkd ). Ji bo nivîsîna dîroka wêjeya kurdî her yek ji wan rêbazek taybet ya xwe hebû. Mînak; her du nivîskarên bi nav û deng Refîq Hilmî û Secadî gelek din, hinek nivîskaran mijarên xwe hene.

---

<sup>17</sup> Eladîn Secadî, Mêjoy EdebîKurdî,r,139

Hewildayîne di dema nivîsîna dîroka wêjeya kurdî de helbestvan û nivîskar wekû çavkanîyekî giring ji bo nivîsînan bi karbîne.

Em dikarin bi eşkeretir bêjin Secadî di nivîsînên dîroka wêjeya kurdî de, zêdetir girîngî bi helbestvanan daye. Lê belê destnîşan dike ku kurd xwedîyê helbestvanên zêdene, netenê ewin yên ku bixwe behs kirî. Belku ewî diçarçûveyekê de komê helbestvanên navçeya hewlêr, Silêmanî û Kerkukê wergirtîye ku bi Soranî helbestên xwe nivîsîne. Gelo dikare wêjeya kurdî tenê di çarçûveya helbestvanên soranî yên wan bajar kurt bêkirin ? Bê goman ev xalekî lewaze di nivîsîna dîrokî ya Refîq Hilmî de dîyar dibe. <sup>18</sup>

Nivîsînên Secadî di aliyê nivîsîna dîroka wêjeya kurdî de heya demekî zêde rêbaza wî wekî ya Refîq Hilmîye. Lê belê wî ne tenê helbestên soranî wergirtîye belku helbestên her çar zarevayan wergirtîye . Her çawê jî be kêmasîyên gelek tê de derketîne. Tenê behsa çîrok , Efsane û Helbestan dike di çarçûveyekî kurt û teng de. Di dibistanên wêjeyî de ne karîye behsa helbestvanan bike. Her wiha ne karîye peywendîya di nava helbestvan û fikrên wan de bi şeweyekî eşkere bike.

Lê belê ya bi vî karî ve pêwîst karekî rast kirîye. Karîye behsa helbestvanên her çar dîyalektîkan bike û bi zivirînê ser dibistanê. Eger em balê bidîn ser şewaza nivîsîna wî heya demekî zêde bi mizana xwe kar di dîrokê de dike û dure ji her pîvanekî zanîstî. Mînak : Ew a ku di pirtûka sîyem de behs dike tevî berhemên helbestvanan ne. Şewaz û rêbaza di nava wan de bi eşkereyî dîyar ne kirîye. <sup>19</sup>

Lê belê ya di vir de armanca meye û em behs bikîn, Dr Meruf Xeznedare. Ji ber ku em dixwazin vê berhema wêjeyî girîng bikîn ji bo wêjeya kurdî û kurdawerî. Wê dîyar bikîn ka heya çi demî hêzek di nivîsînên dîroka wêjeya kurdî de serkeftîye ? Gelo aliyên wê ê baş çîne û di çi de derdikeve? Di heman demî de di karên mirov de hest bi çi kurîyê dike. Gelo xalên wê yên lewaz çîne li ber çavê xwendevan û rexnegiran dikeve ?

Bê goman nayê veşartin ku mercên guncaw û girîng ji bo nivîskar di karên xwe de serkeftî be. Li gorî min mercên Xeznedar gelek goncawtirin ji ber ku heya demekî gelek ji yên din serkeftîre.

---

Hilmî, Şîr û Edebyatî Kurdî, Hewlêr, 1988, r, 5<sup>18</sup>

Borekey, Sedîq Sefîzade, Mêjoy Wêjeyî Kurdî, Antşarat Nacî, Çapî Yekem, 1370, r, 2-5-12<sup>19</sup>

Alîyê baş yê vî karê wêjeyî Xeznedar di wê de dîyar dike. Ewa di nivîsînên dîroka wêjeya kurdî de girîngî bi helbestên mezin daye . Ev jî bixwe bixwe karekî girînge ji bo komkirina wêjeya kurdî. Evjî ji alîyê helbestvanên her çar parçan ve hatîbe nivîsan din yan jî jêr bandora xwezaya her dewletekî dagirkerê kurdistan de nivîsî be.

Her wiha xalekî din jî Xeznedar eşkere kirîye di vê qonaxê de. Helbestvanên di yek serdemê de bi hev re behsa wan kirîye . Mînak : Helbestvanên şerê cîhanê yekem bi hev re û yê duwemî her wisan. Ew jî wisan dike berçav û ronîyekî ciwantir be xwêner û dîrokê bide.

Em dikarin bêjin Xeznedar di kêmasîyan de bê beş bûye. Dema ku em valê didin wî karê wêjeyî komek kêmasî ber çavê me dikeve. Ev jî bûna xalên lewaz yê Meruf Xeznedar di nivîsînên dîroka wêjeya kurdî de.

Yek ji wan xalên ku hetî dikare zêdetir wan hemû nivîsînên di jîyana helbestvan û helbestan de çir bike. Tê wê wateyê ku wêje di alîyê wî de ji helbestan pêktê. Ev jî bi tena serê xwe xeletîyekî mezine. Belku di pişt helbestê de, pexşan, çîrok, çîroknivîs, roman û komedyaya meruf xeznedar van hemûyan bi wateyekî kirîye çavkanî. Ev jî xeletîyekî mezine, jiber ku rastîya kurdî û dîroka wêjeya kurdî di çîrokan de derketîye. Ji ber ku cihê jîyana kurdan çîyayî ye herî zêde rewşa dil reqî derketîye û di nava çîrokê de derketîye. Ev jî wêneyekî ronîtir ji bo dîrokê eşkere dike.

Di heman demê de xedreki mezin jî li hunera şanoyê tê kirin û girîngî ne hatîye dayîn. Belkû her behsa wê jî ne kirîye . Eger em bi hurî temaşe bikin di rêzikên zemande hunera şano di nav kurdan de hebû. Belkû buka barênê dîyartirîn wan mînakên ku xelk di cihê tempîlê de dikirin. Ew û çendek din berçavan dikevin, pêwîste lê bê fikirîn.

## **1.6 Nivîsîna Dîroka Wêjeya Kurdî Li gorî Serdem û Dibistana Wêjeyê**

Dibistana wêjeyê wateya wê, rêketina komek helbestvan, nivîskar, hizirmendan bû li ser rêbaz û şewaza nivîsîna wêjeyê bû. Mînak : Dibistana Kîlasîk komek gelbestvanên bi hêz rêçek taybet ya xwe hebû. Dibistana Romansîzim jî rêçkeyek taybet ya xwe hebû....hwkd. Ev bi xwe karekî girînge, di wêjeya Ewropî û Erebidê bi şeweyekî eşkere derket. Komek helbestvan bihinek fikrên coda re li dorê



kombûn. Lê belê ew dibistane di xalekî hevbeş de komkirîbûn, ew jî zagon û rîsayên dibistanê bûn.

Rêkxistina wêjeyê di çarçûveya çend dibistanekê de karekî girînge ji bo lêloloînavan. Ewên radibin bi nivîsînên dîroka wêjeyê û dîyarkirina sinorê wêjeyê ye. Eger em balê bidîn ser wêjeya kurdî di dema dîyarkirina sinorê wêjeyê û nivîsîna dîrokê de komek pîrsgirêkên mezin derdikevin pêşberî me. Ji ber wêjî helbestvan û hizirmendên kurd ne karîne çend dibistanên taybet yên xwe çêbikin. Belkû li derdora çend dibistanekê kombûne ku cihê reçe û zagonên wan de ketîne. Lê belê ev nayê wê wateyê ku helbestvanên kurd nekarîne berheman çêbikin. Çend helbestvanên mezin me hene, karîne raste rast bibin neynikekî ronî û rastî ku tê de rewşa kurdan reng bide.

Em dikarin bêjin me jî dibistanên kilasîzim û romansîzim....hwkd hene. Lê ew kilasîzim û romansîzm cudane ji ya Ewropa. Ji ber ku herî zêde li gel şert û mercên me guncaw bûn. Bi cilekî kurdî fikrekî kurdî derketin.

Lê dîsan ji ber wê me nekarî dibistanek taybet a xwe çêbikin. Di heman demê de me nakrî di çî serdeman de yek dengîya me hebe. Ji bo vê jî komek helbestvan li ser kom biibin û bûne pîrsgirêkekî mezin ji bo dîyarkirina sinorê wêjeyê. Yan jî me ne karî sinorê sereman dîyar bikîn da ku dîroka wêjeya kurdî pê dibistanekî wêjeyî bi nivîsîn.

Her çawejî be nabe em sîstîyekî di nava dîroka wêjeyê de çêbikin. Ji ber ku dema dinava wêjeya kurdî de jî behsa kilasîzmê tê kirin raste rast helbestên kurmancû yên di nivê sedsala 19 an de di çarçûveya Mirê Baban de serî hildide. Rêberê wê rêxistinê jî pêkdihat ji her yek helbestvanên bihêz yên dîyar ê wî serdemî. Girîngtirê wan jî ( Nalî, Salim û Kurdî ) bûn. Rêbaza wêjeyê jî sîma û taybetmendîya xwe hilgirtî bû. Heya dawîya şerê cîhanê ê yekem ev rewşe dinava wêjeya kurdî de serwer bû. <sup>20</sup>

Ev jî nayê wê wateyê ku me di pêşîya wan de helbestvan nebûn. Belkû komek helbestvanan pêşîya wan nivîsîne. Lê belê ne karîne di heman demê de wêneyekî xweşikbin ji bo dibistana kilasîzim û ew xwezaya ku kurd têde jîyane. <sup>21</sup>

---

<sup>20</sup> Rêzan Salih Mewlud, Endîşey Şîr Le Nêwan Rêbazî Kilasîk û Romansîkî Kurdî LeKurmancî Xwar, Namey Macester Zankoy Koyê, 2007,6-7

<sup>21</sup> Azad Ebdulwahîd, Niwêkirdnewe Le Şîrî Kurdî Da Le Dway Cengî Cîhanî Yekem Ta Salî 1970, Kerkuk, 2006,r,111-112

Eger em bi hurî balê bidîn ser helbestvanên kurd dîsan pirsgirêkek din derdikeve pêşberî me. Me helbestvan hene pêwîstîya wan bi dibistana hene. Belkû tevlihev hemû corên helbestan nivîsîye.

Ji ber wê jî di vir de eger em balê bidîn (( Ew hemû nûjenîya di wêjeya kurdî de derketî, nikare biryara wê bide ew rêbaza wêjeyî di wêjeya kilasîzmê de serkeftîye. Tenê di nava her du, cenga cîhanê de helbestvanekî wisan ber çavê me nakeve tenê ev rêbaz girtî be. Wekî wêjeya nû hemû berhemên wî jî dibin bandora vê rêbazê debîn ))<sup>22</sup> .

Ev jî rastîyekî dîyare, her wekî Dr Meruf Xeznedar misogerîya vê dike. Helbestvan ( Dildar ) wekî mînakekê digire û dibêje : (( Dildar di qonaxekî gelek aloz û teng de jîyaye. Ev alôzî û tengîye jî bandor li berhemên wî kirîye. Xebatekî zor bazî di nava dibistana kilasîzim,teqlîdî û bizotneweya helbestên nû ( Romansîzim) de bû.<sup>23</sup>

---

<sup>22</sup> Xorşîd Reşîd Ehmed, Rêbazî Romantîkî Le Edebî Kurdî da,r,112

<sup>23</sup> Meruf Xeznedar, Le Babetî Mêjoy Edebî Kurdî we, Bexda, 1894,r,62

## 2. Bizotneweya Wêjeyê û Çawenî Nivîsandina Dîroka Wêjeya Kurdî

### 2.1 Çawenî Nivîsandina Dîroka Wêjeya Kurdî

Ev bizotneweya wêjeyî di dema destpêkirina mirovatîyê de serîhildaye. Ji ber ku hemû neteweyek xwedîyê çand û folklorê xwe ne Di encamê de bizotneweyekî wêjeyî neteweyî çêdibe. Bihemû corekê di nava meydana wêjeyê de rolê xwe dibîne. Ev wêjeye gelek kevne li pêşîya îslamê û neteweya kurd hebû. Her di wî demî de wêje serî hildaye. Lê belê gelek sadebû. Bi şeweyê ser zimanê dev bi dev gerayîye. Ji ber wê gelek lewaz bûye û rastî nebûnê hatîye. Hinek ji hizirvan dibêjin li pêşîya Îslamê kurd xwedîyê wêje û helbestên xwe bû. Ev jî di nivîsîna Eladîn Secadî û Sedîq Borekey û di gelek nivîsînên helbestvan û nivîskaran de hatîye nivîsandin. Hinek beytên helbestên kurdî destnîşan dike. Behsa hatina Erebb Misilmanan dike ji bo Kurdistanê.

Li gorî hinekan ev Beytên hatîneçêkirin helbestin. Her wiha Dr. Îbrahîm Ehmed Şivan dibêje : (( Di demê xwe de Erebban bi navê helbestên Cahîlî komek helbest girêdabûn. Li gorî hinek nivîskaran kevîntirîn nivîs li Îrana kevin heye. Ji ber ku wan nivîsandin li ser dîwar û Şikeftan dinivîsandin. Kaxezên Zerdest Sirodên wane. Ev jî ne tenê mafê Farisane kurd jî xwedîyê wêne. Li gorî hinek Rojhelat nasan zimanê Avesta zimanê madeyan ))<sup>24</sup> . Kurd jî pişt dema medeyan li ser hemancoxrafyaye madeyan dijîn. Di demekê de îslamê wekî dewletek ya xwe spart. Zimanê rewşenbîrên xwe ferz kir. Di vir de helbestvan û nivîskarên Faris û Kurd di nivîs û wêjeya xwe de dest ji ziman berdan û bi zimanê Erebbî nivîsandin. Ev jî di sedsala 1-2-3 koçî de nivîs bi zimanê Erebbî bû. Piştî nivîskarên Faris û Kurd hewildan tiştan bi zimanê xwe binivîsîn. Her wiha Dr. Îbrahîm Ehmed Şivan, dibêje : (( Yekem helbestvanê ku helbest bi zimanê Farisî nivîsî ( Rudekî 954 e ) bû ku du beyt afirand. Piştî wî ( Fîrdews 323-371 ) koçî di ( 370-371 ) koçî de dest bi nivîsandina Şanameyê kir. Li derdora ( 400 ) koçî ji wê nivîsînê xilas bû))<sup>25</sup> .

Em dikarin bêjin di sedsala 5 ande helbestê li Îranê pêngava pêşketinê dîye. Gelek helbestên wî demî babetên Sitayîş, Destan, Dildarî, Sofîgerî , Îrfan û Tesawif bûn. Ji ber sofîgerî û Tesawifê helbestvan ji sîyaset û desthilatdarîyê dur ketîne.

---

Îbrahîm Ehmed Şivan, Edebî Konî Kurdî, Çapxaneya Zankoya Sellahedîn, 2012<sup>24</sup>

Îbrahîm Ehmed Şivan, Edebî Konî Kurdî, Çapxaneya Zankoya Sellahedîn, 2012<sup>25</sup>

Helbestvanên mezin û bihêz yên wê Seredemê ( Babe Tahirê Hemedanî, Xeyam, Nasir Hisro, Ferxedîn Gorkanî... û hwkd ). Ev helbestvanên wêjeya kevin û Sed sala 5 an a koçî bi helbestvanên du beyt bi nav û deng bûn. Berhemên helbestvan û nivîskarên kevin yên kurdî, dîroka wêjeya kurdî li ser helbestvan Babe Tahirê Hemedanî heya Sedsala 20 an wekî wêjeya kevin yan jî wêjeya Kilasîkî dihatin naskirin. Em dikarin bêjin Dr. Meruf ku dîroka wêjeya kurdî nivîsîye, li gorî min bi dîroka serhildana wêjeya kurdî destbi nivîsandinê kirîye. Ev jî bi Babe Tahirê Hemedanî destpê dike bi wêjeya Goran û wêjeya Ehlî Heq piştire.

Wêjeya Kurmancîya Jorîn û Navîn, wêjeya xarê êdî behsa helbestvanên (Kilasîk û Kilasîzim ) herî zêde behsa serhildana wêjeyê nû dike. Wekî van helbestvanan, Melayê Cizîrî, Şêx Nurî Şêx Salih, Qedrî Can , Goran û Cegerxwîn...hwkd .

Êdî behsa helbestvanên Kilasîkî û helbestvanên nûyên wêjeyê nu ya kurdî dike. Behsa çawenî serhildana wê bingehe û jîyana ku helbestvan tê de jîyan kirî, hestên Netewayetî, heskirina ji bo wêjeyê bi hêrsa wê serdemê helbestvanan nivîsandîye , bandora li ser wêjeya kurdî û wêjeya Farisî, Erebî hemûyê dike. Behskirina Dr. Meruf Xeznedar li gorî serhildana helbestvanan bûye. Behsa dîroka wêjeya û rêgeza wêjeyê çawe derbazkirina wê ji cihên din pêşketina wêjeyê û ew serdema ku helbesttêde nivîsandîye ji aliyê helbestvan û nivîskarên wê demê bê goman komek zagon û desturên xwe hebûn dike. Piştî ku goherîn bi ser da çû her weku Destan di destpêkê de helbest bû piştire Pexşan hat navde. Piştire hemû bû Pexşan. Yan jî wekî Şanoname ku di destpêkê de pêkenîn û Tirajedyê bû piştire corek destan çêbû bû pêkenîn û Tirajedyê ( Tiragedyê ). Em kurd jî xwedîyê lirîk û destanin. Ji ber wê em dibêjin Dr. Meruf Xeznedar rolekî girîng hebû di nivîsandina Dîroka Wêjeya Kurdî de. Gelek xem dixwar ji Bizotneweya wêjeyî û hertim hewil dida zanyarîyan li ser kombike. Her wiha Eladîn Secadî jî hewlekî zêde daye ji bo komkirina zanyarîyan li ser dîroka wêjeya kurdî. Girîngtirîn karê wî nivîsandina dîroka wêjeya kurdî bû. Du caran li Bexdayê çap kir, 1952-1971, van her du çapan jî destpêkê heya navîna Sedsala 20 an . Ew çavkanî û amêrênku heya

wê dema ku di nav de bi kartîne. Dema pirtûka Secadî hatî belavkirin rolekî mezin dît di dîroka wêjeya kurdî de. Her wiha karê herî girîng yê Secadî a hatî belavkirin ( Rişte Mirawî ) bû ku ji 80 bergan pêkdihat û di sala 1957 an de li Bexda

yê çap kir. Secadî her dîroka nivîsandîye wêje ne bû. Belkû Roman, Çîrok û Pexşan nivîsekî bi hêz û lêkolînavanekî jîr bû. Secadî di hemû alîyê wêjeyê de rolekî berçav hebû, kurd jî hertim şanazî bi nivîskar û helbestvanên bivî awayî dikir. Dîroka wêjeya kurdî parastîne û bi wêjeya cîran û cîhanê dayîne nasandin. Gelek Rojhelat nas û Nîjadên hene li ser dîroka wêjeyê nivîsandîne. Her wiha Eladîn Secadî li ser Babe Tahirê Hemedanî dibêje : (( Helbestvanekî kurd yê Sedsala 3 a hicrî bû. Li gorî hinek belgeyên dîrokî , dewrê ( Sahibê Kurê Ebdula ) û ( İbnî Sîna ) filozof dîtîye. Ev hemû di çaxa hukmeta ( Buye ) an de jîyan kirîne. Babe Tahir helbestvanekî kurde ji binemala ( Lor ) yan bû wekî di vê çarîne de eşkere kirîye, bi temamî şêwe zarê xwe gotîye. ))<sup>26</sup> .

Dilî dirîm z eşqt gîc û wîçe                      Moje berhem zenem xûna berîce.

Dilî eşq be sanî çûp terbî                              Serî suçê, serî xonabe rîce.

Di vir de ji mere tê dîyarkirin ku Bizotneweya wêjeya kurdî Bizotneweyekî bihêz û karker bû di meydana wêje, huner û dîroka wêjeya kurdî de. Bê goman ev Bizotneweye li ser desyê hêz û hizrê, dlsozîya çendîn helbestvan, nivîskar û rewşenbîrên kurd çêbûye. Dest bi nivîsandina vê wêjeyê kirîne da ku ji nebûn û navçûnê bi parêzin. Ev jî ji mere dide destnîşankirin ku ji Sedsala 3 a koçî ji alîyê helbestvanên kevin yê Kilasikî Babe Tahirê Hemedanî, Xeyam, Nasir Xesro û Fexredîn Gorkanî...hwkd. Piştî wê helbestvanên nû yê vê serdemê wekî Melayê Cizîrî, Ehmedî Xanê, Cegerxwîn, Feqîyê Teyran, Nalî, Salim, Eladîn Secadî, Emîn Fewzî, Prf. Dr. Meruf Xeznedar û Dr. Ezaledîn Mistefa Resul...hwkd. Evan hemû jî bandora wan hebû li ser nivîsîna dîroka wêjeya kurdî û hemûyan tomarkirin di Tekstên xwe de.

## 2.2 : Sinorê Dîroka Wêjeya Kurdî Birîna Ramyarî û Coxrafî

Dîroka wêjeya kurdî xwedî sinorekî mezin û firehe. Di vir de emê behsa sinorê wêjeya neteweyekê bikîn ku ew jî netewa kurde. Ji bo vê jî armanc cudakirina wêjeya kurdî ji wêjeyên dine. Baştirîn alavê jîbo dîyarkirina vî sinorî netewa meye. Dema em balê didîn ser nivîskar, pispor, ziman û wêjeya netewa kurd, giştî tekezîyê di vê dedikin ziman sedemeke ji bo cudakarina sinorê wêjeya hemû neteweyan. Di vir de dibêjin; zimanê kurdî amraza cudakirina wêjeya kurdî ji wêjeya neteweyên

---

Eladîn Secadî, Mêjoy Edebî Kurdî, Çapî Yekem, 1391, r, 180<sup>26</sup>

dine. Armanca me divê lêkolînê de ewe, em behsa helbest û wêjeya kurdî bikîn. Ne behsa wan kesên xizmeta zimanê bîyanî kirîne û zimanê xwe ji bîr kirîne. Di rastîyê de ev jî cihê rexneyê ye. Ji ber ku me di vê derbarê de nivîskarên gelek mezin hene. Karîne wêjeya xwe bi gehînin asta wêjeya bîyanî. Ew jî girîngîyê bidin wêjeya kurdî. Dr. Meruf Xeznedar yek ji wan kesaye ku mora xwe li wêjeya kurdî û sinorê dîroka kurdî daye. Tê dîyar kirin ku gelek fikir û nivîsînên cîyawaz yên wêjeya kurdî heye. Gelek tişt li ser dîroka wêjeyê nivîsîne . Her yek ji wan gotin û fikrên taybet yên xwe hene. Tiştên baş û girîng nivîsîne. Mînak: wekî, Eladîn Secadî, Refîq Hilmî, Dr. Meruf Xeznedar, Ezaledîn Mistefa Resul û gelek yên din....hwkd.

Li gorî Sedîq Borekey, cîyawazî dinavbera wêjeya kurdî û herdu wêjeyên din Erebi û Farisî de heye. Dibêje : (( Wekî darmamikekî di nava her du darên bilind deye. Gêlê kurd gelek xizmeta wêjeya kurdî kirîye. Ev wêje parastîye mil bi milê Erebi û Farisan re xizmeta vê wêjeyê kirîye. Gelek pirtûk û name bi van du zimana nivîsîye û çap kirîye. Eger em bixwazin em dikarin pirtûk û nameyên hunerî ê wan nivîskaran bixwînin ku xizmeta dîroka wêjeya kurdî kirîne. Bi her du zimanê Farisî û Erebi nivîsîne. Ji bo tomarkirina wan jî pêwîstî biçend pirtûk û bergan heye )) .<sup>27</sup>

Di heman demê de nivîskar û rewşenbîrên bi hêz wekî, Dr Meruf Xeznedar di dîroka wêjeya kurdî de rolekî mezin ya wî hebû. Bandorek mezin ya wî li ser nasandîna û eşkerekirina wêjeya kurdî bi cîhan û taybet yeketîya sovyetê re hebû. Rolekî berçav yê wî hebû di nivîsîn û tevlîkirina wêjeya kurdî de. Di derbarê nivîsînên vê dîrokê û taybetî nivîsînên Erebi û çanda îslamê de dibêje : (( Em di wê demê de şanazîyê dikin dema kurd beşdarî gelek pêşxistinên samanê erebi û îslamî bûne. Nabe berhemên cê babetê bînin di nava berhemên neteweyî de )) <sup>28</sup> . Nabe em bêjin hemû berhemên hatîne nivîsîn bi zimanê kurdî hatîne nivîsîn û diçin xaneya wêjeyê de ? Yan jî armanca wêjeyê çîye ? Ji bo vê bersivê pêwîstî bi pênaseya wêjeyê heye. Dr. Meruf Xeznedar dibêje : (( Dîroka wêjeya kurdî ji gotinên xweşik ên kurdî pêktê. Ev gotinên xweş, di çend şaristanî, civakî, netewî hizran di mirovan de çêdike. Axaftinên xweşik hemû jîyanê di goherîne. Mînak : Wekî, nîştîman perwerî, kurdîtî, netewayetî, mirovatî, jîyana civakî, dildarî, destbazî, muçê, mêbazî, serhatîyên netewî, samanên netewayetî, ezmunkirina gelan, sofîzim, ayîn, bîr û

---

<sup>27</sup> Sedîq Borekey ,r,4

<sup>28</sup> Meruf Xeznedar,r,75

bawerî, karkirina hunerê bi ser jîyana mirovan de, hewildanên ji bo çêkirina jîyana civakî, wêne kêşana di nava hest û nestên mirovan de û gelek tiştên din ))<sup>29</sup> . Eger em bi baldarî temaşeyî peyvên xeşik yên vî rewşenbîrî bikîn, em dikarin bêjin nivîsînên wî li cem xendevan û dostan dîyare. Li gorî Meruf Xeznedar di alîyê jîyanê de wêje xizmetkirina mirovane.

Dr. Meruf Xeznedar, di nivîsînên xwede gotinên xweşik û tiştên xweşik behs dike, daku bikare heya demekê destnivîsînên xwe ji hev cuda bike. Dr. Meruf dibêje : (( Wêneyê jîyana rast ew jîyane ku helbestvan û nivîskaran çêkirîye û pêwîstîya wan jî bi gotinên xweşike. Eger gotinên xweşik ne be xwedîyê gotinan ne hunermend û nivîskarin. Belkû tişteke dine dîrokanase, zanyare yan jî endazyare. Hemû tişt jî ne tenê helbestvan û nivîskare ))<sup>30</sup> . Em di vir de li gel Dr. Meruf Xeznedar hemfikirin.

Hemû deman peyvên xweşik gotinên xweşik ji bo her kesî pêwîste, ji bo axaftina bi kesê beramber re. Pêwîste helbestvan, nivîskar û hunermend jî di nivîsînên wêjeyî de gotinên xweşik bikar bîne. Di rastîyê de xweşikbûn dikare nivîsa ji hev cuda bike. Ev jî wê radigehîne xweşikbûn di dîroka wêjeyê, huner û nivîsînên wêjeyî de goherînên cor bi cor bi xwe ve girêdide. Em dikarin divir de bêjin, gelo xweşikbûn çîye ? Ev peyve ne xerîbe, dema di dîroka wêjeyê huner û axaftinê de dikole. Em dikarin pênaseyên cor bi cor liser çawenîya wêjeyê û çawenîya xweşikbûnê bikîn. Ev core ji ber berfirehîya dîroka wêjeyê me di gehîne babetên zanîstî yên li ser xweşiktî, dîroka wêjeyê û hunerê de.

Her du nivîskar û wêjevanên kurd ( Dr. Meruf Xeznedar û Eladîn Secadî ), pênaseyên cîyawaz hebûn ji bo wêjeyê û nêzîkbûna di navbêra dîroka wêjeyê û sîyasî de, ji bo vê jî em baş dizanin bingeha herî bihê ya her neteweyekê pê bê naskirin wêjeyê. Ji ber ku her neteweyek xwedîyê çand û wêjeyekî taybet ya xwene. Di gelek tiştan de ji hev cudane. Lê belê bi wêje û hunerê re di rîya nivîskar û dostan re tevî yek dibin. Tê dîyarkirin ku wêje sedemekî herî girînge di nava netewe û cîhanê de. Li gorî min dîroka wêjeyê pêşîya dîroka sîyasî dikeve. Di rastîyê de ev sinore berfirehe ne amadeye bê biçûkkirin. Dîroka wêjeyê hevdem dibe li gel dîroka sîyasî. Dîroka wêjeyê hertin rê nade bê teng kirin. Belku di firehîyê de pêngavên zêde diavêje ji bo xizmetkirina wêjeyê. Wekî Eladîna Secadî dibêje : (( Ev pirtûke her çî

---

<sup>29</sup> Heman Çavkanî, r,155-157

<sup>30</sup> Heman Çavkanî, r, 157

qas dîroka wêjeya kurdîye, lê belê ji ber zanîna vî qewmî dîroka wêjeyê pêwîste. ))<sup>31</sup>  
 . Secadî hertim hewil daye wêneyekî xweşik ji bo dîroka kurdîyar bike. Wekî zanîstekî bêxe di nava xwendevanan de. Di heman demê de dîroka wêjeya kurdî bi dîroka wêjeya neteweyên din bide naskirin. Secadî divê derbarê de dibêje : (( Eger em bixwazin behsa dîroka wêjeyê yan jî suda wêjeyê bikîn, yan jî di derbarê dîroka wêjeyê de axaftinan bikîn, pêwîste em vê bizanîn wêjeya kurdî kareke diderbarê qewmê gelê kurd deye. Çi goherînek bi serde hatîye ? Yan jî helbestvan çî dewrek wergirîye ? Yan jî wêjeya vî helbestvanî çî bûyer çêkirîye ji bo wê navçeya helbestvan tê de jîyayîye ? Yan jî xelkê derdor çî aqilek û reftarek hebû, di mejîyê wî helbestvanî de deng daye ? Li gel wî jî berhevkirina wêjeya kurdî li gel wêjeyên bîyanî ))<sup>32</sup>. Em dikarin bêjin nivîskarê bi hêz û pîspor dîroka wêjeyê hertim hewil û tekoşîn daye. Di heman demê de pêwîste bi hurî çavderîya brê civakî, sîyasîya wî tiştî, bi giştî hewlu mirovên barê deronîya xelkê bide û bizane. Nivîskar alîyê civakî bi hurî çavdêrî dike.

Ji ber ku pêwîstî bi wêje û pêşketina wêjeyê ye. Di nivîsîn û helbestên Eladîn Secadî de hertim hestên netewî yên xweşik derdikeve. Di heman demê de şanazî bi kurd û neteweya xwe kirîye. wekî di vê derbarê de dibêje : (( Rojekê min tiştêk xwend di dawîyê de min hizir kir em bêjim di nava dilê min de bi hurî lêk ned, gelo ez çîme ? Erebin, îngîlîzim ? Ji dil ez kurdim. Di vir de pîrsyarek ket mejîyê min. Başê ez kurdim pêwîste netewa min kurdbê. Eger ez ji netewa kurdî bim pêwîste têgehiştî bim. Kurd navê wê di rupelên rojane de heye. Ew jî qewmekî yê xweye. Gelek ne çî ketim di nava deryaya xeyalan de ew jî dayîka gelan bû. Bêgoman pêwîste zimanek, wêjeyek û dîrokek hebe. Eger nebe bi çî nayê hesabkirin û çî tiştêk nîne. Di vir de serê min têk çû . Ez temaşeyî xwe nekim tiştêk din nîne tenê kurd nabe. Eger ez temaşeyî alîyê din dikim pêwîste hemû tiştên din hebê. Gomînek ji dilê min hat. Min li dilê xwe da û min got : Belgeya qewmî zimanê mine ))<sup>33</sup>. Ereb, Faris û İngîlîz her yek bi zimanekê dinivîsîn. Em ew nebûn em tiştêkî dinin. Ev taybetmendîye jî di ziman de destnîşan tê kirin.

---

Eladîn Secadî, r7<sup>31</sup>

Heman Çavkanî, r,69<sup>32</sup>

Heman Çavkanî, r,72<sup>33</sup>



Em dikarin bêjin Secadî hizrek, hestekî pîroz ê netewî nîştîmanî û kurdperwerî hebû. Gelek girîngî bi ziman û wêjeya neteweya xwe daye. Armanca wî ewe kurd jî wekî hemû neteweyên din xwedîyê maf, çand, wêje û dîrokê ye. Secadî çavkanîya netewa xwe û nasandina dîroka wêjeye kurdî bû.

Berhev kirîye li gel wêjeya bîyanî. Prf û wêje nasê kurd, Prf. Dr. Meruf Xeznedar, gelek bi hurî behsa dîroka wêjeya kurdî dike. Ji bo vê armancê pirtûkekî ji hef bergan ji bo dîroka wêjeya kurdî û xwendevanên gelê kurd çêkirîye.

Di vir de ji me re dîyar û eşkere dibe, nivîskar û helbestvan hertim berdewam di hewildan û tekoşînê dene ji bo xizmetkirina dîroka wêjeya kurdî û nasandina wê bi wêjeya cîhanê. Ji ber ku wêje sedemekî girînge ji sîyaseta di nava dewletê de jî ne kêmtire. Belkû wêje gelek pêştire. Di vir de sedacî misogerîyê têxe ser civak sîyasatê û behsa wan dike. Hewil û mercên sîyasî hewlû mercên kesên civakîne. Şert û mercên sîyasî jî pêwîstî bi afirandina mijarên wêjeyîye. Eladîn Secadî gelek caran diçe dinava dîrokê de. Ew qas jî bi xerîkê peydakirina zanyarî û dîrokê dibe. Ew qas xerîkê wêjeyê nabe. Em jî hemfîkrê Secadî dibin. Ji ber ku dîrok gelek girînge û dikeve pêşîya wêjeyê. Pêwîste dîrok jî bi rêk û pêkî bê eşkerekirin ji bo xwendevanan. Ji bo vê armancê jî (( Bi hurî dikare bikeve nav singê hinek hurkarîyê babetên dîrokî. Behsa hinek eşîret û binemalan dike. Wekî Eşîreta Caf, 469-273, Hemewendî 544-547, her wiha binemalên Erdelan û Baban, Palanga 532- 537 û Sahêbqranekan ))<sup>34</sup>. Gelek zanyarîyan li ser wan komdike û eşkere dike. Dema em berhemên Secadî dixwînin hîn zêde pisporê dîrokê dibîn û ev jî di çapa duwem de tê dîtin. Ev nivîsîna Secadî herî zêde armanca wê gihandina zanyarîyên dîrokî bûye. Lê belê hinek tişt li gel wêjeyê ne eşkere û ne guncawin. Di serdema Secadî de rojname û Govar rolekî berçav hebûn ji bo gehandina dîroka wêjeyê. Secadîdi berga yekem a pirtûka xwe de behs dike wekî zêdehîyek di babetên wêjeyî û dîrokî de derdikeve. Ji me re derdikeve holê kû Rojname û Govar rolekî girîng hebûn ji bo pêşxistina wêjeya kurdî.

Em nikarin bêjin Secadî di nivîsînên xwede zêde ronî kirîye. Ev jî behsa dema şaristanî û wêjeya cîhanî kirîye. Eladîn Secadî gelek evîndarê wêjeya neteweya xwe bîye, hertim hestên netewî û nîştîman perwerdî di hizirê wî debû. Di dirêjîya nivîsîna xwe de behsa destpêka serhildana wêjeyê dike û dibêje : (( Di çêbûna

---

<sup>34</sup> Eladîn Secadî, Mêjoy EdebîKurdî, Bexda, 1971, r, 77-78

mirovatî û adem de wêje hebû, ev jî wê radigehîne ku wêje tevî jîyan, ayîn û destoran bûye ))<sup>35</sup> .

Di dîroka destpêkê de wêjeyê sînorekî fireh û dirêj heye . Her wiha Prf. Dr. Meruf Xeznedar, di derbarê destpêkirin û serhildana wêjeyê, wêjeya cîhanî a kevin, wêjeya misrî, Girekî û komek wêjeya bi ser çandê de behs dike. Her wiha behsa wêjeya latînî, Hindî û çînîjî dike. Di heman demê de behsa pirtûkên pîroz yên Semanî dike wekî pirtûkên ayînî, Quran, Tewrat, Încil Zebor, Avesta û pirtûkên pîroz yên Hindistanê dike. Armanca wî di vir de ew bû ji her yek ji wan hinek zanyarî bide xwendevanên wêje û dîrokê. Em jî dixwazin bizanîn Dr. Meruf Xeznedar ji bo babetan behskirîye û çî peywendîyek bi wêjeya kurdî ve heye. Tenê di behskirina Avestayê de her pêncên din jî destnîşan dike. (( Pirsgirêkên navxweyî nivîsandîye ev jî hinek nivîskarên din jî hene behsa vê kirîye wekî ; Shad .

Dr. Meruf, qet bi berhevkirinê û şibandinê ne daye destnîşankirin. Ev jî dibe ku li gorî fikrê Xeznedar wêjeya hemû netewayan di destpêkê de hemû wek hevbin. Wekî dibêje : (( Min bihîstîye hatîye gotin yek wêje di nav debû. Ew wêjeya bab û bapîrên kurdan a nihaye. Yan jî ew netew hoz, gel, civakên ku niha li ser xaka kurdistanê jîyanî ne. Ev jî îranîyên kevin bûn di pêşîya wan de Hînd û îranî bûn di pêşîya wan de jî Hind û Ewropî bûn ))<sup>36</sup> . Dibêjin wêje gelek kevne di gel çêbûna mirovatîyê de hebû û destpêkirîye. Li gorî hizra Dr. Meruf ev wêjeya bab û bapîran heya nihajî pişt bi pişt maye di jîyana rojanede berbi pêşve çûye. Dibêjin wêjeyê wekî temenekê ye heya roja dawî a temen dimîne.

Prf . Dr. Meruf Xeznedar wekî pisporekî deryaya zanîsta wêjeyê û dîrokê, bi hurî diçe nav bingeha serekî a wêje, ziman û dîrokê de. Behsa wê alfebeya di nava kurda de bikartê dike. Her wiha behsa ayîna kurd û wan ayîna dike ku dinava kurdan de hene. ( îslam, Zerdeşt, Êzidî, Yaresan , Mesîhî û...hwkd ) Ji bilî van babetan behsa rewşa jîyana civaka kurdewarî û jîyana civaka kurdî dike.

Behsa çand çawenîya jîyan, çîn, rêveberîya civaka kurdewarî, hebûna xwarinû rewşa jîyanê, Teqlîd, civaka bavsalarî, desthilatîya jinê çawenîya kar û pêşewa di nava civakê û jîyana xêzanê, çawe pêkhatina xêzanê û rewşa jîyana civaka kurdewarî têxe ber çavê xwendevan. Ji ber vê jî pêwîste bi hurî temaşeyî her yek ji van babetên kû

---

Heman Çavkanî, r,218-225<sup>35</sup>

Heman Çavkanî, r,71-72<sup>36</sup>

behsa wan hatî kirin bikîn. Pêwîste mirov pisportîyekî baş ji wan çêbike û her yek ji van babetan jî ji naveroka wêjeya kurdî pêktên. Ewa ku me di van babetan de behs kirî heya demekê ne eşkerebûn.

Lê belê nivîskar hewildaye (( komek zanyarî bêxe ber destab û tevî çand û wêjeyê bike. Di heman demê de jî ev komek zanyarîyên giştîne, rolê wan dîyarkirina wênyê veşartî ye. ))<sup>37</sup>. Ev babetên wêjeyî ji aliyê gelek nivîskarên dîroka wêjeyê ve hatîye behskirin. Li gorî Sedîq Borekey ev babete girînge behsa wê kirîye. Rabûye ew zanyarîyên li ser wan kesên ku Qurana pîroz zivirandîye ser zimanê kurdî komkirîye û eynen ew kesan dîroka wêjeyê jî nivîsîne. Behsa ferheng nivîsan dike. Di encama vê de ji mere derdikeve holê ku dîroka wêjeyê çî rolekî girîng ya wê heye, di zanyarîyên giştî de. Pêwîste eger em bizanin dîroka wêjeyê biçe di nava vî qalîbî de wê demê ji babetên xwe dur dikeve. Sedîq Birokey di berga sêyem a pirtûka xwe de, pêşîya ku here li ser behsa helbestvan, nivîskar, rewşenbîr, zanyarîyên li ser çand, ziman, felsefe, Efsane, wêje û çîrok...hwkd dike. Lê belê di behskirina wî de li gorî min heman behskirina bergê yekeme. Li gorî xwendina min û fikrê min, divî bergî de sinorê dîroka wêjeyê ne eşkereye, sinorê wêjeyê jî heya kur diçe ne dîyare. Her wiha Borekey di nivîsînên xwe de beha zimanê Pehlewî û zimanê kurdî û nêzîkatîya di navbera wan de dike. Dibêje: (( Di nava zimanan de gelek tişt mayîyen nikare ji hev cuda bike ))<sup>38</sup>. Di vir de borekeyî gelek hewildan kirîye li ser wêje, ferhenga kurdî û zimanê kurdî li gel ziman û wêjeya Farisî tevî hev bike. Ji ber wêjî bi hurî diçe di navavê babetê. Sedîq Borekeyî dibêje: (( Di encama lêkolîna xwe de ez gehiştîme wê bêjim ku her du zimanê Farisî û Kurdî çavkanîya wan yeke ji yek bingehê hatîne. Çavkanîya wêje û ferhenga herduyan zimanê pirtûka Avestaye, ji ber wê gelek hunerên kurdî hevalên hunera îranîne de ketine tekoşînê bilindkirina wêje û ferhenga îranî))<sup>39</sup>. Borekeyî hewlên zêdetir dide ne tenê wêje û ziman. Belkû behsa nivîsîn û çawenîya nivîsînê dike. Dibêje; Şêwazî nivîsînê bi xetên masî sorat û pehlewî ye. Herî zêde behsa kurdî û îranîya dike sinor di nava wêjeya kurdî û farisî de nîne. Ev lêkolîna Borekeyî me di gehîne wê encamê ku embêjin nivîsîn û batên dîroka kevnin. Pêwîste kesên pispor hewla rastkirina wê bidin. Ji ber ku pêwîstî bi

---

Meruf Xeznedar, r, 132-155<sup>37</sup>

Heman Çavkanî, r, 157<sup>38</sup>

Sedîq Borekey, 7-57<sup>39</sup>

saxkirinê heye. Ev jî ji ber sedemê fikrên cîyawaz yê din vana nivîskar û pisporên ziman û wêjeya kurdî û farsî dene. Dema em temaşeyî bergê sêyem yê Borekyî dikîn, hinek wêjevan û nivîskarên wekî ( Refîq Hilmî, Mela Cemîl, Kemal Celal Xerîb, Hisên Hiznî, Tofîq Wehbî, Celadet Bedirxan û...hwkd bi hurî behsa wan dike ). Lê belê pêwîste behsa berhemên wan bike, di cihê behsa dîrok, coxrafya û zanîst...hwkd . Hewil bide di nava dîroka wêjeyê de cihê wan jî bike.

Gelek ji nivîskaran behsa dîroka kurdî dikin. Bi xweşî behsa derketina dîroka wêjeya kurdî dikin. wekî Prf. Dr. Meruf Xeznedar, Eldîn Secadî û Borekeyî...hwkd. Bi taybetî jî Secadî bi xwe hestekî baş pêkirîye, heya demekî di dîroka wêjeya kurdî de derketîye. Li gorî wî ( Dema nivîsîna pirtûka ) xwe de gotinek rast di derbarê ( Kurd ) de dibêje. Li gorî wî ew behsekî dîrokî di derbarê wê de çêbike )<sup>40</sup>. Ev nivîsîna ne ser dîroka kurd yan jî dîroka wêjeyê dinivîse. Ji dil heya demekê sud bexşin. Di heman demê de hinekkes hene di nava nivîskar û rojhelat nasan de hertim berdewam di xwazin çavkanîyên kurdî bi şewinin. Ev jî ew tez û nivîsîneye kili ser Hewramî û Lorîyan heye )<sup>41</sup>. Gelek caran nivîskar bi vî awayî dinivîsîn, jibo armanca dîyarkirin û razîkirina taybetmendîyên dîrokîne. Di vir de pêwîste em bêjin gelo wêje heya kurderê diçe ? Di heman demê de evhemû peyv, dariştinên xweşik ku helbestvan û nivîskar û dost behsa wê dikin ew peyv çîne û kîjanin ? Destpêka wêjeyê dinava helbestvan û nivîskaran de heya demekî dor û dirêj berhemên wêjeyê tenê helbest bû. Ev jî eşkereyekû bingeha wêjeyê bi ser vê wêjeyê de serwere. Eger di wî demî de helbestvan û nivîskaran dîroka wêjeya kurdî binivîsîna. Wî demî hîna pexşan û berhemên hunerî derneketîbûn. Di vir de ji me re derdikeve wêje gelek pêşîya Pexşanê û hunerê ye. Dema pirtûkan dixwînin temaşeyî serdema nivîsîn û demê wan ê dîyar dikin. Wekî pêwîstî girîngîyên cor bi cor bi berhemên wêjeyî didan. Herî zêde bandorî di helbest û wêjeyê de derdikeve. Armanca ku helbeste li gorî min ji bilî helbestê çî babetên din derneketîne. Di heman demê de gelek ji nivîskar û helbestvanan bi cidî hewla sinorê van nivîsînên xweşik û gotinên weşik detnîşanbikin. Di pendên pêşîyan, Çîroka û babetên Efsaneyî de.

wekî pêwîst maf, nirx û bihayê xwe ne dayê. Her wiha li ser vê babetê gelek nivîskaran tişt nivîsîne. Her zêde pêwîstî bi eşkerekirina vê babetê dîtîne jibo nivîsîna

---

Heman Çavkanî,r ,43<sup>40</sup>

Heman Çavkanî,r,15-22<sup>41</sup>

li ser wêje û hunerê. Yek ji wan jî hizir û fikrê ( Sedîq Borekey ) bû di çîroka, efsane û pendên pêşîyan de. Em nikarin bêjin hemfîkrê ( Secadî ) bûye, di vê babetê de dibêje çîrok di wêjeyê de çêbûye. Armanca wî ewe ku di encama serhildana wêjeyê de wêje bandora wê bi ser çîrokê de serwere. Ji bo vê babetê behsa ( Mesheba Reş ) dike. Pişre jî di çê sedsala 13 an û hinek xwendinên xweş li ser çêdike. Hinek çîrokwekî ( Mesela wijdanû di xeman ) de di hizire. Komêk nivîs li ser dinivîse û piştê jî behsa wan çîrokên nivîsî dike. Destnivîsekî xweşik hebû di nivîsîna çîrokan de ). Di nivîsînên Borekey de hinek sistî pêve dîyare. Wekî em bêjin gelek di aliyê wêjeyê de ne pispor bû. Nikare bi temamî behsa wêjeyê bike Di xwaze xwe bi corekê jê derbaz bike. Ev jî di wî demê de hest pêdike ku behsa serhildana rojname û govara dike. Di vir de wê eşkere dike, pêwîste pisporîyekî di sedemê faktora girîngîya dîroka wêjeya neteweyî hebe û bêxe ber çavan. Di heman demê de nivîskar, armanca me Sedîq Borekey e, di gelek nivîsandinan de behsa nivîskarên dîroka wêjeyê dike û behsa wêjeya cîyawaz dike. Bi corekî hewil daye taybetmendîya berhemên helbestvan û helbestan derbixe . Lê belê ew qas hewil ne daye taybetmendîyên Pexşan û Çîrokê derbixe. Dema em temaşeyî berga sîyem a pirtûka wî bikî em bi eşkere dibînin, behsa çîrok û berhemên beşek ji nivîskarên kurd dike. Wekî ( Secadî, Qirîçî, Cemal Nebez, Kamuran Mokrî, Mihemed Mam Xal û...hwkd ) . Borekey di gel behskirina van nivîskaran de hewil dide hinek taybetmendîyên van wêjevanan dîyar bike. Di vir de herî zêde behsa rojname govar,serhidan û çêbûna çîrokê , Pexşan, pendên pêşîyan û hinek wêjeya nu dike.

Prf.Dr. Meruf Xeznedar, ê ew jî behsa vê babetê dike û gelek zêde li bendê dimîne û bi ciwantir behs dike.Hewil daye behsa nivîskarên cîyawaz bike û gelek girîngî bi babetên helbest û huner taybetmendîyên wan daye. Ew qas jî girîngî bi rojname û govaran ne daye. Dr. Meruf Xeznedar, di gelek nivîsînên wî de soz û heskirinek taybet ji bo nivîskar û helbestvanan hebû. Em dikarin bêjin Xeznedar afrêner û pelewane çîrok nivîskar û helbestvanan bû. Di nivîsînên wî de gelek behsa çîrok, pexşan û pendê pêşîyan ne kirîye. Ev jî di pirtûka wî ya dewlemend de derdikeve. Rabûye dîroka wêjeya kurdî di hef beran de nivîsîye. Gelek bi hurî behsa wêjeyê dike, di bergê heftemde behsa komêk helbestvanan dike. Mînak : ( Hisên Qizilçî, Şakir Fetah, Mehrem Heme Emin, Medî Hoş, Mihemed Mewlud Med û Meruf Berzencî....hwkd ). Dr. Meruf komêk helbestvan hilbijartîye, lê belê gelek bi

kurtî behsa wan dike. Hinek ji wan helbestvanan bi şêweye parçe çîrokekê behsa wan dike. Ew jî Qizilçîye, bi wîre jî bi kurtî behsa rojname, govar û çîrokan dike. Her wiha behsa destpêka serhildana pexşan, çîrok û pendên pêşîyan bi kurtî dike. Radibe navê hinek ji wan nivîskar, çîrok nivîs û roman nivîsên wekî ( Hisên Hoznî Mokiryani û Şakir Fetah )<sup>42</sup> dike.

Ewê ku ji nêzîk ve vî birêzî nas bike, hertim dostê mirov û dostê wêjeyê bûye. Di rastîyê de niştîman perwer û kurd perwer bûye. Ji ber wê rabîye hinek kes anîye di nava dîrokê de, ew qas ne pisporê wêjeyê bû. Berhemên wêjeyî gelek kêmbûn. Lê belê kesayetî û mirovên baş, rewşenbîr û dostên wêjeyê bûne. Wekî; Tûfîq Wehbî, Emîn Zekî Beg, ku hem dîrok nas û pexşan nas bûye. Li gel vê jî behsa berhemên hêza hizrî, berhemên wêjeyî û çîrokên Ewropa dike. Dr. Meruf bi vê re jî nasekine behsa peywendîya nivîsîna zimanevanî û dîrokê dike. Lê belê eger em bi hurî balê bidîn ser berhemên wî ji wêjeyê ne dure, Ji ber wê em dibêjin dîroka wêjeya kurdî çavkanîya cudakirina sinorê zimane. Hemû wan berhemên wêjeyî di nav xwe de digire bi dirêjî dîrok derketîye holê. Em dikarin bêjin; ev wêjeye wekî pîrpeyekî berhemên wêjeyî di nav de pêşdikeve. Ev berhema wêjeyî li cem me gelek girînge û pêwîstîya civakê pê heye. Ji ber wê jî babetekî civakî ya wî serdemî bûye. Berhemên mijarên wêjeyî di nav xwe de girtîye. Di heman demê de rolekî girîng hebû di pêşketin rewşenbîrên kurd de.

Dema ku nivîskarek yan jî lêkolînavanek li ser dîroka wêjeya kurdî di nivîse, ji bo armanca sinorê vê wêjeyê rastî pîrsgirêk û astengîyan tê. Hewil dide di destpêkê de destpê bike bizane situna wê ta kurderê ye. Sînroê dîroka wêjeya kurdî ji bilî ziman hemû şewazên zimanê kurdî û cihê coxrafi di nav xwe de digire. Lê belê tenê sinorê coxrafi nikare wêjeya kurdî pê bide naskirin. Dîyarkirina cihê ne raste, beşeke ji sinorê kurdistanê. Ji ber wêjî wêjeya gelek neteweyên din jî ji ziman cudatir hatîye nasîn nabe bikeve nav wêjeya kurdî. Ev jî di wî demî deye dema em zimanî kurdî bi nasîna wêjeya netewî danîn.

Ev jî ne rewşa û ne gonav be nakeve xaneyê wêjeya kurdî de. Armanca wan ne ewe nikare balê ne berhem wêjeyî û hunerî bide. Belku herî zêde here di nava wêjeyê de afirandina wêjeyê be. Kurd ji ber rewşa sîyasî û pîrsgirêka civakî, dagirkirina coxrafiya welat ji alîyê dagirkeran ve nebûne xwedîyê azadîye.....hwkd. Ev hemû bi

---

Eladîn Secadî,r,10-11<sup>42</sup>

ser wî de serwer bûye, ne karîye bi yek parçeya xwe li beramberî zilmdar û zordaran hinek faktorên neyaran bi kare xwe bi parêze. Ev jî bûye sedemê birîna dîroka wêjeya kurdî û birîna ramiyarî coxrafîya kurdistanê ji hevdû. Di heman demê de di alîyê ramiyarî û cihê fireh yê coxrafî hertim neyarên netewa kurd û kurdistanê di hewldana tekoşîn û pîlan danîna nexşeyên cîyawaz ji bo armanca dagirkirina kurdistanê û çespendina gelê kurd. Di rastîyê de ev faktorane bûne sedemê cudakirina wêjeya kurdî ji hevdû. Ev faktoranejî bûne sedemê bandorîyekê bi ser wêje, ferheng asta rewşenbîrîya civakî, çînî.

Lê belê rewşenbîr, nivîskar û dostan tenê ji bo demekê jî ne sekinîne, berdewam di xebat tekoşîn û hewildanê debûn ji bo bidestxistina mekanîzmayekî wêjeyî û dîroka wêjeyî tê de serketî. Gelê kurd di dirêjîya dîrokê dehertim jêr destê rejimên yek li pey yek de bûn û ne dixwastin gelê kurd azad bibin, ta roja me ya îrojî evberdewame. Ev jî bandor bi ser wêjeya kurdî kirîye. Da ku wekî pêwîst pêşve neçe. Di encama çend faktorekî de çêbûne, bi taybetî rêkftina dewletan ji bo dabeşkirina coxrafîya kurdistanê ku bikin çar parçe. Ev ê jî bandorekî gelek li ser wêjeya netewa kurd ziman, çand û xwendinê de hebû. Tenê hinek ji van parçan ziman, çand, xwendin û azadîya wan hatîbû qedexekirin. Ev hemû ji ber pîlanên sîyasî yêr desthilatan bû. Armanca wan têkbirina çand û nîjadê kurd bû. Da ku bikarin çanda netewa xwe.

Di cihê çanda kurdî de ya xwe bicih bikini hemû hewildanên wan ji bo navbirina dîroka wêjeya kurdî bû. Di gelek cihan de bi şeweyekê bi rêyekê çanda xwe bi ser wan de serwerkirin û hemû parçeyên din jî bêxin dibin bandora çanda xwe de. Ji dil ev hizre serket û di hinek cihan de çanda netewî ya kurd berbi nemanê ve diçe. Em dikarin bêje em kurd di jêr bandora çanda wan zordar û desthilat daran de mayîn. Di encamê de rastî birîna çandî hatîn. Di rastîyê de çanda her neteweyek kêr û zêdeyî di pêşketin û paşketina civakê de bandor li ser wêjeyê serwer bû. Wêjey peywendîyekî bi hêz bi çanda neteweyî re heye. Dema em kurd di zivirîn ji bo zanyarî û fêmkirina ji wêjeyê, em dibînin wêjeya me ji ber sedemê ramiyarî ,coxrafî rastî gelek pirsgirêkên lewaz hatîye. Di vir de temaşeyî wêjeya kurdî dikîn li gel wan hemû pirsgirêkên ramiyarî, coxrafî yêr hatîn pêş, nivîskar û rewşenbîrên me hertim di xizmet û berbi pêşbirina wê debû. Karwana wêjeyê gihandine vir û bi serkeftî mil bi milê wêjeya bîyanî re diçe.

Her wiha Prof. Dr Meruf Xeznedar, di vê derbarê de dibêje : (( Cudakirina xaka kurdan ji hevdû wisan kir bi keve dibin banodora xwendina wî beşê ku li gel wan dijîn. Wekî Erebi, Farsi û Tirkî....Ev jî bûye sedemê ku wêjeya kurdî di vê herêmê de xasyetên cuda re derbikeve. Wêjeyaher alîyekê şêwe û naveroka xwe hebe ji yên din cudatir be. Eger di bingehe de wekî dîyare her yek ji wan wêjeyê ))<sup>43</sup> . Eger em behsa yek parçeya wêjeyê, kurd û dîroka wêjeya kurdî bikîn, pêwîste em gelek bi hişyarî pêngavan bi avêjin .

Karkirenekî ji dil a wêjeyê pêwîste. Di heman demê de pêwîste li pey mekanîzm, alav û amrazên wêjeyê de bigerin. Baştirîn amraz ji bo yek xistina dîroka wêjeyê zimane, ziman yek parçeyekî girînge ji bo wêjeya kurdî. Amraza ziman rolekî girîng û yek alî ye heye di nasandin û dîyarkirina wêjeya kurdî de. Bi vê rejî nikare bi asanî sinor bikêşe û rêya dîrokî ji bo wê dîyar bike. Ji ber ku gelek sedemên girîng der dixê. Ziman û wêjeyê dikeve jêr bandora xwe de li piştî tiştekî wisan dike wêjeyê û ziman pênasê werbigire yan jî zêde nêzîkî hev bibin. Ev jî di encama bandora mercên ramiyê ,coxrafî raste ras di wêjeya kurdî heye. Di vir de neyarên kurdan li pey hewlekê de digerin. Ji bo ji navbirin û lewazkirina wêjeya kurdî. Ev jî bi eşkereyî dîyar dibe di dema dabeşkirina Kurdistanê bi ser çar dewletan de. Em hemû jî ji wan baş fêmdikin. Wêjeya, Erebi, Farsi, Tirkî û mesheba Şîî û Sinî bandor li ser wêjeya kurdî kirîne. Fikrê nivîskar û dostên wêjeya her çar parçan li ser heye. Wekî nivîskar û helbestvanê Rojhelatî dibêje: (( Ji wê roja ku Şîyatî bûye mesheb vebeşekî gelek xelkê îranê nêzîk bûne.

Ayîna Lorîyan jî ji farisan hestê Lorîtîyê kêr bûye, xwe bi kêrî kurd dizanin. Beşekî gelek ji wan jî wekî kurdan şer li gel wan hatîye kirin. ))<sup>44</sup> . Ev wê radîgehîne ku gelê kurd ji ber bandora ayînê û dilpakîya wan, hertim neyarên kurdan sud ji wê girtîne. Hestê netewayetî bi wan lewaz kirîne. Ji bo armanca sîyasî bû, ji bo birîna dîroka wêjeya kurdî û parçekirina coxrafîya kurdî bû. Li gelek cihan yan jî parçeyên din ê Kurdistanê zimanê kurdî ji bîra xelkê kurd diçû û di cihê wê de zimanê bîyanî werdigirtin. Di alîyekê de jî parçe parçekirina kurdan ji nav birina çand, ziman, ferhenga netewî bû. Di heman demê de hîleyên van rejîman ji bo

---

Meruf Xeznedar, r, 39-44<sup>43</sup>

<sup>44</sup> Meruf Xeznedar, Şîrî Kurdî Sîyaser- Komalayetî û Kurdayetî Le Nêwan Herdu Cengî Cihan, Roşenbîrî Kurdistan, Hewlêr 1999, r, 2



navbirina neteweya kurdî û lewazkirina zimanê dayî û parçekirina coxrafya kurd bû. Ji bo navbirina dîroka wêjeya kurdî hemû rêyek bi karanîn. Wekî nivîskar û helbestvanê Îranî Haşim Ehed Zade, dibêje : (( Ne bûna desthilatîya sîyasîya kurd yan jî nebûna dewleta kurd, heya demekê biryar dan di derbarê sinorê wêjeya kurdî de wekî wêjeyekî netewî nazik û xerîb kirin ))<sup>45</sup> . Ji bo piştrast kirina nivîskar Haşim Ehmed Zade, gotinên wî gelek raste.

Lê belê şert û mercên sîyasî, rewşa coxrafî parçeyên kurdistanê, di alîyê de jî nebûna yek gotara sîyasî a kurd, yek reng û nebûna hem ahengîya kurdan li gel hevdû. Hertim ev rêgir bûne ji bo rizgarîya kurdan. Ji bo pêşketina dîroka wêjeyî ev jî sedemek bû ji bo birîna vê dîrokê ji hevdû. Ev û komek faktorên din jî hene.

Ji hev cudakirin û parçekirina Kurdistanê ji bo çar parçan. Em hemû dizanin armanca dijminan çî bû. Bi vê rejî ji navbirina ziman, çand , folklor û dîroka wêjeya kurdî birîna sinorê wêjeya kurdî. Di vir de pêwîste nivîskar, rewşenbîr zêdetir hişyar bibin, bername û mekanîzmeyekî baş çêbikin. Hewla yek parçe û yekxistina dîroka wêjeya kurdî bidin. Ev jî tenê bi hestekî netewî nabe, çav li wan hemû hurî û cîyawazîyan bê girtin ku dikare di nava wêjeya parçeyên kurdistanê de hebe. Ji bo bi hêzkirina wêjeyê ku xwe di ziman ,form û naverokê de digire. Pêwîste dîrokekî bi hêz çêbike da ku bi kare dîrokekî wêjeyî çêbike û zarevayekî taybet bi wêjeyê hebe. Yan jî em hewil bidîn pêşketinekî dîrokî a wêjeya kurdî dîyar bikîn. Tenê zimanê hevbeş û fêmkirina ji berhemên wêjeyî ne bese.

Belkû ziman, faktorekî gelek girînge ji bo hemû wêjeya navçeyan ku diçe xaneya wêjeya netaweyetî. Di vir de nikare wan dîyalektîkên dîrokî derbixe ku dinava navçeyên cîyawaz de heye. Ji bo vê armancê eger em bi hurî temaşeyî wêjey û rêbazê bikîn ji me re baştir derdikeve. Ev rewte û rêbazên wêjeyî gelek bi eşkereyî di nava dîroka wêjeyî a kurdî de tê dîtin. Ev rêbaze jî di wêjeya her çar parçande derketîye. Gelek ji pispor, rexnegir û kesên dîyar destnîşan dikin hebûna dibistana taybet di ke dinava dibistana giştî de. Bi taybetî li cem (( Wan helbestvanên ku ser bi navçeya Mokiryanin di cihê din de tên dîtin. Bi taybetî ewên ku di dema helbestvanê mezin û wefadar hebûn wekî Herîq Mecdî, ev jî helbestvanên navçeya Mokiryan bû

---

<sup>45</sup> Şêx Ebdalmohîn Merdoxî, Keşkulî Şiirî Kurdî Goran, Saxkirdnewe Sereta Perawêz Nusînî Nunerî Sultanî, Silêmanî, 2010, r, 15

))<sup>46</sup> . Eger em bixwazin bandora vê çandê bizanîn, li ser vê wêjeyê di alîyê ferhengî û wêjeya cîranên kurd wekî Erebo, Fars û Tirk pêwîste temaşeyî ziman û naveroka remza wan wêjeyan bikîn. Di wî demî de gelek bandora çanda wan navçeyan ku bi ser wan de serwere hest pê tê kirin. Ji ber wêye (( Pexşan, huner, helbest hemû berhemên wêjeyîne.

Bi şewazê naverokê de dirêjin û dibistana wêjeyîne Xwedîyê corek taybetmendî û nîşanên taybet yên xwe ne. Ev jî di alîyê zimanevanî veye. Di alîyê wê bandorîya ku ketîye jêr bandora wêje ferheng û çanda farisî de. Berhemû sîbera wêjeya kilasîkî gelek bi eşkereyî dîyar dibe ))<sup>47</sup> .

Ev dibistane li cem hinek nivîskar û helbestvanan wisan dizanin helbest nivîsîne û dayîne dibistana Mokiryan. (( Sîma û xasyetên dîyar ê zanîstî ya ferhengîya wê navçeya Mokiryan ketîne jêr çand û ferhenga wêjeya îranî de ))<sup>48</sup> .

Eger em bixwazin bi xwînin û lipey zanyariyên li ser dîroka wêjeya kurdî bi gerîn, gelek nivîskar û helbestvanên her çar parçeyên Kurdistanê gelek tişt li ser nivîsîne û mînakên gelek jî hene. Her tim li jêr desthilata zordaran bûye. Ji ber wêjî sîyaseta her desthilatekî ya her parçeyekî cîyawaz bû, di alîyê hişkî çespendina neteweya kurd de. Her tim jî pîlana lewazîya wêjeya kurdî û birîna sinorê wêje û çanda kurdî danîne. Bi rexmê van hemû tiştan re jî wêjeya kurdî nûjenî bi xwe ve dîtîye. Ev jî di alîyê gelek helbestvanan de çêbûye. Wekî Şêx Nurfî Salih û Yasîn Emer...hwkd . Gelek helbestvanên din jî di nujenîya helbestên kurdî de rabûne. Bê goman ev nujenîye, rewşa navçeyê û alîyê sîyasî û coxrafîya van deveran bandorê li ser kirîye. Ji ber wê jî di serhildan û nujenîya helbestên kurdî de berevajî parçeyên din, wekî pêwîst nujenî dihelbestên beşê Bakur, Rojehalt û Rojava de nayê dîtin. (( Nujenîya di helbestan de bêyî nujenîya di hizir de nabe çî di helbestên erebî û kurdî da be yan jî her zimaneke din de. Zimane gotinê nikare helbestekê çêbike. Wekî şewe zarê kurmancîya jorîn ( Bakurê Kurdistanê ) di encama nebûna azadîya wêje, ferheng û zimane kurdî. Qet bizotneweyek nu di helbestan de serî hilnedaye. Berevajî wê em di kurdîstana başur de dibînin. Ji ber vê azadîyê dîrokekî cîyawaz hebû ))<sup>49</sup> .

---

<sup>46</sup> Haşim Ehmed Zade, Azarman Ta Milet, r, 188

<sup>47</sup> Osman Deştî, Derbarey Nawerokî Sîyasî û Komalayetî Şiirekanî , Bedirxan, Silêmanî, 2003, r, 9-10

<sup>48</sup> Heman çavkanîya Pêşî, r, 11

<sup>49</sup> Osman Hem Xidir ( Deştî ), Şiirî Nawçey Mokiryan, Nîwey Yekemî Sedey Bîstem, Namey Dokuratî Zankoy Selahedîn, 2007, r, 17

### 2.3 Dariştina Dîroka Wêjeya Kurdî û Dema Nasandina Wêjeya Kurdî

Dîroka wêjeya kurdî hewil daye ji aliyê gelek pisporên dîrokî bişeweyekê bi zivirînê ser dariştinê û nivîsîna vê dîrokê. Da ku bi karin ev wêjeye û dîroke ji têkçûnê bi parêze. Di heman demê de li gel wêjeya neteweyên din yek astê de be. Ji bo armanca dariştina dîroka wêjeya kurdî gelek nivîskaran gelek xemxwarin, wijdanî, bêxwî û westandin kêşaye ji bo nivîsandina dariştina vê wêjeyê.

Di vir de Dr. Ezedîn û Meruf Xeznedar, Emîn Feyzî û Eladîn Secadî....hwkd, gelek bi hurî ev dîroke nivîsîne. Bêgoman nivîsîna û dariştin nivîsîna. Ne tiştêkî wisan asan û sadeye. Belkû pêwîstî bi kesên jîr heye. Nivîskarên kurd herim mil bi milê nivîskarên neteweyên din hêza xwe bi karanîye, ji bo xizmetkirina vê wêjeya zindî. Hemû neteweyek xwedîyê dîrokek taybet ya xwene. Di aliyê çandî û folklorî de gelek taybetmendiyên cîyawaz hene. Ligel neteweyên din jî bi hêsanî hest pê tê kirin. Eladîn Secadî çend caran destkirîye bi nivîsandina dîroka wêjeya kurdî, gelek bi xemxwarî û dilsozî buye kurd û nasandina vê wêjeyê bi neteweyên xeyrî kurdî . Disala 1952 an de yekem pirtûka binavê " Dîroka wêjeya kurdî " çapkir. Wekî Bi xwe dibêje : (( Min ev pirtûka dîroka wêjeya kurdî gehand çapxaneyê û min karî çap bikim. Pêşkêşî alimê kurdî û ne kurd ))<sup>50</sup> .

Di heman demê de dîroka wêjeya kurdî di sala 1971 an de çap kir. Ev pirtûkên Secadî rolekî girîng hebû di dîroka gelkê kurd û fêmkirina wan bi neteweyên din. Wekî peyamekê jêre bêje kurd heye, xwedîyê dîrokekî kevin û mil bi milê hemû wan neteweyên xeyrî kurdan. Xebatekî dur û dirêj heye di meydana wêjeyê, çand, ferheng û neteweyî de. Her wiha ( Prf. Dr. Meruf Xeznedar ) li ser dîroka wêjeya kurdî gelek babet nivîsandîye, bi taybetî jî di rojname û govar û pirtûkekî ya dîroka wêjeya kurdî de nivîsandîye .Gelek bi hurî behsa vê dîrokê dike. Gelek zanyarî li ser dinivîse . Prf. Dr. Xeznedar ez wî ji nêzîk ve wî nas dikim. Mamoste û Doktorê min bû li zanîngeha Sellahedîn. Ji ber wêjî cihê mora wêkî rojê ronî dîyare. Ji destdayîna van kesianre valetîyekî mezin di nava kurd û Kurdistanê de çêdike. Ji ber ku van hertim ji bo neteweya xwe xizmet kirîye dîyarîya dîrok û wêjeyê bû. Dr Meruf Xeznedar, pirtûkek bi navê ( Le Babete Mêjoy Edebî Kurdîyewe ) çêkir û di vê pirtûkê de dibêje : ( Ev çar lêkolîne yan teze pêktê ji çarde

---

Eladîn Secadî, Mejoy Edebî Kurdî, Çapxaney Maruf, Bexda,1971,r,3<sup>50</sup>

pirtûk yan jî name, bikomî di vê pirtûkê de min komkirîye û tomar kirîye. Beşekî berhema zanîsta me ji sala 1972 an heya niha )<sup>51</sup> .

Dr. Meruf Xeznedar di vê nivîsîna bişeweyê çarde name di vê pirtûkê de kom kirîye. Behsa dîroka wêjeya kurdî û gelek helbestvanan dike Wekî; Hesên, Emîne, Feteh, Mayl Hemdun, Mexlîs, Nacî, Xerqî, Elî Begê Salar, Fanî û Fayîz....hwkd . Armanca me di vir de ewe em bêjin.Xeznedar her di destpêka jîyana xwe de dest binivîsîna şeydaya wêjeyê û dîrokê kirîye. Di vê tekstê de behsa helbestvanên kilasîkî û helbestên wan kirîye, helbestên wan jî şîrove kirîyê hizir ûfîkrê xwe jî xistîye ser. Di heman demê de rêxistina wêje û helbestên van helbestvanên kilasîk şîrovekirina tîpan ji bo wan hemû peyvênmedîyar ûne eşkere ji bo xwendevanan dîyar kirîye û em dikarin bêjin tam û lezetekê bi peyvên tekst û helbestvanan bexşîye. Eger em xwendevan hinek bihurî balê bidin ser hizir ûfîkrên Xeznedar, emê hest bi hizrekê bikî ka çawe û bi çi hestekê çûye dinava wêjeyê û kîjan mirovê wêjeyî dostê wî bûye. Aşiq û evîndarê wêje û dîroka neteweya xwe ye. Yê ku ji nêzik ve ev birêze naskirî be, mêhrîban gotinên xweş û wêjeyê dost ji bo wî derdikeve .

Xerîkî nivîsîn û dariştina wêjeyê bû. Nivîskarên kurd ji ber hambûna komek pirsgirêkên ramyarî û nebûna piştgirîya dewlet, ji ber rewşa coxrafî û cîyawazîya neteweyî, çêkirina astengî nebûna darayî û çavdêrîya wan ji aliyê sîxoran ve û nebûna azadîya bi temamî. Lê belê ewan herim hewild didan di meydana pêşketina zanîst, wêje û xemxwarina ji bo dîroka wêjeya kurdî bi vî awayî berdewam bûn. Her wiha Xeznedar rabû ( Bi zindîkirina tekst û destnivîsa çapkirî yên piştî Nalî ) . Her wiha gelek bi cidî kar kir li ser zindîkirina destnivîsînên çapkirî yên piştî Nalî. Xeznedar kar li ser hemû wan destnivîsan ku bi temamî zanyarîyên wan nivîskaran ji derveyî Kurdistanê tişt komkirîne û zanyarîyên bi temamî li ser Nalî hebû. Dinava vê teksta komkirî de zanyarî û fikrên xwe jî xist di nav de. Prf. Dr. Meruf Xeznedar, dibêje: (( Helbestên Nalî û helbestvanên kilasîkî, destnivîsên kevin , sernivîs parastîbûn. Di hemû navçeyên Kurdistana jêrîn de belav bûn. Ev destnivîse di hîcre, medrese, malê xwendevanan û dewlemendên kurd bi dest diketin. Helbestvan Nalî li ser zarê mela û feqeyan bû ))).<sup>52</sup>

<sup>51</sup> Meruf Xeznedar, Le BabeteMêjoy Edebî Kurdî we, Bexda,r,5

<sup>52</sup> Meruf Xeznedar,Dîwanî Nalî Saxkirdnewe Leser Têkstî Destniwis û Çapkirwî Dîwanî Şaîr, Çapxaney Hacî Casim, Hewlêr,2008,r, 20

Wêje wate hizrê neteweyî armanc ewe ku hertim beşek ji ruh û laşê neteweyan, ev neteweye heya demekê çav birîye cihanê. Ji bo bihêzkirin û sudwergirtina ji ezmuna temenê neteweya xwe. Hêvîya wan di alîyê pirakîkî û ramiyariya asta neteweyî. Lêkolîna dîroka wan vê dide dîyarkirin kurd û wêjeya kurdî biqonaxên cîyawaz re derbaz bûye û wêje bi wêjeyê daye nasandin. Ev jî tiştêkî guncawe gelek ji nivîskarênkurd û nivîskarên cîhanê behsa lihemû wêjeya kurdî dikinû gelek babet û nivîsîn û lêkolînli ser kirîye. Bi vê re nivîskarên navdarênkurd qet terxan ne kirîne, berdewam xerîkê nivîsînû dariştina dîroka wêjeya kurdî bûne. Her yek bi şeweyekî cîyawaz behsa vê dîrokê dike. Em dikarin bêjin di sedsalên berê de neteweyên din wêjeya xwe di encama çend sedeman de bi hêz kirîne. Ev jî komek faktor û bandorên navxwekî kar li ser wêje û dîroka wan de hebû. Bi xwe jî dîtîne, ev jî bêgoman gelek sedemû faktorên cîywaz heye li ber nivîskar û rewşenbîrên kurd. Di karin bi azadî dîroka wêjeya xwe bi nivîsîn û da birêjin. Di vir de dibêjin kurd wêje û dîrokekî yek girtî nîne. Tenê rênivîsa wan jî ne yekgirtîye.

Di encama dabeşkirina xaka Kurdistanê de parçekirina bi ser çend welatên cîran de. Ne bûna yek dengî, nebûna desthilata wekî dewlet bûnê, ev hemû sedemên li ber nivîskaran. Wekî di vir de çend pirsyarek çêdibe. Gelo wêjeya kurdî çi bingehek heyen ? Gelo rêzîknameye hatinê girtîye ? Ji bo bersiv dayîna van pirsan dibêjin. Dr. Meruf Xeznedar di tekstek ya xwe a binavê dîroka wêjeya kurdî de dibêje : (( Di sedsala pêşî de sîxorên îranîyan hatîne Kurdistanê û gelek destnivîsên kurdan birîne.

Îran, wekî berhemên xwe dizanin û li navbirin. Bi taybetî jî dezgeha Sîxorîya ( Savak ) )<sup>53</sup>. Dibêjin wêjeya kurdî hebû, lê belê ji ber karê sîyasî, aborî, dagirkirinû dabeşkirina xaka netewa kurd ji alîyê dagirkeran ve. Gelek behemên kurdî rastî linav çûnê bû. Bê goman helbestvanên kurd gelek bi wate û dîyar berhemên xwe nivîsîne. Niha jî dîyarin, lê belê ji ber wê şert û mercên ku kurd tê de derbaz bûn, rastî jinav çûna berhemên helbestvanan û wêjevanan hatîye. Li gel wê jî dinava wêjya kurdî de şîrovekirin her maye. Ji ber ku bi şeweyekî ser zarî tê parastin. Êdî wêjeya netewî bi wê rêyê tê naskirin. Wêjeya kurdî bi vî awayî di nava wêjeya cîhanê û neteweyên cîran hatîye naskirin. Yek ji bingeha netewê hebûna wêjeya serbixweyî ye. Ji ber ku

<sup>53</sup> Meruf Xeznedar, Mêjoy Edebî Kurdî we, Bexda, r, 71

di neteweyên cîran de gelek berhemên kurdî hene. Lê belê di rastîyê de ev berhemên helbestvanên kurdin. Ew ni karin bêjin ne berhemên kurdîne. Qet belgeyek û destnivîsek li ber destê wan de nîne xwe bikin xwedîyê wê. Belkû bi şêweyekî sîxorî jinava netewa kurd babet û mijar dizîne. Netewa kurd xwedîyê wêjeyekî bihêze. Wêjeya kurdî bi şêweyekî parçe parçe ji alîyê nivîskaran ve hatîye komkirin û bêxin tekstekî wêjeyî. Hewla parastina wêjeya xwe dayîn ji nebûnê parastine. Di heman demê de nasandina helbestvanên kilasîk bi wêjeya neteweyên din û cîhanê. Ev faktorane wêjeya kurdî bê hêz kirîne. Sedemên sîyasî bandorekî serekî li wêjeya kurdî kirîye .

Ji ber dagirkirina rejîmê kurd ji wê berhemên wêjeyî bê beş bûne. Em di karîn vê misoger bikîn, Hemû neteweyên xeyrî kurd, em xwe girtin û bihêzin di hemû astên jîyanê de. Bi taybetî jî di alîyê wêjeyê de. Ew jî dîyare xwedîyê wêjeyekî dîyar berhemên zêde yên helbestvanên kilasîkî û serdemê. Ev wêjeye me jî hinek taybetmendîyê xwe heye ku di wêjeya çî neteweyekê de nîne. Ev jî wekî Destana Memê Alan, Xec û Sîyabend û Ferhad û Şîrîn...hwkd. Di vê berhema folklorî de hertim wêjeya kurdî gelek dewlemend bûye, biberhemên helbestvan û nivîskaran jî dewlemend bûye. Neteweyên kurd şanazî pê dikin. Ger çî hinek netew wekî malê xwe dizanin lê belê qet belgeyekî wêjeyî ya wan nîne. Belkû wêjeya kurdî dizîne. Helbestvanên kurd şanazî bi berhemên xwe yên wêjeyî dikin. Wekî ; Helbestvan Nalî dibêje : ( Kes ji elfaza min re ne bêje kurdîye xu kurdîye, her kes nezan dibe xwe talibê wateyekê dikin ). Wêjeya kurdî belgeyên hatî nasîn heye. Li pêşîya helbestvan û wêjeyên mezin bi şêweyekî dîyar berdestin ne ne dîyarin. Di heman demê de gelek helbestvanên wê serdemê berhemên baş heye.

Eger nivîskar û lêkolînanên wêjeyî kar li ser bikin. Wekî Helbestvanên serdemê ( Bextîyar Elî, Dr. Ferhad Pîrbal, Ferîdun Ebdula Berzencî...hwkd ). Berhemên wan di karin di rêya werger û lêkolînan de sudê bi wêjeya kurdî bi gehînin. Bê goman berhemên van helbestvanan bandorekî zêde bi ser dîroka wêjeyê de hebû di alîyê nasandina vê wêjeyê de. Wisan hîs dikim dariştina dîroka wêjeya kurdî ji alîyê nivîskar û rewşenbîran ve wekî pêwîst nebû di nava wêjeya kurdî de. Ev jî bi misogerî ji ber wan şert û mercane ku nivîskar û wêjeyavanên kurd tê de derbaz bûne. Di alîyê sîyasî û aborî de hebûna pirsgirêkên navxweyî di heman demê de nebûna azadî tamam ji bo nivîskarên kurd. Nebûna azadîyê ya hibek parçeyên

Kurdistanê bûne pirsgirêk ne karîne wekî pêwîst girîngîyê bi berhemên xwe bidin. Yan jî ji bo danîna wêjeyekî bi hê û yekgirtî di aliyê dariştin û nivîsînê de. Kurd hertim jêr dest û çespaw bûne, ev jî sedemekî serekîyê ji bo pêngava pêşketina wêjeya kurdî. Ji ber wê girîngtirîn rewş û şeqamgirî guncaw bandora rewşa ramyarî û aborî heye ji bo serhildana wêje û wêjeya dariştinê di wêjeyê de.

Nebûna desthilata kurdan û nebûna dewletê, bandora dewletên cîran di nava wêjeya kurdî de hebû. Ev jî faktorên girîngîn li ber pêşneketina wêje û dîroka wêjeyê . Lê belê li gel van jî ew hemû pirsgirêkên ku hatîne ber devê nivîskarên. Ew qet ne sekîne berdewam di xizmeta wêjeya kurdî de bû. Mil bi milê wêjeya cîranan û bîyanîyan sekinîne. Di encama bi bandor ya helbestvanên kurd wekî ( Nalî, Salim, Mehwî û Hecî Qadirê Kuyî....hwkd ).Mînak : Emîn Zekî Beg, Bi tevîbûna tirk û ereban re bandora wêjeya wan li ser kirîye. Ji ber wê dest bi nivîsîna wêjeya kurdî kirîne. Ji bilî vê jî gelek nivîskarên din jî dîroka wêjeya kurdî nivîsîne. Di heman demê de peyamekî wêjeya dîrokî û hetsên netew tê de derdikeve. Nivîskarên kurd li her çar parçeyên Kurdistanê de bi zareve sinorekî di meydana xebata wêjeya kurdî xizmeta helbest, huner û dîroka wêjeya kurdî dike. Neteweya kurd jî wekî hemû neteweyên din xwedîyê zareveyên zêde ê taybetê xwe ne . Wekî ; Dr. Azad Abdulwahid Kerîm dibêje: (( Peywendîyekî zarevayî misogerîyê li ser wê dike berhemên wêjeyî tenê bandora wê rastîyê ye ))<sup>54</sup>. Em dikarin bêjin wêje neynîka jîyana civakê ye bandorê li ser wêje û şaristanîya civak û netewê dike. Ji ber wê helbestvan peywendîyek bi hê bi civak û neteweyê ve heye. Nivîskar pêwîste gelek baldarê dîroka wêjeya xwe bin, berhemên xwe ji neyarê kurdan ji windabûnê û nebûnê biparêze.

Wêjeya kurdî qet ji wêjeta welatên cîranê xwe ne kêmtire. Wekî Dr. Şukrîye Resul dibêje : (( Em dikarin bêjin, pileya wêjeya kurdî di çavên milletên rojhelat de qet kêmtir û ne cîyawaze. Jiber ku ber bi pêşve diçû. Çawe dîroka wêjeya kurdî bi dîroka gelê me û gelê cîran ve girê dayîye heman şêwe gelên Ewropa jî di heman qonaxê re derbaz bûne. Eger em temaşeyî qonaxa milletên derdor bikîn emê bibînin bi heman awayî ji qonaxa kilasîk û qonaxa Romantîkî, helbestên nû û Hevçerx bandor girtîne. Lê belê dewletên li derdor û pişt me piştgirîyekî bi temamî dayîne nivîskar,wêjeyan û Akademsîyenên me ji bo berhemên xwe çap bikin. Ji ber ku ew

---

<sup>54</sup> Azad Abdulwahid Kerîm, Sosyolojî Edeb, Lêkolînewey rexneyî, 2011

Dewletin lê belê em hîna ne bûne dewlet, em ne çûne wê qonaxê. Lê belê eger em dewletbîn wê ji alîyên dewletên cîran û Ewropîyan ve wê wekî dewletan temaşeyî me bikin. Tenê piştî salên 2000 an em çûyîne ji derve û rê ji bo me hatîye vekirin. Lê belê ji bo pêngava pêşketinê em di wê qonaxê de diçin.

Gelek ji nivîskarên Hevçerx kar li ser dîroka wêjaya kurdî kirîne wekî Emîn Feyzî Beg, ŞêxNurî Şêx Salih, Ebdula Cewdet, Mistefa Paşa, Dr. Îhsan Fuad, Helbestvan Pîremêrd, Goran, Kake Felah, her wiha helbestvanên hevçerx yên wekî ; Dr. Ezaledîn nameya Dokuratî li ser Rîyalîzmê nivîsandîye, Dr. Meruf Xeznedar bi hurî Dîroka Wêjeya Kurdî nivîsandîye ))<sup>55</sup> . Evan nivîskaran hemûyan jî karên xweşik û baş li ser dîroka wêjeya kurdî kirîne. Hewildayîne dîroka wêjay kurdî bi gehînin asta hev milê wêjeya neteweyên cîranan bin. Dr. Ezaldîn Mistefa Dokuratî li ser Rîyalîzim nivîsîye. Di demê paşî de jî pirtûkek li ser Dîroka Wêjeya Kurdî ji du bergan nivîsî. Dr. Meruf Xeznedar jî gelek bandor hebû li ser nivîsîna dîroka wêjeya kurdî. Baştirîn belgeyê ew pirtûkeye ku ji heft bergan pêkhatîye. Dibêjin, Xeznedar rolekî girîng û gelek hebû di nasandina wêjeya kurdî de. Ev jî di xebata vî zilamê mezin de dîyare, çend welatan geraye û çend ziman jî zanîye. Her wiha Dr. Azad Ebdulwahid behsa rolê Dr. Meruf Xeznedar dike û dibêje : (( Dr.Meruf Xeznedar gelek bi zanebûne, halê kesan, gelek bi sade gotîye, çî li nêzîkê heval û kesên xwe çî jî nêzîkî xwendevanên xwe. Her wiha derîyê mala wî û Pirtûkxaneya wî ji bo hemûyan vekirî bû da ku sudê jê werbigirin ))<sup>56</sup> . Cihê wêjeya kurdî di nava wêjeya navxweyî û yabîyanîyan de cihekî taybet ya xwe heye. Ev pêngava wêjeya kurdî jî ne kême ji ya neteweyên Rojhelat. Wêjeya kurdî jî di heman rêzîkê û qonaxê re derbaz bûye. Nivîskar, Rewşenbîr û Wêjewanên kurd rolekî mezin di pêşketina dariştin û nivîsîna wêjeyê de kirîye. Gelek nivîskar û rewşenbîrên Ewropî jî nivîs li ser dîroka wêjeya kurdî nivîsandîne.

Her wiha nivîskarê Sovyetê ( Madrîd Rodînkô ) ew jî Tekstekî, li ser dîroka wêjeya kurdî çap kirîye û li ser helbestvanên wekî ; Melayê Cizîrî, Ehmedê Xanê, Feqîyê Teyran û Harsî Bidlîsî...hwkd nivîsandîye. Di vir de ev vê ji me re dide dîyarkirin cihê wêjeya kurdî cihekî dîyar û firehe di nava wêjeya Rojhelat û Ewropîyan de. Li ser cihê wêjeya kurdî di nava wêjeya neteweyên Rojehel de, Dr.

<sup>55</sup> Çawketin, Dr. Şukrîye Resul, Şiwên Zankoy Selahedîn, Kolêjî Adab, 20/2/2017

<sup>56</sup> Meruf Xeznedar, Ezmunekî Le Rojgarêkî Nusînda, Dr. Azad Ebdulkerîm, Hewlêr, 2011, r, 26



Kemal Mezher dibêje : (( Rojhelat nasên Sovyetê bi ( Şerfname ) yê di dawîya salên 50 an de gehiştin pileyek bilind. Di wî demî de Rojhelat nasan û zanyarên Sovyetê ( Şerefname ) ji Farisî zivirandin ser zimanê Rusî. Sparde Êvgîna Vasîlîva, ji bo cihkirina vî karî wekî erkekî pêwîst dizanî. Di sala 1967 an de berga yekem ( Şerefname ) jinava çapxaneyê derket ))<sup>57</sup>

. Dr. Meruf Xeznedar di Teksta Dîcle Hizrim de behsa Salih Eledîn Serkewt dike û dibêje : (( Ez dixwazim bi gotinên xweşik vê berhemê, yan jî bi helbestên rengîn û bilind yê Meîn Besîso destpê bikim ku dibêje : ( Salih Eledîn Serkewt jê re digitin Femandarekî Erebb, eger jê biketan jêre di gotin casusekî kurd bû.... ))<sup>58</sup>. Armanca Xeznedar ew bû ku kurd şanazîyê bi dîrok û xebata Selahedîn dike di alîyê dîroka kurdî de.

Hertim hewla afirandina goherîna baş û xweşik de bû, ji bo bi destxistina babetên baş û wan babetan derxîne holê. Dinava wêjeya kurdî de cihek taybet yê xwe û hêzekî tayber yê wêjeyî hebû. Lê belê rewşa ramyarî û pirsgerêka coxrafi niştîmanî ev hemû rêgir bûn li ber pêşdeçûna vê wêjeya nemir . Gelek faktorên din yê cîyawaz hemû li beramberî dîroka wêjeya kurdî. Cîyawazîyekî wêjeya neteweyên din azadbîn û xwedîyê wan jî serbixwe bûn. Li gel van hemû şert û mercan hertim rewşenbîr û nivîsakarên kurd berdewam bûn di tekoşîn û hewildana ji bo nivîsandina dîroka wêjeya kurdî û rizgarkirina wê ji navçûn û nebûnê. Ev jî bû sedemê ku cihê dîrokê dîyar û di cihde bimîne. Di alîyê xwe girtinê de jî bandorekî bi hêz li ser vê wêjeyê hebû. Di vir de nivîsakarên dîroka wêjeya kurd hertim hewla wê dayîne cihê wêjeya xwe serbixin û bi gehînin milê wêjeyên din. Em dikarin bêjin wêjeya me tevî wêjeyên din yê bîyanî bûn.

Em dikarin bêjin peywendîyek bi hêz heye li gel wêjeyên din. Di vir armanca me ewe em bêjin wêjeya me wêjeyekî nûjene û taybet ya meye. Çipeywendîya wê bi wêjeya cîran û bîyanîyan re nîne. Dikarin bêjin berhemên hizir û fikrên meyên resen û bes. Ne armanca me ne ewe, belku armanca me ewe em bêjin wêjeya me ji bilî wê peywendîya wê bi wêjeya din re jî heye. Ji bilî hemûna hêza wergirtinê wê bandorîya pîlana dîroka wêjeyê bi şeweyekî giştîye. Li gel vê jî xwedîyê hêzekî û pîlanekî

---

Kemal Mezher, Çend Lapereyek Mêjoy Gelfî kurd, Bexda, 1985<sup>57</sup>

<sup>58</sup> Meruf Xeznedar, Dîcle Hizrim, Hewlêr, 2009, r, 202

dîrokî taybet û berjengekî taybet a xweye. Pêwîste em temaşeyî wêjeya xwe rêya pêşketin û goherîna wê bikin.

xanîyê xwe pirtûkxane tê de danî bû. Em amadene bikin pirtûkaneyekî dîrokî. Ji ber wê em daxwazê ji Wezaretê Rewşenbîrî ya Hukmetê dikîn çî pêwîstî ya vê pirtûkxaneyê hebe jêre bikin ))<sup>59</sup> . Hemîd Ebubekir Bedirxan dibêje : (( Razê Xeznedar şikir ocaxa te ne kore, zarokên te ( Binyad, Zagorus û Medya ) , mala te pirtûkxaneya te wekî xwe wê bê parastin. Razê sed sal dî razê, piştê tu wê bizivirî nav me. Çawe 100 salan te karê nivîsînê kir. Pêwîste 100 sala tu razê. Piştê rihê meta te wê li Şanedêr zindî bibe ))



---

<sup>59</sup> Hevpeyvîn li gel , Binyad Meruf Xeznedar, 25,6,1017

### 3.Kurtîyek Di Derbarê Jîyan Nameya Prf. Dr. Meruf Xeznedar De: 1930-2010

Meruf kurê Ebdulqadir Merufe, kurê Ezîz Axayê Xeznedare, di sala 1/11/1930 li bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye. Xwendina Seretayî û Navîn li Hewlêrê temam kirîye. Sala 1952 an bûye Mamostayê Seretayî. Di navbera salên 1952 heya 1957 an de li bajarê Hewlêr, Kut û Bexdatê wekî Wekî Fermanberekî di perwerdeya ( Mearf ) bi cihbû. Di sala 1957 heya 1959 an de jî di be mamosteyê zimanê Erebî li navendîya Şerqî û amadeyîya Kerkuk ya êvaran. Di sala 1968-1981 an de bûye mamostayê beşê kurdî li Kolêja Adab ya Zanîngeha Bexdayê bû. Disala 1973-1981 an de bûye serokê heman beşî. Di sala 1988-2006 Profesorê wêjeya kurdî bû di kolêja Adab Zanîngeha Sellahedîn bû. Sala 1957 bawernameya Bakolorsî di ziman û wêjeya Erebî de li Zanîngeha Bexdayê wergirt. Di sala 1960 an de li ser amojgarîya rojhelat nasan û akademîya zanîstî a Sovyetê li bajarê Lîngrda xwendîye. Di sala 1963 an de Bawernameya Doktoratî ( Ph, Dr ) bi navnîşana Dîroka Wêjeya Kurdî wergirt. Di sala 1967 an de jî li akademîya Mosko bi zimanê Rusî jî çapkir. Ev jî yekem Nameya bi wêjeya kurdî bû bi zimanê Ewropî hat çapkirin. Di sala 1968 an de pileya Mamostaya ( Medrs ) wergirt. Disala 1973 an de pileya pirofesor wergirt. Disala 1979 an de pileya profesortî wergirt. Her wiha zimanê Kurdî, Erebî, Rusî, Turkî, Farisî bi başî zanîye û zimanê Îngilîzî û Firansî jî karîye bi xwîne. Xeznedar xwedîyê zêdetirî 40 pirtûkên çapkirî û hejmarekî zêde Name, ji bilî Rojname û Govar rêveberîya 14 nameyên Master û 10 Nameyên Doktoratî kirîye. Lê belê hezar mixabin di heyva Hezîrana 2010 an de di temenê xwe yê 80 salî de dilê wî yê pîroz ji lêdanê dikeve û diçe ber dilovanîya Yezdan. Her wiha Cemal Giredesor ê rojnamevan dibêje : (( Dr Meruf mirovekî êmin û li ser xwe bû, rêzdar û gohdarvanê mêvan û dostên xwe bû. Derîyê wî ji bo mêvanan vekirî bû. Dibêje çi deman xwe mezin ne dikir û qet behsa hevalên xwe ne dikir. Xeznedar rojekê ji min re got : ( Were wesyetek ya min heye ezê ji tere bêjim ) Di jîyanê de ez ji sê tiştan peşîmanim.

- 1- Ez wextê xwe çûm kurê zanyarî kurd gelek peşîmanim, ji ber ku min ne dikarî heya dawî ez li wie bim.
- 2- Demê xwede gelek rêz didan min gelek ji vê rêzdayînê peşîmanim, ji berku min dizanî ev rêzdayîna min babetekî berjewendî bû.

3- Di got xwezî min pirtûka xwe ya bi navê Dîroka Wêjeya Kurdî li çapxaneyê Aras çapnekira, min li ser hesabê xwe bi kira gelek baştir bû ))<sup>60</sup>. Her wiha ( Binyad Meruf Xeznedar ) dibêje : (( Bavê min hertim heval, mamoste, û dibistana me bû. Hertim mala dibistan û pirtûkxaneyekî bi sud bû ji xwendevan û nivîsakarên dîroka wêjeyakurdî û zanîstî. Gelek xemxwarê komkirina dîroka wêjeya kurdî bû. Tenê li çend welatan geraye, serdana gelek kesên pisporê vê dîrokêkirîye. Daku bikare mejîyê xwe ji dîrokê teji bike. Birêz Binyad dibêje ; Piştî bavê min

### **3.1 Dîroka Wêjeya Kurdî Meruf Xeznedar Rol û Taybetmendîyên Lêkolîna Şîroveya Rexneyî**

Meruf Xeznedar ( 1930- 25 cotmeha 2010 ), mamosteyê zanîngehê û nivîskarekî bi nav û deng yê kurd bû. Di sala 1930 an de li bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye, ji binemala Xeznedaran bû. Qonaxên xwendina seretayî, navîn û amadeyî li Hewlêrê temam kirîye. Li zanîngeha Bexdayê beşê zimanê Erebî xwendîye. Di sala 1969 an de çûye Yekêtîya Sovyetê, li wir Dîplomaya Doktoratîyê bi dest xistîye. Piştî zivirîye bûye mamosteyê beşê kurdî li zanîngeha wêjeyî a Bexdayê .Her wiha bûye mamosteyê beşê wêjeya zanîngeha Sellahedî a li Hewlêrê jî. Xeznedar endamê Kurî Zanyarîya kurdî bû. Rêveberê gelek nameyên zanîngehê, Macester û Doktoratî kirîye. Dr Meruf Xeznedar yek ji damezirênerê yeketîya nivîskarên kurd bû heya demekê jî edîtorê govara wan jî bû. Her wiha çend govar û defterên kurdewarî derxistîye, di Govara Roja Kurdistanê- Şemis Kurdistan destê nivîskaran, di govara Karwanî Rawêjkarî Edebî û Rewşenbîrî bû. Xeznedar cara destpêkê di sala 1968 an de roja yekem car belavbûna jimareya Rojnameya Kurdistan yanî roja 22 Nîsana 1998 an wekî roja roja rojnamegerîya kurdî dîyar kir.

Mamosta Meruf mala xwe kirîbû cihê rewşenbîrîye, ji bo parastina Tekst û destnivîsên arşîva wêjeya kurdî. Hertim derîyê mala wî ji bo xwendevanan vekirî bû, gelek xwendevanan sud ji pirtûkxaneyê wî a mezin wergirtî bû.

Dr. Meruf Xeznedar di temenê 80 salî de di sala 25 10 2010 an de li nexweşxaneyê Şîfa li bajarê Hewlêrê koça dawî kir. Prf. Dr. Meruf Xeznedar, keçekî ( Pizîşk Medya ) û du kurê ( Zagros binyad ) hebû.

---

60. Hevpeyvîn li gel , Binyad Meruf Xeznedar, 25,6,1017

### 3.2 Berhemên wî

Dr. Meruf Xeznedar di salên 50 an de dest bi nivîsînê kirîye û gotar belav kirîye. Jîyanama xwe ji sala 1930 heya 1991 di du pirtûkên 7 berg de nivîsîye ku bi navê Dîcle Hizirê Min bû. Dawîya berhema wî jî Pirtûka Dîroka Wêjeya Kurdî bû ki ew jî di 7 bergan de çap kir. Dr. Meruf Xeznedar xwedîyê 30 pirtûkên çapkirî bû ji wan.

A. Berhemên Wî Yên Bi Zimanê Kurdî :

Kêş û qafye le şîirî kurdî da, Bexda, 1962

Kurd, têbînî û têrwanîn Vîladmîr Mînorskî, wergêran, pêşkêşkirin û lêkolînewe, Bexda 1967

Buke şuşe, çîrokî kurdî, Bexda , 1969

Elman û çend çîrokekîtirî kurdî, Bexda, 1969

Ebdula begî Mîsbahuldîwan, Bexda, 1970

Ziman û edebî kurdî, Bexda, 1971

Dîwanî Nalî û Ferhengî Nalî, Bexda, 1977

Nalî le defterî nemirîda, Bexda, 1981

Le babet Mêjoyî Edebî Kurdîwe, Bexda, 1984

Kurdyade le Lenden, 1985

Geştek bu Erzirom, werger le Rusîwe, Siwêd, 1995

Edebî kurdî û kêşey pastrnak, Hewlêr, 1995

Turk û Turkmanîstan, Hewlêr, 1995

B. Berhemên Wî Yên Erebî:

Aledl Alactmaeî, Bexda 1945

Hfanî Kurdistan, Bexda 1956

Alakrad nusînî : Minorskî, wergêran le Rusîwe bu Erebî, Bexda 1968

Mixgogar Frîde wmgboeat nadre, Bexda, 1978

Tarix alstşraq, Bexda, 1980

C. Berhemên Wî Yên Rusî :

Diwanzde Siwareî Merîwan û Pazde çîrokî tirî kurdî, Moskuw, 1968

Mêjoy Edebî Kurdî Niwê, Moskow , 1976

### 3.3 Nasandina Meruf Xeznedar Ji Alîyê Hevalên Wî Ve

Nivîsîna : Prf. Dr. Zahir Letîf Kerîm Dema ez xwendevanê kolêja edebyata zanîngeha Bexdayê bûm li beşê Erebi, Min gelek di xwast akademîsyenên kurd Prf Ezedîn Mustefa Resul û Maruf Xeznedar bi nasim. Van birêzan xwena min bi cih anîn, ez bû hevalê van birêzan . Ev herdu akademsîyenên kurd beşê zimanê Erebi xilas kirîbûn, min sudekî mezin ji wan wergirt. Di sala 1985 an de piştî ku min bawernameya dîktoratîyê bi destxist, carek din li zanîngeha Sellahedîn a Hewlêrê peywendî li gel birêz Xeznedar de danîn. Mayîna min ya di zaningha Sellahedîn a hewlêrê de herî zêde wextê min li gel wî derbaz bû. Bi dirêjahîya demêre ev têbînî û ser encama li jêr li ser vî hizirmend, rewşenbîr û akademsîye ne çêbû : Yekem di alîyê zanîsta wêjey., ferhengî, sîyasî, sosyolojî, Arkolîjî û xwedîyê hêzekî zêde zîrek û mînak bû. Ji bo her babetekê jî bi zanebûn û pirofesoynelî dest bi giftogoyê dikir. Ji bo pirsyaran jî pispor bû.

Di alîyê teknolojîyê de çavkanî wekî niha nebûn. Eger pêwîstîya min bi zanyarîyekê heba, ez raste rast diçûm cem Dr Ezedîn û Xeznedar. Rate bi fermî xwendekarê van her du berêzan bûm, lê belê hertim demê xwe ji bo xwendevanan vediqetand. Dewlemednîya pirtûkxaneyê Xeznedar bê wê nebû. Pirtûk û çavkanî ji bo armanca bidestxistinê bû, belkû hemû jî xwendî bû. Gotina babetên zanîstî û semînerên wî tamedek taybet ya xwe hebû. Jora xwendin û wane gotina wî berevajî yahemû mamosteyan bû. Wekî mamostayekî zanîngehê li gel xwendevanan û babetan bazar dikir. Gelek gohdarvan amaede dibûn. Wekî edetekî hertim di destpêka wanegotinê de navê xwendevanan di xwend, li gel vê jî xwendevan bêyî ku direng bimînin amade dibûn. Ev jî di alîyê de dizivire ser gelek zanyarî û zanîstên wî . Di alîyê din de jî, bibo hêzek ji bo kesayetî, deronî û sosyolîjîya mamosteyan. Duwem \_ Hestên wî yênnîştîmanî û neteweyî di astekî bilind de dihar dîtin. Hertim di got : " Xwezî min desthilatdarîya wê hebûya, min Malbendekî Akademî a niştîmanîya serbixwe dameziranda. Meyê bikira cihê fikir, zanîst û dahatûya wêjeyê " . Ger çi ji derketinê hesnedikir, lê belê hinek caran meseleyên giring û pîroz neçar dikir bi çê serdana malên mamosteyan.

Hevjîna wî dibêje : " îro Dr gelek bê hêze, jisiharê ve bê nan û xwarin çûye pirtûkxaneyê û dibêje naxwazim kesekê bibînim ". Dema dengê min bihîst got fermû were xwarê ( Pirtûk xaneyê wî di jêr zemînê debû ). Dema min dît, di rastîyê de

gelek bê hêz hat ber çavê min. Min got : Ev bê hêzîye çîye ? Fermo " Çawe bêhêz nabim ! Di alîyekê de Enfal û di alîyek din de jî Kîmya baran " . Di wî alî de dilê wî gelek nazik bû, bi eşkeryî çavên wî tejî bû ji rondikan. Sêyem\_ Soz û dilsozîya wî beramberî kesên beramber hebû. Mamoste ne kesekî ezezî bû, ewî gelek rêz li zanîst û pêşketina kesê beramber digirt. Ew ê pêwîstî bi mamoste hebûya wekî xwe bexşekî alîkarî dida. Mala wî jîhemûyan re wekî qelenekê bû bê cîyawazî. Di alîyekî din de jî bibû malbendekîzanîstî wekî wê bêjinger xwedîyê çêbûnea malbendekî akadem netewî û serbixweyî derdiket. Rojane gelek mamoste û xwendevanan berê xwe didan mala wî. Di alîyekî din de jî hevjinna wî xizmet dikir hertim xwarina nîvro û êvarê amade dikir. Mamoste jî xerîkî nivîsîn û xwendin û alîkarîya kesê beramber bû. Rojane ew hêze di xwede didît hertim berdewam bû û jê aciz nedibû. Ev rêzgirtine tenê min ji Hatem bihîstîye. Di rewşên sîyasî yên aloz de, di şerê birakojî de, mala wî bûye cihê penaberan. Her di wan rojan de rêya ket mala mamoste û çend hevalên sîyasî yên dîyar li wir bûn.

Wekî bira û gul xizmeta wan dikir. Min got: Mamoste mala te bûye mala Ebo Sofyan. Ewî jî bi lez rastî temamkir û got : " Mn Daxlbit al sofyan fho amn " Armanca wî ew bû , kesê ku tê mala min mal mala wane. Ji bo kesekê jî nîne lêpirsîna li gel wan bike. Ev jî wê radigehîne mamoste kesekî dilsoz û bi wêrek bû. Min qet hîs ne kir dibin destê zilamên desthilatdar û rejîmê de bit. Çarem\_ Kesekî ne ezezî bû. Mamoste ne kesekî girtî bû, gelek ji karkrinê hes dikir. Tenê arîkarîya xwendevanên jêhatî û hejar jî dikir. Li piştî raperînê bi alîkarîya her du birêz Dr. Cemal Nebez û Dr. Hesenî Husam li Berlînê rêxrawekî xêrxwazî ji bo alîkarîya zanîgehên Kurdistanê û xwendekarên jêhatî û hejar çêkirin.

Mamoste, piştî serketina rêxrawê daxwaz ji Dr. Heme Nurî Arif kir, da ku karan wekî pêwîst bike. Piştî me daxwaz ji Dr. Kawis Ezîz Beg kir, ew jî wekî endamekî li gel me kar bike. Karê me hemûyan xwe bexş bû. Rêxrawa me di çar salan de bi şêweyekî xweşik kar kir. Piştî di nav xwe de dawî li karanîn. Di wî demêde mamoste û endamên wan mînakên karê paqij bûn. Me çî deman hest ne kir mamoste serokê meye, belku hemû kar ruberuyê me dikir. Ji bilî vê jî li mala Dr. kemal Xoşnaw bi amadebûna birêz Dr. Heme Nurî û Dr. Kawis me civînek li ser armanca avakirina komela Akademîya Kurdistanê encam da.

Lê belê me dixwest yekek wekî Dr. Ezadîn yan Xeznedar serokatîyê bi gire. Lê belê Xeznedar daxwaza hemûyan qebûl nekir, piştî Dr kemal bû serok. Ji ber wê ya ku li cem mamoste ne girîng pile û post bû. Di dirêjîya wê de dibêje nasîna mamoste, rojekê min peyvek neşirîn bihîst, xwedî nefsekî herî bilind bû. Piştî beşdarî pirojeya zanîstî bû. Hezar silab li rihê vî hizirmendî, ku bi xwe û xêzana xwe ve di xizmeta ferheng û rewşenbîrîya kurdî de bû.

### **3.4 Meruf Xeznedar û Dîroka Wêjeya Kurdî**

Çavkanîyên bi nirx yê pirtûkxaneya kurdî wekî berhemên zindî yê Emîn Feyzî. Mamoste Eladîn Secadî di bergekê de dîroka wêjeya kurdî di sala 1952 an de belav kir. Ji bo sudmendî û lêkolîn, pisportîya di dîroka wêjeya kurdî de. Pêwîste em hewil bidîn sudê ji vê berhemê werbigirîn. Di zutirîn dem de ewê hewil bide di dîroka wêjeya kurdî de pisporbe, pêşketinê li ser wêjeya kurdî bike, pêwîste di huzura vê berhema mezin de bi sekine sud ji karê Dr. Xeznedar werbigire. Ji ber wê jî bi kurtî li ser pirtûka xwe dibêje : Nivîskarê mezin yê netewa me Dr. Meruf Xeznedar, " Dîroka wêjeya kurdî " di şeş bergan de nivîsiye. Şakara dîroka wêjeyî, destpêk ta naverasta Sedsala 20 an beram ber sala 1945 zayînî nivîsiye. Bê goman di vir de em dikarin kurteyek a vê berhemê bixînin ber destê xwendevanên bilind. Her şeş bergên " Dîroka wêjeya Kurdî " li Hewlêrê çapxaneya Aras çapa duwem di sala 2010 an ji bo wî kirin. 2000 pirtûk di pîvana ( 14.5 21.5 ) naveroka her şeş bergan di ( 3399 ) rupelande çap kir û belav kir.

Armanca wî di vê nivîsînê de ew bû bibe çavkanîyek ji bo dibistana, zanîstgehan, akademîyan û ferhengîyan. Eger giranî û veşartin tê de hebe, hewildaya vekolînekê ji bo wê bike. Hemû berhemên wêjeyî di vî bergê pirtûkê de dîyar kirîye û mînak jêre anîye. Dîyare nivîsîna vê pirtûkê nivîsîna dîroka wê berhemê ye ku nîşan daye. Kurd welatekî mînak û birêke. Ji ber wê hemû berhemên wêjeyî digire. Hewil daye rexneya wêjeyî û rêbaza wêjeyî berhevkirî bi karbîne ji bo bike bingeha "Dîroka Wêjeya Kurdî " Cihê nivîskar û helbestvanên kurd di qonaxa dîrokê de li ser bingeha temenê helbestvandîyar bû. Nêzîkî temenê 20 salî dîyar kirîye ji bo serdemekê.

Hewildaye ne gehe wêjeya salên şeşî. Goherînekî eşkere ya sîyasî, civakî û aborîya bi hêz di Kurdistanê de çêbû. Heya roja îro jî bi karanîye. Di babetên rewşa kurdawerî ji kevin heya navîna duwem a sedsala 20 an. Tekst û belgeya vî karî herî



zêde zarevayên cîyawaz yên zimanê kurdîne wekî bi xwe jî belav kirîne. Di her zarevayekê de berhevkirinek jêre kirîne kîjan ji wan rastir, û xweşikê belav kirîye. Di seranserî vê pirtûkê de gelek zarevayên wekî kilasîk û Romantîk bi karanîye. Wateya van zarevayan li gel karanîna wan tê gohertin. Tenê ne yek wateye, mînak ; " kilasîk " ji bo gelek wateyan bi karhatîye. Wekî: Wêjeya kevin, wêjeya xwendevanên bilind, wêjeya salona Ewropa, Wêjeya berhem têde be, wêje bi be sedemê çavlêkirinê û wêjeyek bibe ya dibistanê. Her wiha wêjeya tomarkirî ji bo wêye ku di wêjeya serzar de neyê tomarkirin û cudabike. Wêjeyek di encama lêkdana çanda çend netewan de çêbibe, wekî wêjeya Misilman, Silavî û Latînî. Her wiha zarevayê " Romantîk " jî eger em behsa pêşîya Sedsala 19 an bikîn bi wateya cîhana xeyal, sofizîm hatîye. Ji bo vê wateyê heya niha berdehame. Lê belê di piştî sedsala Hejdan de ,destpêka sedsala 19 heya niha ji bo vê armanca dibistanê bi kar hatîye. Bê goman naveroka vê pirtûkê komek sergotarên cîyawaz di nava xwe de girtîye. Ji bo pêkanîna gehîştina armanca babetên giştîye ku dîroka wêjeya kurdîye. Di berga yekem a pirtûka xwe de coxrafya kurdistanê û malbenda kurdewariyê destnîşan kirîye. Dîroka kevin a kurdî, nîjad û li hevçûna navê kurdî hozên dîn. Serhildana îslamê, bûyera cenga Çaldîranê û dabeşkirina kurdistanê. Zimanê kurdî ,zareva dîrok û danîna alfebê ji bo zimanê kurdî. Ayîna kurdan " Zerdeşt, îslam, Êzîdî û Parsan " jîyana xêzanî, çîneyetîya civaka kurdî di reftar û otografyayê de....Xwendevan û komek rewşenbîrên xwendevanan.... Destpêka wêjeya kevin a cîhanî û wêjeya kurdî ya serzarîya nivîsî. Helbestên kurdî di alîyê naverokê de.... Qonaxa helbestên wêjeya ayîna Yaresan. Beşê herî zor yê naveroka bergê yekemê ê vê pirtûkê " Deh " beş zanyariyên giştîye ji bo hemû qonaxên wêjeya kurdî ye di destpêk heya navîna Sedsala 20 an. Destpêkekî giştîye ji bo hemû bergan ji yekem heya dawî. Di sedsala 19 an û 20 an de kurd li turkîye, îran êraq û Rusya bûn. Bergê duwem jî di alîyê dîrokê ve ew babet di nava xwe de digirt ji sedsala 14 an heya sedsala Hejdan di nav xwe de digirt. Di vê pirtûkê de hinek peyvên zarevayê zimaê bîyan di alîyê rast nivîsînê de bi çend

Şêweyekî nivîskaran hemû bi rastî tî jîmartin. Ji ber ku zarevayên cuda ê zimanê kurdî bi corekê hatîne di nav helbestan de. Naverokaberga " 2 " komek babet di nava xwe de girtîye wekî jîyana sîyasîya Kurdistan û navçeyên coxrafî yên goherî. Mela Pêîşan, Nîl Bêgî Caf, Bêsar, Elmas Xanî Kenduleyî, Xanaî Qubadî, Welî Dîwane, Rencorî, Ronesanê wêjeya kurdî li bakurê Kurdistanê Elî Herîrî, Feqîyê

Teyran û Melayê Cizîrî. Bergê sêyem " Dîroka Wêjeya Kurdî " behsa navîna yekem a sedsala 19 an dike wate, nivê sedsalê dike ( 1801-1850 ). Ev destnîşankirine wê nagehîne ku behsa berhem û xwedîyê berhemên wêjeyîya kurdî. Di navbera van pêncî salan de ji dayîk bûye û koça dawî kirîye. Belkû nîva sedsala 19 an demekî zêde ji navîna sedsala hejde nivê duwem ya sedsala 19 an wergirtîye. Ji bilî vê jî piştî wê rojê ji dayîkbûn di dema 20-25 salan têxe ser temenê xwedîyê berhemê. Ya girîng ewe ku xwedîyê berhema wêjeyî û berhema xwe zêdetirîn serdema jîyanê di wan 50 salan de werbigire ku nivê yekem a sedsala 19 an ne.

Naveroka berga sêyem pêktê ji nexşeya coxrafiya kurdistanê başûr û jîyan û serpêhatîyên Nalî, Salim û Kurdî. Xolam Reza Erkewazî, Şefî, Seydî, Komasi, Mela Cebar û Mewlewî, Wedaî. Her wiha peywendîya dinavbera du zarevayên zimanê kurdî goranî. Berga çarem, " Dîroka Wêjeya Kurdî " Çend babetekî karkirî rojên girîng di nav xwe de digire û di dîroka neteweya kurdî de. Nîva duwem a sedsala 19 an destpêka sedsala 20 an heya cenga cîhanê a yekem. Di wan rojan de hizra nîştîmanperwerî peydakirina sîyasî jêr navê kurdîti û Kurdistanê de bû. Rêxistina wêjeyî û rewşenbîrîya Silêmanîyê navçeyên wê wêne û samanê netewayetîya hemû kurdan bû. Ji ber ku li bakurê Kurdistanê ronensaza Cizîrî û Xanî lewazî tê de dîyar bû. Başurê Kurdistanê jî cihê wê girtîye. Di vir de jî wê rastîyê eşkere dike li di destpêka peydabûna wêjeya wêjeya kurdî bi helbestan destpêkir ta destpêka sedsala 20 an. Wekî pêwîst hatîye zanîn hinek ji wan helbestvanan di vî berg de behsa wan kirîye wêneyê fotoxrafi li ber dest bû. Lê belê ji bo yên din wêneyê xetkêşîyê kêşaye û belav kirîye. Naveroka vî bergî pêkhatîye ji dîrka herêm û coxrafiya başûrê Kurdistanê. Her wiha belavbûna ronensaza wêjeya kurdî li hemû navçeyan. Geşt li golzarê şîirî, Kêfî, Celî, Nexter, Sanî, Nîhanî, Mendî, Seyî Equb, Fayîq, Hacî, Feqî Qadir, Mehwi, Salih, Şêxreza, Wefayî, Herîq, Edeb, Xelîl, Tahir, Tîmor, Koşkî, Nahî, Xakî

Salmî Sine, Cîhan Nara, Mhreban , Hesen û Amîne. Berga pêncem, " Dîroka Wêjeya Kurdî " di vî bergî de zivirandina serhatîyên wêjeya netewî di nava herdu cengê cîhanê di sala ( 1914-1945 ) çêbûye di sedsala 20 an de. Em dibînin gelek berhemên wêjeyî di nava kurd neteeyên Rojhilata Navîn di serdema peydabûna helbestan de bû. Babetên wêjeyî jî bi Pexşanê re çêbû. Wekî, gotar, çîrok, roman, şanogerî û pexşanê helbestê.... Li gel wê ev hunera xweşik a wêjeyî çêbû. Lê belê

helbest bi serde serwer bû. Di dîroka rewşenbîrîya kurdî de edetekî ne di cih de heye. Ew jî bi pîvanekî şibandin başî eşkere dibe û bi xirabî tê veşartin . Ev bi xwe dibe pirsgirêk ji bo lêkolîna û gehiştina rastîyan. Bi vî awayî belku dîrok veşêre hinek caran jî pêşkêşî bibe çavkanî. Naveroka vî beşî pêkhatîye ji çend beşên wekî kurdî di nivê sedsala 20 an de. Mîhrîcana helbesyên nû û pejirandina pexşan, Bandora Şêx mehmudê hefid di wêjeya kurdî de, bandora her du cengên cîhanê di wêjeya kurdî de, berhemên wêjeyî yên Pîremêrd, Mistefa Şewqî, Mîrza Xefor, Narî, Zîwer, Hemdî, Safî, Bêkes, Mîhrî û Dildar.

Berga Şeşem " Dîroka wêjeya kurdî " di sala ( 1945-1975 ) an de di alîyê nivîsandina vî bergê de bergê şeşem beşek ji bergê heftem di nava xwe de digire , ji ber sedema çapemenî û hunerî. Ev salane di wêjeya kurdî de girînge ji ber ku di van deman de qonaxa helbestên nû û pexşana hunerî bûn. Li gel wêjî helbestên eruza kilasîk wekî xwe man. Hinek carên din jî tevî helbesên nû bûn. Ev jî ji ber wêye helbestvan qalbinê kevîn yê kilasîkî bûn, armanca civaka sîyasî bikar dianîn. Ev heyîna tevîkirina kevîn û nû bûn encama serhildana berhemên nû. Helbestvanên vê serdemê bûn du beş. Yekem rêzîknameya helbestên kilasîkî kevîn herî zêde girîngî bi nujenîyê didan. Di çarçûveya helbestên eruza îslamî de. Beşê duwem rêzîknameya helbestên nû û nûxwazîya serdema ku bi giştî zêdetir girîngî didanê. Ji berku di pêş de nebûn di alîyê sîma û naverokê de tiştên nû anîn dinava wêjeya kurdî de. Dîroka wêjeya neteweyekê hêvî, hizir û bawerî, îdeolojî , fikir û xeyalê hemû kesên wê neteweyê bû. Erîşkirina tirk, ereb û eceban li ber xirabî û destkarîyê de bû. Naveroka babetê pêkhatîye di sala 1945-1975, babeta wêjeyî, helbest pexşan huner, wêjeya kurdî di li Qafqasya Rusya, wêjeya kurdî li Surya, Gulistana helbestên cewherî, Bêxod, Ebdulrehaman Begî Baban, Muftî Pênciwênî, şaho, Şêx Mehmud, Kemal, Emîn, Rehîm Hekarî, Çirostan, Ehmedê Nalbend, Selam, Tufîq Wehbî, Esîrî, Xadîm, Kamîran Bedirxan, Erebe Şemî, Nurî Şêx Salih, Orfî, Kanî, Refîq Hilmî, Qanie, Esed, Nasîh, Wîsalî, Remzî, Heqîqî, Cigerxwîn, Awat û Gor.

### **3.5 Peywendîya Dinavbera..... Nujenîya Helbestên Kurdî û Meruf Xeznedar De**

Lêkolîn di nukirina helbestên kurdî de karekî wisan asan nîne. Demeke nivîskarên kurd xerîkî lêkolîn û dîyarkirina nûkirina helbestên kurdîne. Her di pirtûka ( Şîr û Edebyat ) Refî Hilmî bi gire , ta pirtûka ( Karwanî niwêy şîrî Kurdî )

a Kake Felah û çendê din. Ev hewlane heya destpêka Sedsala 21 an nukirina helbestên kurdî bi şêweyekî serekî bû. Tişt jî di alîyê wezin û qafyeyê de tê dîtin. Tenê gelek caran kîna kesan bi ser nivîsînan de serwer dibe. Li piştî salên 2000 an de çendîn nameyên akademîk di vê derbarê de nivîsîne. Lê belê wan jî bi heman şêwe girîngî bi wezin û qafyeyê dayîne, ew qas girîngî bi bingeha helbest û helbestgerî goherîna ne dayîne. Raste wezin û qafye du alîne ketine ber nukirina helbestan. Ji ber wêjî di nameyên akademîk de dîyare çî tişt ne xistine ser lêkolînên pêşîya xwe. Mînak, yek ji wan behsa rêgeza nukirina ji alîyê helbestvanan ve dike. Ya din jî di alîyê helbestvanekî din deye. Tenê nujenî û nukirin tevî kirîne. Her zareveyek wateyekê di gehîne. Ew kesên ku heya niha dîroka wêjeya kurdî nivîsandîne, nekarîne bi şêweyekî hur û zanistî vê qonaxê derbaz bikin. Her di dîroka wêjeya kurdî de Eladîn Secadî ta wê ( Dr Meruf Xeznedar ) ev nivîsîna dîrokî tenê xwe di komkirina jîyan û mijarên helbestvanan de dibîne. Akademsîyenê wekî ( Dr. Meruf Xeznedar ) di dîroka wêjeyî de heya mijarên ( Şêrko Bêkes û Ebdula Peşêw ) hatîye. Bêyî ku behsa helbestvanên salên 80 û 90 an piştî sala 2000 an bike. Ji ber wê vê gotinê dikim: Ji ber ku Navbir eger ne xelet bim di sala ( 2010 ) an de koça dawî kirîye. Ev jî wê radigejîne nukirina helbestên kurdî bi kêmî heya salên 2000 an bû.

Gelek ji wan nivîsînên ku di jêr navê lêkolînê de tên nivîsîn bêyî rêbaz tê nivîsandin. Her çî qas nameyên akademî di destpêkê de tê nivîsandin bi filan rêbazê min kar kirîye. Lê di rastîyê de rêçke û bingeha wê ne ji bo lêkolînê ye. Gelek ji wan dehsala ji bo lêkolînê tê hilbijartin. Ji bo polînkirina nujenî û nukirina helbestên kurdî bi deh sal deh sal ji bo lêkolînê dîyar dike. Ev jî kar di bingeha lêkolînê de dike. Ji ber ku helbestvan hene di salên 80 an de rolê wan hebûn, heya niha jî ev role berdegame.

Pirtîka ( Hrke Alhase Fî Alşer Alkrdî ) a ( Dr. Serwer Ebdula ), lêkolînek di ( Bizotneweya nujenîya di helbestên kurdî ) de ji alîyê bikeya çavdêrîyê hat çapkirin. Ev nivîsîna min hewleke ji bo xwendin û şîrovekirina vê pirtûkê ji ber çend sedeman. **Yekem** : Lêkolîn bi zimanê erebî hatîye nivîsandin. Girîngî ya wê di wê deye xelkên bîyanî agahdarê nukirina helbestane di nav wêjeya kurdî de. Ev hewildana lêkolînê ne wergere.

**Duwem:** Şîrovekirina qonaxên nûjenîya helbestanliser bingeha mijar û heyînan kirîye. Di çi salekê de mijarekî nu û cuda jimijarên pêşîya xwe nivîsîye, ev sal kirîye destpêka qonaxa xwe.

**Sêyem :** Nukirina helbestên kurdî, bi ser çend qonaxan de dabeş kirîye. Ev dabeşkirina nu û cudahî li gel dabeşkirinê lêkolînên din heye.

**Çarem :** Bi awayekî hur û kur behsa her qonaxekê kirîye û taybetmendî, sedem û pîlanên her qonaxekê dîyar kirîye.

**Pêncem :** Lêkolînek di sînorê navöe û şêwazê xwe de dinivîstand. Lê belê girîngî bi berhem û rolên helbestvanên hemû navçeyên Kurdistanê daye û bi hurî û lêfikirîna hemû şêwazên mijar û berheman kirîye.

**Şeşem :** Cara destpêkê ye em lêkolîne di dîrok hewilû tezê lêkolînên kurdî de berê xwe dide dîyarkirina şêwazê nivîsîna helbestên nû yên kurdî. Di alîyekî nû de heft şêwazan destnîşan dike.

**Heftem :** Dîsan cara destpêkê ye di dîrok, lêkolîn û tezên kurdî de lêkolînekî be. Pêşkêşkirina helbestên nû yên kurdî û şîrovekirina wan destnîşan dike. Di alîyekî rawanî de bike çar beş û dîyar dike.

**Heştam :** Ev teze nexşeya ( Bizotneweya Nukirinê di helbestên kurdî ) de bi hurî dîyar dike. Bi şêweyekî ne raste rast bi cuda di ( Nexşeya berfireh a helbestên kurdî ) de tê dîtin. Bi şêweyekî navendî heyînen nû û tevlîkirina bizotneweya di helbestên kurdî de tenê wekî beşekî ya helbestên kurdî ne wekî hemûyan tê zanîn. Bi vê re em dikarin fikrên lêkolînvana lêkbidîn, xaneya ( Nexşeya helbestên kurdî ) girîngtîre ji xaneya ( Bizotneweya nû di helbestan de ). Di encamê de navê helbestan û hewlên helbestên bilind, ne şerte di xaneya duwem debî ji bo ku girîng bê naskirin. Belkû gelek asayîye tenê di xaneya yekem de be.

**Nehem :** Ev lêkolîne bi şêweyekî ne raste rasr girîngîya helbestên bi zindî ezmûna afirandina girêdide. Ne wekî di qonaxekê de ji bo demekî kurt biçe pirojeya nûjenîyê de. Bi vê re eşkere dibe fikê lêkolînvane eşkere bike, girîngîya helbestavan ne di wê de ye di nava pirojeya nûjenîya helbestan de be yan na. Belkû girîngîya helbestvan di wê deye ta çi astekê afirandin bi şêweyekî berdewam bûye kirokîya nasnameya wî.

Li gel wêye ev lêkolîna me pê serketîye. Lê belê ev nayê wê wateyê ku zanîn û balkêşîya me di wê derbarê de nebe. Di dema xwendina her dibistanekê de balkêşîya xwe em dinivîsîn.

Ev teze ji destpêkek û heş beşên serekî pêkhatîye. Her beşek jî ji çend beşekê pêkhatîye. Emê di vir de li gorî pêwîst hewla xwendina her beşekê bidîn. Ewa cihê balkêşîya min bû, nivîskar di destpêkê de cudahîya di nava du zarevayan( Altdîd û Althdîp ) de kirîye. Di kurdî de em dikarin herdû zarevayên nû dabîn. Heya niha jî di nava lêkolînên kurdî de ev du zarevaye tevî kirîne. Her çî qas sinorê her du zarevayan nêzîkî hevîn,lê belê cîyawazî di navbera wan de heye. Li gorî fikrê nivîskar nubûna ( Altdîd ) heyînekî pêşîde hebû. Lê belê pêşketinê jî bi bandora serdema xwe ve dibîne. Goherîne di şeweyê helbestê de di şeweyekî dîyar de ji bo şeweyekî din dibîne. Lê belê nêzîkatî li gel bar û şeweyê pêşî de heye. Nûbûna şeweyê helbestê heyîna xwe heye. Wekî helbestên kilasîkî, pêşî Melayê Cizîrî û Xanî hebûna wan hebû. Lê belê Nalî hat bi zimanekî nû. Bi wêne û alîyê îstatîkîyekî nû ev şeweyê helbestan pêşxist. Lêbelê bi heman wezin û qafyeyê.

Her ya ku nûye ( Altdîd ) heyînekî afrênere di çarçûveya dema dîrok di dariştina hunerek a wêjeyî de. Ev heyîne di bingeh û pêkhatiya xwe de tiştekî nûye,di pêşîyê de şewe û mînak ne bû. Bi kurtî afirandine. Merca vî corê afirandina nû pêwîste şeweyekî xolqêner be, bandorekî dîyar hebe. Mînak . Ev heyîne li cem Goran ê helbestvan hebûna wê hebû. Bi helbestên kilasîkî û hemû bingeha wê re da paş. Helbestvanên destpêka salên 70 an yên sedsala bûrî, bi temamî şeweyekî yê helbestên nû afirandin. Ji helbestên Goran û hevalên wî cîyawaz bûn. Nêzîkî van her du zarevayan ji wê çavkanîyan di girin. Heyîna nûbûna pêngava yekem di gotarên helbestê de rêxweşkerêk bû ji bo pêngavên din, ji bo serhildana heyînen nû di helbestan de. Her di vê destpêkê de nivîskar bi kurtî behsa vê nûbûna helbestên kurdî dike. Wekî Melayê Cizîrî bi anîna erûza erebî re helbestên kurdî berbi nûbûnê ve bir. Di şewe zarê Kurmancîya Navîn de jî, Nalî, Salim, Kurdî, bi zimanekî nû erûza erebî di helbestan de piraktîk kirin.

Nivîskar di vê lêkolînê de du qonaxên nûbûna helbestênkurdî di sedsala nuda ( Sedsala 20 ) an de dîyar kir. Qonaxa yekem ; di nava salên ( 1918-1920) li ser destê ( Ebdulrehîm Hekarî ), ev helbestvane di bingeha kevin a zimanewanîya helbestê de derket. Gotarên helbestên hekarî raste rast berê xwe da wê cîhanê ku civaka wî demî têde dijîya. Sud ji bawrîya îslamê ji bo gotina helbestên xwe bû. Bi taybet ( Bê hêvî nebe ) ku di sala 1918 an belav kirîbû. Her wiha nivîskar vê destnîşan dike Hekarî sud ji cud qafyeya xomalî wergirt û mijarê helbestên xwe li ser bingeh danî. Nivîskar

piştire girîngîya vê pêngava nû ya di helbestên kurdî de ji bo nûjenîyê bi çend xala eşkere dike.

**Qonaxa yekem** : Ev pêngava nûya di helbestên kurdî de di nava salên ( 1921-1931 ) an de li ser destê helbestvan ( Nurî Şêx Salih, Ebdulrehman Begî Baban û Reşîd Necîb ) dîyar kir. Mijarên vanhelbestvanan dewlemendî di teknîk, huner û xweyî bû ji bo cîhana ku têde hebûna xwe dibin ser. Gelek ji wan ( Goranê ) helbestvan li gel wan di hat jimartin. Lê belê helbestvan ev wekî qonaxekî nûkirina helbestan danî. ( Goran ) dike destpêkêka qonaxa yekema nûkirina helbestan. Nivîskar pêngava nûjenîyê di helbestên kurdî bi ser çar qonaxan de dabeş kirîye.

**Qonaxa duwem** : Dinavbera salên ( 1969-1983 ) an de helbestvanên grupa ( Rwange, Kifrî ) û ( Ebdula Peşêw ) dîyartirîn nûbûna helbestên vê qonaxê ne.

**Qonaxa Sêyem** : Di navbera salên ( 1984-2000 ) an de, helbestvanên Pêşrew yê dîyarê wêne.

**Qonaxa Çarem** : Ji sala ( 2001 ) heya niha.

### **3.6 Meruf Xeznedar û Peywendîya Bi Yeketîya Nivîskaran Re**

Di sala 1996 an de destpêka qonaxa ciwantîya min bû. Di wî demî de ji ber bûyerên şerê navxweyî ketim bajarê Hewlêrê û ji ber peywendiyên min. Ji bo kurên beş û Hewlêrê diçûm ku wî demî de Şehîd Mehdî Xoşnav serokê wî beşî bû.

Di wî demî de hogirê kesayetîya xwe û zanyarîyên bi nirx û bi sud bûm. Li gorîm kurêk da eşkere bûm ku nivîskaran ji bo wê sazkin. Di alîyek din de jî min dît xwedê jê razî bû ) Ebdulxaliq Sersam û Ebduleqîb Yusif, ( Bi hev re kurek girêdan li ser ) Sellahedîn Eyubî , ew î pîşdarîyek hebû.

Di wir de min hîskir mamoste Xeznedar, jîre di zanîst, zanyarî, babetên dîrokî û rejîman de. Bi taybetî dîroka wêjeya kurdî û dîroka wêjeya gelan Min êdî dixwest ez pirtûkên wî bikirim û bi xwînim. Ji ber wê bûye nexşa berhema bi hêz û binirxa min bû. Lê belê di wî demî de ji ber sedema rewşa xirap û aliyê aborî de minne dikarî ew heskirina xwe eşkere bikim. Tenê ew bû di govarekê de yan jî rojnameyekê de berhemên wî li ber çavê min bikeve dema min di xwend tamedek gelek xweş bû min çend carek din jî di xwend.

Min êde ew dem netî heya rojeyê li bajarê Silêmanîyê bûm. Mamosta Kerîm Zend di dema pirojeya azadîya êraqê de zanî bû diçû Hewlêrê. Edî çend berhemên xwe dam min û daxwazkir çendekan bibim ji bo Dr. Meruf Xeznedar. Min jî bi

şanazî qebûl kir min gelek hesdikir bibim jêre û serdana wî bikim û biçim xizmeta wî. Di wî demî de çend berhemekê jê werbigirm hêvîya min bû bi destnîvîsa xwe li ser wê pirtûkê binîvîse û pêşkêşî min bike.

Piştî demekê çend dîdarên rojnamevanî ji bo heftenameyekê gulana saz danî bû. Ji Silêmanyî ez çûm Hewlêrê ji wir jî çûm Govara Gulan. Her li wir min ji Feysel Dîhatim pirsî mala Xeznedar li kure ? Ewî jî navnîşana wî bi temamî da min û piştî nîvro ez çûm xizmeta wî. Ez gelek keyfxweş bûm ku bi dîdarî gehiştim wir û çend pirtûkên xwe jî pêşkêşî min kir bi xwe jî li ser nivîsî. Piştî pirsî wêjeyê û xelkê Silêmanîyê kir, wê rojê li ser alîyê rewşenbîrî û wêjeyî hizrê me tevîhev kir. Piştî min berhema Kerîm Zendm pêşkêşî wî kir. Piştî ez birim nava pirtûkxaneyê mezin û dewlemend gelek tişt nîşa min dan.

Di nava pirtûk xaneyê mezin de min jêre got : Ev pirtûkxaneyê babetên cor bi cor yê zimanê bîyanî û navxweyî di nava xwe digire. Mînak; beşê arşîvê destnîvîs, wêne û kêmin, beşê name û rupelên kesyetîyên nasyar û bîyanî ne. Beşê kasêtên arşîv gotin û wêneyê hevpeyvînanin. Beşê pirtûkên nivîskarên mezin gelek ji wan bi destnîvîsa xwe min ji bo wan nivîsî. Piştî got ;, her kesê ku bê di nava wê pirtûkxaneyê de, pêwîste navê xwe binîvîse û di wê tomarkirina mezin de tomar bike ji bo dîrokê. Min jî gelek bi keyfxweşî nav û imzeya xwe tomar kir.

Carekê min ji Xeznedar re ragihand, ez xerîkê nivîsîna pirtûkekê me ku li ser Ebdulqadir Qirgeyî helbestvan, Soz da min ku destpêka wê pirtûkê binîvîse. Ez jî bi vê gelek keyfxweş bûm. Êdî piştî bexşîşekî zêde ya di alîyê nivîsîn û lêkolîna wane gotinê de, Mixabin di roja 26/10 / 2010 an de Prf. Dr. Meruf Xeznedar li bajarê Hewlêrê koça dawî kir. Zîyanekî mezin geha gelê me. Lê belê ewa ku cihê keyfxweşîyê ye bajarekî ya wêjeyê ji bo me di cih de hêla ku wî demî netewa me sudekî mezin jê digirt.

Navê wî yê rastî Ebdulqadir Ezîz Axayê Xeznedaran bû, di 1/11/1930 an li bajarê Hewlêrê ji dayîk bû û qonaxên xwendinê li Hewlêrê û gelek cihên din xwendîye. Di destpêka şêstîya sedsala bûrî li Yekêdîya Sovyetê li zanîngeha wê de xwendîye û pileya Dr di ziman û wêjeya kurdî de wergirtîye. Piştî zivirî Êraqê bû mamosteyê kolêja wêjeyî ya zanîngeha Bexdayê. Çendîn helbestvan û nivîskarên nasyar yê gelê me li ber destê wî xwendîye û rêveberê çendîn nameyên macistir



doktorarîya di alîyê taybetmendîyên xwe de kirîye. Her wiha xwedîyê bi dehan pirtûk gotar û lêkolîn belav kirîye.

Berhemên Xeznedar pêktên ji 42 pirtûkên çapkirî, di alîyê nivîsîn, werger, lêkolîn di alîyê xwendina bi zimanê kurdî, erebî û Rusî. Ji bilî van jî hinek destnivîs jî heye. Di nava yên çapkirîde ya herî girîng ( Dîroka Wejeya Kurdî ) ye ku ji hef bergan pêkhatîye. Di dawîya temenê xwe de jî xerîkî nivîsîna Jinnameya xwe bû ku bi navê Rojên min, heya bi xwe di jîyanê de bû şeş berg derket. Bega heftem jî ( Yadaştakanî bi navê Rojgarî Min ) li piştî xwe çapkir.

### **3.7 Rolê Meruf Xeznedar Di Pêşxistina Zanist û Wêjeya Kurdî De**

Dema ez xwendevanê kolêja wêjeyî a zanîngeha Bexdayê bûm li beşê Zimanê Erebi, ji nêzîk ve min gelek dixwest kesayetîyên akademî yên kurdan, mînak Ezedîn Mistefa Resûl û Xeznedar nasbikim.

Meznahî û lêborîna van birêzan xwena min bi cih anîn. Ez bûm hevalê van birêzan û zêdetir jî. Ev her du akademsîyen astekî bilin a kurdî bûn di bingehde Zimanê Erebi xilas kiribûn. Ez nu wan dêm dikim û min sudekî mezin ji wan girt. Di sala 1985 an de piştî wê min Bawernameya Doktoratîyê bi destxist. Carekî di zanîngeha Sellahedîn a li Hewlêrê li gele birêz Xeznedar min nasîna xwe nû kir. Di nava van dehsalan de mayîna me ya di zanîngeha Selahedîn de herî zêde min demê xwe li gel vî birêzî derbaz kir. Di dirêjîya vî demî de têbînî û çavkanîyên li jêr li ser van Hizirmend û rewşenbîrên Akademî çêbû.

**Yekem** : Di alîyê zanîsta wêjeyî, ferhengî sîyasî û sosyolojî ve xwe dîyê hêzekî bi mînak bû. Ji bo her babetekê bi hurî û bi zanyarîyekî pisportî dest bi goftigoyê dikir . Xwendina ji bo meseleya pirsyar keran pispor bû. Tenknolojya wî demî wekî ya niha û çavkanî nebûn. Dema pêwîstîya min bi zanyarîyekê hebûya ez raste rast diçûm cem birêz Ezedîn û Xeznedar. Raste rast ez dibûm xwendevanê van her du birêzan. Minhertim wextê xwe bi xwendinê ve derbaz dikir. Dewlemendîya pirtûkxaneya Xeznedar bê wêne bû. Pirtûk û çavkanîyên wî jibo rakirîên nebû belkû hemû jî xwendibû. Babetên zanistî û semîneran tamedek taybet yaxwe hebû. Cihê xwendin û wane gotina wî berevajî ya her mamosteyekê bû.

Wekî mamosteyekî rast yê zanîngehê hevpeyvîn li gel xwendevan û babetan dikir. Gohdarvan û kesên ronîştî di demê xwe de amade dibûn. Ev jî di alîyekê de

dizivire ser zanîst û zanyarîyan . Di alîyekî din dejî ji bo hêza kesayetî, deronî û sosyolojîya mamoste

**Duwem** : Hestên wî yênnîştîmanî û neteweyî di astekî bilind de dihar dîtin. Hertim di got : " Xwezî min desthilatdarîya wê hebûya, min Malbendekî Akademî a niştîmanîya serbixwe dameziranda. Meyê bikira cihê fikir,zanîst û dahatûya wêjeyê " . Ger çi ji derketinê hesnedikir, lê belê hinek caran meseleyên giring û pîroz neçar dikir bi çê serdana malên mamosteyan. Hevjîna wî dibêje : " îro Dr gelek bê hêze, jisiharê ve bê nan û xwarin çûye pirtûkxaneyê û dibêje naxwazim kesekê bibînim ". Dema dengê min bihîst got fermû were xwarê ( Pirtûk xaneya wî di jêr zemînê debû ). Dema min dît, di rastîyê de gelek bê hêz hat ber çavê min. Min got : Ev bê hêzîye çîye ? Fermo " Çawe bêhêz nabim ! Di alîyekê de Enfal û di alîyek din de jî Kîmya baran " . Di wî alî de dilê wî gelek nazik bû, bi eşkereyî çavên wî teji bû ji rondikan.

**Sêyem** : Soz û dilsozîya wî beramberî kesên beramber hebû. Mamoste ne kesekî ezezî bû, ewî gelek rêz li zanîst û pêşketina kesê beramber digirt. Ew ê pêwîstî bi mamoste hebûya wekî xwe bexşekî alîkarî dida. Mala wî jîhemûyan re wekî qelenekê bû bê cîyawazî. Di alîyekî din de jî bibû malbendekîzanîstî wekî wê bêjinger xwedîyê çêbûnea malbendekî akademînetewî û serbixweyî derdiket. Rojane gelek mamoste û xwendevanan berê xwe didan mala wî. Di alîyekî din dejî hevjîna wî xizmet dikir hertim xwarina nîvro û êvarê amade dikir. Mamoste jî xerîkî nivîsîn û xwendin û alîkarîya kesê beramber bû. Rojane ew hêze di xwede didît hertim berdewam bû û jê aciz nedibû. Ev rêzgirtine tenê min ji Hatem bihîstîye. Di rewşên sîyasî yê aloz de, di şerê birakojî de, mala wî bûye cihê penaberan. Her di wan rojan de rêya ket mala mamoste û çend hevalên sîyasî yê dîyar li wir bûn. Wekî bira û gul xizmeta wan dikir. Min got:Mamoste mala te bûye mala Ebo Sofyan. Ewî jî bi lez rastî tamamkir û got : " Mn Daxlbit al sofyan fho amn " Armanca wî ew bû , kesê ku tê mala min mal mala wane. Ji bo kesekê jî nîne lêpirsîna li gel wan bike. Ev jî wê radigehîne mamoste kesekî dilsoz û bi wêrek bû. Min qet hîs ne kir dibin destê zilamên desthilatdar û rejîmê de bit.

**Çarem** : Kesekî ne ezezî bû. Mamoste ne kesekî girtî bû, gelek ji karkrinê hes dikir. Tenê arîkarîya xwendevanên jêhatî û hejar jî dikir. Li piştî raperînê bi alîkarîya her du birêz Dr. Cemal Nebez û Dr. Hesenî Husam li Berlînê rêxrawekî xêrxwazî ji bo alîkarîya zanîngêhên Kurdistanê û xwendekarên jêhatî û hejar çêkirin. Mamoste,

piştî serketina rêxrawê daxwaz ji Dr. Heme Nurî Arif kir, da ku karan wekî pêwîst bike. Piştî me daxwaz ji Dr. Kawis Ezîz Beg kir, ew jî wekî endamekî li gel me kar bike. Karê me hemûyan xwe beş bû. Rêxrawa me di çar salan de bi şeweyekî xweşik kar kir. Piştî di nav xwe de dawî li karanîn. Di wî demêde mamoste û endamên wan mînakên karê paqij bûn. Me çî deman hest ne kir mamoste serokê meye, belku hemû kar ruberuyê me dikir. Ji bilî vê jî li mala Dr. kemal Xoşnaw bi amadebûna birêz Dr. Heme Nurî û Dr. Kawis me civînek li ser armanca avakirina komela Akademîya Kurdistanê encam da.

Lê belê me dixwest yekek wekî Dr. Ezadîn yan Xeznedar serokatîyê bi gire. Lê belê Xeznedar daxwaza hemûyan qebûl nekir, piştî Dr kemal bû serok. Ji ber wê ya ku li cem mamoste ne girîng pile û post bû. Di dirêjîya wê de dibêje nasîna mamoste, rojekê min peyvek neşirîn bihîst, xwedî nefsekî herî bilind bû. Piştî beşdarî pirojeya zanîstî bû. Hezar silab li rihê vî hizirmendî, ku bi xwe û xêzana xwe ve di xizmeta ferheng û rewşenbîrîya kurdî de bû.

Di sala 1930 an de li bajarê Hewlêrê ji dayîk bû, ji binemala Xeznedarîyan bû. Qonaxa xwendina seretayî navîn û amadeyî li Hewlêrê tamam kir. Li zanîngeha Bexdayê beşê zimanê Erebî xwendîye. Di sala 1968 an de çûye Yekêtîya Sovyetê li wir jî Dîplomeya Doktoratî a wêjeya kurdî bi destxist. Piştî zivirîye bû mamosteyê beşê kurdî li zanîngeha Bexdayê, her wiha bûye beşê wêjeya zanîngeha Enabî Cezaîr û beşê wêjeya zanîngeha Sellahedîn li Hewlêrê. Xeznedar endamê kurî zanyarî kurdî bû. Rêveberîya gelek nameyên macistit û Dkturatî kirîye. Dr. Meruf Xeznedar yek ji damezirênerê Yekêtîya Sovyeta Kurdî û heya demekê sernivîskarê Govara wan bû. Nivîskarê kurdî bû, her wiha çendîn govar û sernivîsên kurdewarî derxistîye. Li Govara Rojî Kurdistan- Şemis Kurdistan deste nivîskarên li Govara Karwan rawêjkarê wêjeyî û rewşenbîrî bû.

Xeznedar, mamoste meruf malaxwe kirî bû, malbenda ronakbîrî ji bo parastina tekst û destnivîsên arşîva wêjeya kurdî. Her dem derîyê mala wî ji bo xwendevanan vekirî bû gelek xwendevanan sud ji pirtûkxaneyê wî a mezin wergirtî bû.

Meruf Xeznedar di salên 50 an de dest bi nivîsînê kir û gotar belavkir. Yadeştî rojanekî xwe di sala 1930 heya sala 1991 di 7 bergan de nivîsî bû bi navê ( Dicle Hizrim ) . Berhema wî ya dawî jî ( Dîroka Wejeya Kurdî ) ku di 7 bergan de

çap kir. Dr.Meruf Xeznedar xwedîyê nêzîkî 30 pirtûkên çapkirî bû. Xeznedar di temenê 80 salî de li nexweşxaneyê Şifa li bajarê Hewlêrê di şeva 25-10-2010 an de koça dawî kir.

### **3.8 Peywendîya Meruf Xeznedar Bi Helbestvan Nalî Re**

Nehem helbestvane navê wî( Xidir Xidir ) e û kurê Ehmedê Şawêsê Nalî Begê Mikailîye. Li gondê xak û toz li deşta şarezor hatîye cîhanê .<sup>61</sup> Di derbarê sala jî dayîkûn û mirina wî de çendînfîkrê berdesthene ku dibêje : ( Nalî di sala 1797 an yan 1800 zayînî yan jî zutir jidayîk bûye. Her yek jî Mihemd Emîn ZekîBeg û Eladîn Secadî, Dr Meruf Xeznedar û Sedîq Borekey salên cîyawaz danîye jî dayîkbûna Nalî. Diderbarê mirina wî de jî çendîn fikir heye lê belê ya ku nêzîk bû di rastî de ya ku dibêje di sala 1873 zayînî de koça dawî kirîye. Dîwana wî sax bûye )<sup>62</sup>.

Li ser xwendina helbestvan dibêjin; ( Ji bo temamkirina zanistan di hicreyê de debû. Jibo xwendinê armanc û berê xwe da xwendina ayîne bi nav û dengê kurdistan kirîye. Wekî : Sne Seblax Zerdîwaî Qeredax û ( Helbiceû Silêmanî ) .<sup>63</sup>

Li ser jîyana xêzana Nalî, qet belgeyek li ber destan nîne, Nalî jin anî be. Tenê di helbestên wî de ji keçîkekê hesdikir ku linavçeya qeredaxêbû. Di helbestênwî de bi ( Hebîbe yan Mehbîbe ) nav anîye. Hinek nivîskar li gorî wan ew keçe xelkê gundê ( Tekêye) Qeredax bûye navê ( Aşê bûye keça ( Şêx Camî bûye )<sup>64</sup>.

Ya ku mayî di vê kurte jîyana Nalî de bûye naveroka helbestên Nalîku beşekî zêde helbestên wî jî bo heskirin û xweşîktîya jinê bû. Her wiha helbestên ayînî sitayîşên Pêximber ( S.a.s ) helbestên niştîman perwerî cihê mîrê baban di nava helbestên wî de derdiket.

### **3.9 Jin Di Helbestên Kurdî De**

Gelek jî helbestvanên cîhanê jin kirîne hêvênê helbestên xwe. Beşek zêde yê helbestên wan behsa xweşîkbûn, pesindan, heskirina jî bo jinê bi corekê eger em jinê jî helbestan derbixîn çî wateyek ya helbestê namîne. Eger jin di gelek tiştan de mafê wê nebe lê di helbestan de mafê zilaman jî xwarîye.

---

<sup>61</sup> Mela Ebdulkerîm Muderîs û Fatih Ebdulkerîm, DîwanîNalî, Çapxaney Kurî Zanyarî Kurd, Bexda,1976,r,23

<sup>62</sup> Dilşad Abdula, Nalî Xorêk Hemîşe Beser Sermanewe ( Jîyan û Berhem ), r, 3

<sup>63</sup> M. Elî, Nalî Herle Lutkewe, Dezgay Çap û Pexşan Hemdî, Silêmanî,2009,r,6,

<sup>64</sup> Hebîb Caf, Têrramanêk Le jîyanî Nalî, Govarî Koç, J,18-19 ,2013,231,

Di helbestên gelên cîyawazde behsa jinê kirîye,çi helbestvanên Fari, çi jî yên Erebb û gelên din behsa wan kirîye.Kurd jî wekî wan neteweyan di behskirina jinê di gelek helbestên helbestvanên wan de dagir kirîye.

Ev girîngî dayîna jinan di helbestan de di zivire ser Fîzîk û laşê jinê. Bicorekê ( Her endamekî laşê jinê, bişêweyekî di helbestan de bala zilaman bi giştî nivîskar û helbestvanên kurd kêşaye. Nivîskar û helbestvanan di berhemên xwe yên cuda ê wêjeyî de wekî (( Çîrok, Pexşan, Helbest.... )) her yekê bi girîngîyekî taybet daye endamên dîyar ê jinê. Ji ber wê em dibînin : Her endamek li gel çendîn tiştên xweşik berhev kirîye. Mînak : Di helbestên dildarî yên kurdî de, bejna wan wekî (( Sipêndar, çinar û çîyan )) kirîne. Wêneyê wan jî, zilf bi çînor, ruyê nazdar jî bi pelên sor çavê şevîn jî bi nêrgis behs kirîye.

Her ev xweşiktî û naziktîya laşê jinê bûye sedemê balkêşîya zilaman, coş û heskirin di singê wan de kolaye. Wisan kirîye dest bavêjin pênûsê helbestan ji bo wan û singê xwe bêjin û binivîsîn.

Dîroka serhildana jinê di helbestên kurdî de dizivire ser a Babe Tahirê Hemedanî. ( Ev dîroke bi mijarên helbestên ne bi axaftinên bîrdozî tekez dike . Wêneyê jinên kurd bi corekî rast dur ji gomanan di du û çarînên Babe Tahirê Oryan de derdikeve ber çavan. ( 935-1010 )<sup>65</sup>. Wekî tê xoyakirin Babe Tahir helbestvanekî muteswî bûye, gelek çarînên xwe ji bo ( Eşqa Heqîq, Eşqa îlahî ) gotîye. Lê belê ya ku cihê balkêşîyê ye behsa evînî û dildarîya Babetahîr dike. Her wekî Fuad Hisên ji zimanê Eladîn Secadî digire û dibêje : ( Babe Tahîr di destpêka jîyana xwe de dilê wî eşqa Heyîv, rokana Hemedanî, reftarê Şêx û bejna ereryan soz û dîwanê xist ber serîyan. (( Fatim )) navê bedu û çavê mest du biroyên hîlal û bi dengdana îmroz sibeha dilê Babe tahîr tê derdikeve bi coş dibe ku helbestekê dibêje :

Du çeşmanit pîyale pir zumbê bî

Xerac Ebrwant mîlm rebî bî.

Hemî wede konî îmroz û ferda

Xuda dane, kî frda tu keî bê. <sup>66</sup>

Piştî Babe Tahirê Hemedanî hemû helbestvanên kurd helbest ji bo jinê gotîye. Babetên dildarî di helbestên wan de derdikeve. Her yek ji bo dildarîya keçekî şox û şeng deronî,coş û xoruşa xwe kirîne helbestên nasik. ( Eger fatime Xan, Babetahirê

---

<sup>65</sup> Husên Mihemed Eziz, Yaqut û Zemrotî Kurdî, ( Xoşewîstî û Evîn )Silêmanî, 2013,r,40  
Fuad Hisên Ehmed,r,35<sup>66</sup>

Hemedanî, Selma Xan, Melayê Cizîrî ( 1407-1481 ) Emîne Xanî Bê Saran, ( 1642-1702 ) , Xatona Enwerî Mewlewî ( 1806-1882 ) <sup>67</sup>

Li ser dîyarkirina babetên jinê di helbestên kurdî de, nivîskar armanca wî dildarîye. ( Salim, di daildarîyê de xwezayekî gelek navdar û nazik hebû li ser xwe û niha û pêşerojê ) <sup>68</sup>. Salim jî wekî helbestvanên din beşekî zêde ya dîwana xwe ji bo dildarîyê cuda kirîye. Gelek helbest û awazên nazik ji bo vê babetê nivîsandîye. Her wekî dibêje :

Dilm Şade le bendî silsileyî gêsuy dulberda.

Le şanî xewfna ke defeyî lemdawe dulberda.

Le dunyada dilm ger terkî gorurî tu eka sehle.

Bîron naye le şor û zemzeme û xewxayî mehşer da. <sup>69</sup>

Be ser seta bpêgî çetrî tawis eger goret.

Deka Bîron le ferq padşh zînet şr efserda.

Greî best dil le sînem da le hesret serdî mîhrî tu.

Ke heta agrî pirgr desûtên le mecmerda.

Thml ke zemanî koştî mn sretî nawî.

Le dilmaye bigrêm xom bibe dewrî dest û xencer da.

Ne ferhad kewte şorî min ne şîrîn geyîye rewtebe tu. <sup>70</sup> Salim di helbestên xwe de pesna xweşiktîya yara xwe dike biroyên wê bi kevan, birjangên wê bi tîr wesif dike û dibêje:

Qusî ebrû mujet tîr û kemane beemr

Nîgeht qeydî dil û afetî cane beemr.

Tîre baranî nîgaht le dilî eşqî zar

Tîjo suhan zede wek nukî senane be emr.

Pirtewî eaçî yaru dil sed pareyî min

Qseyî şewq mehu çakî ketane beemr.

Tîxî ebrûyî xemt sortî sîfî elî ye.

Baepî zemzeme şorî cîhane beemr. <sup>71</sup>

### **Armanca Ayînî**

Alîyê ayînî jî wekî her alîyê din li cem Salim cihê girîngîyê bû. Wekî helbestvanên misilman helbestên dînî di nava helbestên wî de dîyar dibe. Ji ber ku

---

Heman Çavkanî, r, 42<sup>67</sup>

Heman Çavkanî, r, 36<sup>68</sup>

Dîwana Salim, Heman Çavkanîya Pêşî, r, 8<sup>69</sup>

Dîwana Salim, r, 21-22<sup>70</sup>

Heman Çavkanî, r, 70<sup>71</sup>

helbestvanan di mizgeftan de xwendîne pêwîstî bi ayîna îslame. Her ji ber wêjî helbest di vê derbarê de gotîye, di helbestekê de behsa Kerema Xweda dike û dibêje :  
Rbna dil kon sa çi xolam çi emîr.

Wekî yek ehlî nîyazin çi xnî çi feqîrî.

Be umêdî keremet şam û shr griye kenan.

Deken avharî heqretc gedaw çi emîr.

Benvr rhmtî tuwele nvr ehlî beser.

Cimle nezdîkî necatî çi jelîl û çi esîr.

Şîrf ûxeletî xast be qeder kwalî cîhan.

Çîye bû qematî her kes çi gwîl çi qesîr.

Zor be kem wextî kerm qable bû rehmtî tû.

Cormî sfrî ne hedêke çi qalîl û çi kpîr. <sup>72</sup>

### **Armanca Nîştîman Perwerî**

Alîyê nîştîman perwerî jî yek ji wan alîyan bû ku di helbestên salim de derdiketin holê. Jiber wekî me gotî ; Salim, yek ji helbestvanên sê koçkaya Baban bû, di serdema Mîrnîşana Baban de bû. Mînîş û mîrê xwe heskirîye û helbest ji bo wî gotîye, hete tu bêjî helbestvanekî nîştîman perwer bû. Salim rûxandina Mîrnîşana Baban û dagîrkirina Silêmanîyê ji alîyê Osmanîyan ve, dema Silêmanî têkçû bandorekî zêde li wî kirîye. Xelk di kuştin dikan û bazar di şewitandin ( Salim berevajî Nalî, Kurdî , wêje û wefedarî... êdî agir girtibûyê. Her wekî di helbesta bilind û asîmanî de dibêje. Ciwantirîn şewe di babet xem û xefetêk çuyîna dewletan Baban û ji bilî perîşanî bîrsîtî , derbederî girtin, kuştin û şewitandina bajarê kurdan. <sup>73</sup>

Salim,xem û qeherekî zêde xwarîye ji bo wê rewşa ku Mîrnîşan ketîyê. Helbest li ser nivîsîye, yek ji wan helbestan ku navnîşana wê ( Cengî Baban û Osmanîya ) dibêje:

Lêm gerên ba goşegir bm destû ajoney kef zanan.

Gêjelokey bay nedamit tarî krd sifhey cîhan.

Saeqew berqî nehusest vilmetî da şerq û xerb.

berdê baranê be mexsus Leser molekî baban.

Turkî qors xorake gale bû galuey kird berqs.

---

Dîwana Salim, Heman Çavkanîya Pêşî,r,65-66<sup>72</sup>

Dîwana Salim,r,10<sup>73</sup>

Kewkebeî mahî mradî ehlî baban bû nîhan.  
Raste gardûn çabû ke rengî bedî rebgî welî.  
Narêjîne rengî bem renga le mudeî sed qran.  
Lew sawe hekmî bebe gişt derbeder kiran. ,  
Neydîwe kes le çîherekes cewherî huner. <sup>74</sup>

Di helbestekî din de jî alavayî li Baban dike û dibêje :

Al wedemilkî baban alwdae	Alwdae rîhanî canan alwdae.
Wekî esîrî turkman demben be zore	Alwdae ey şahî xoryan alwdae.
Mistedim bu beladî ravçî	Alwdae ey canan alwdae. <sup>75</sup>
Deştî hîcrettale wekî deryayî qîr	Alwdae ey mîhrî roşan alwdae
ruberuy mişrq eçim bu milkî rey	Alwdae ey qibley can alwdae.
Eşkî dîdem rengî gulnarî heye.	Alwdae ey arî postan alwdae. <sup>76</sup>

### Şanazî Kirin

Salim jî wekî helbestvanên din mafê wê hebû ku şanazî bi xwe û helbestên xwe bike. Ji ber ku helbestvanekî mezin yê serdema xwe bû heya niha jî helbestên wî cihê girîngiyê ne. Di helbestekê de şanazî bi hêza helbestên xwe û hevalên xwe dike. Dibêje :

Le rojî îmtîhana dîm beramber talib û meşûq.  
Kemer bestey huner hatin le tîpî îşq bazana.  
Le yekla nalî û meşûû le lay Salim û Kurdî.

Le hengamey huner germî tika cû bûn le mewlana.  
Le mîdanî be laxetda beswarî merkebî mezmûn.  
Be kurdî herî ke tazî swar bûn şe babana. <sup>77</sup>

---

Dîwana Salim,r,70<sup>74</sup>

Ziman û Edebî Kurdî Polî Duwazdeyî Amadeyî, Çapxaneyê Dar, Liblan,2012,r,150<sup>75</sup>

Dîwana Nalî, Lêkolînewey Mela Ebdulkerîm Muderîs û Fetah Ebdulkerîm, Çapxaneyê korî Zanyarî <sup>76</sup>  
Kurdî, Bexda, 1976,r,174

Dîwana Salim,r,66<sup>77</sup>



### 3.11 Bersiva Nameya Nalî Ji Alîyê Salim Ve

Nalîyê helbestvan li du welatan li istanbul dema roxandina mîrnîşana baban dibihîse nameyekê ji salim re dişîne. Salim bersiva nameya wî dide û dişîne wî cihê kû girîng. Ya ku balkêş ewe ku Nalî bi heman şêweyê Nalî nameyê dinivîse û bi pisportî bersiva wî dide.

Tîpa dawî ya rêzikên nameya Nalî bitîpa ( r ) ye bersiva Salimjî biheman tîpa Nalî daye ( Ba ) dike û nameyê jê re dişîne. Salim jî her piştîre dizivîrîne û bersivekê jibo wî rêdike Nalî di destpêka nameya xwe de dibêje :

Qurbanî tozî rêgetim ey badî xoş mrur.

Ey peykî şareza be hemû şarî ( Şarezor )<sup>78</sup>.

Salim jî di destpêka nameya xwe de dibêje:

Canim qîdayî sirweket ey badekeî seher

Wey peykî şareza le hemû rahî pir xeter.<sup>79</sup>

Nalî di vê nameyê de rewşa hinek cihên Silêmanîyê di pirse ku her wekî dibêje: ( Di vê qesîdeyê de cihê pîroz yên ji bo helbestvan: Bajarê ( Silêmanî Şarezor, Şêwesor, Kanî Askan, Xaneqa û Paşan odeya xwe ).<sup>80</sup>

Her wiha jî Salim jî bi temamî rewşa wan cihan ji bo wî radigehîne û jêre dibêje : Piştî roxandina Mîrnîşîna Baban çi bi serê wan de hatîye.

Nalî destura hatinê dixwaze û dibêje :

Aya Meqamî ruxsete lem beyne bêmewe.

Yan mesle het tewequfe ta yewmî nefxî sor<sup>81</sup>

Salim jî bersiv dide û dibêje:

Tuxwa bilê behçirtî ( Nalî ) dexîlî bim

Bem newe qet neka be Silêmanîya gozer.

Em molke nefmî nabî bebê edlî warpî

Bê ew beqsdî em grfe ba neka sefer.

---

Nalî Her Le Lutkedaye, Senterî Ronakbîrî Êlbeğî Caf,r,155<sup>78</sup>

Dîwana Salim,r,197<sup>79</sup>

Dîwana Salim,r,68<sup>80</sup>

Dîwana Salim,r,61<sup>81</sup>

Salm sft le bê kes ya ba nebê hîlak

Mn krđm ew eka lexema xuwênê xûê heder. <sup>82</sup> Bi mecborî Salim bersiva nemeya Nalî da ku di naverokê de şandîye bi wê hêvîyê bû ku xeberekî xweş bi dest bixe ji nîştîmana xwe. Mixabin Salim xebra wêranbûna nîştîmana wî ji bo wî rêkir.

### 3.12 Jîyan û Serpêhatîya Salim

Salimê helbestvan navê wî ( Ebdurehmanê Beg Mehmud Begê Ehmed Begê Sahêbqrane. Ji binemala Sahnqrane û pismamê Kurdîye. Binemala Sahbqrana ji Ehmed Begê mezin destpê dike. Yek ji duwazde siwarên Merîwan bû di bingehê de zozanîne tenê Mehmud Begê Kurdî dikeve Germênê û dibe wezîrê cenga dewleta Baban ) <sup>83</sup>. Helbestvanekî mezin yê kilasîka kurdîye yek ji helbestvanên sêkoçka babane. ( Li bajarê Silêmanîyê ji dayîk bûye. Di zarokatîyê de di mizgeftan de li cem Mela fêrî xwendinê bûye. Ji bo xwendinê li gelek cihên Kurdistanê geraye. Heya melayekî baş û pispore di feqetîya îslamî de jê derdikeve. Piştî dizivire Silêmanîyê. Lê belê ji ber têkçûna Mîrnîşana Baban ji Silêmanîyê çûye Tahranê. Li wir jî bi hestkirina koçberîyê li wir ne sekinî û zivirî Silêmanîyê. Piştî dagirkirina Silêmanîyê jialîyê Osmanîyan ve koçberê jêrê êraqê bû. Piştî aramîyekê dîsan zivirîye Silêmanîyê.

Ev nehatîye gelek bandor li ser gelê kurd kir. Gelek xem xwarîne. Helbestvanekî nîştîman perwerêrast bû. Yek ji damezirênerê dibistana kilasîkîye. Bi xwendina pileya hest û hişê xwendina xwe bilind kirîye. Wekî duwem kesê wêjeya kurdî piştî Nalî tê zanîn. Salim di destpêkê de nasnavê helbesta ( Rencûrî ) û ( Bîmar ) ji bo xwe danîbû. Lê belê piştî hat gohertin .

Şoreşekî mezin di helbestên kurdî de kirîye ( Cnas ) di nav de bi karanîye. Di zimanê farisî de jî desthilatekî hebû. Dîwana Helbestan di ( 1933 ) an de çapkir. Li Silêmanîyê di sala 1966 an de koça dawî kirîye. <sup>84</sup>

---

Dîwana Salim,r,66<sup>82</sup>

<sup>83</sup>Azad Ebdulwahid Kerîm, Sosyolojî Edeb, Lêkolînewey rexneyî, çapa dwê, 2011.

<sup>84</sup> 'Bdî Hacî , Çend tiyorên rexneya edebî , çapa îkê , dezgeha Spîrêz , weş .

Hacî Haşm , Hewlêr 2001 .

Sedemê goherîna nasnavê xwe ji ( Rencorî ) ji bo ( Salim ) ji ber ku vî helbestvanî gelek nexweşî ji ber lewazîyê bû. Hevalên wî jêre gotîne ew nasnavê teye te ji ber ç, gohertîye kirîye Salim, bi wateya laş sax, silametî her wekû bi xwe di helbesta xwe de dibêje.

Ewende çerxî dawim bê çerxim

Serapa laxrm wek riştey rîs <sup>85</sup>



---

<sup>85</sup>Hesen Caf ,*çîrokî niwêy kurdî* , weş .'Ela , Bexda 1815 .r12.

## Encam

1. Prf. Dr. Meruf Xeznedar navê wî Meruf Kurê Ebdulqadir Meruf Kurê Ezîz Axayê Xeznedar.
2. Di 1/ 11 / 1930 an de li bajarê Hewlêrê ji dayîk bûye. Di 15 / 10 / 2010 ande koça dawî kirîye.
3. Di sala 1951 an de xwendina Amadeyî tamamkirîye. Di sala 1957 an de dibe Mamoste û Bawernameya Bkalsorî li Zimanê Erebi werdigire.
4. Di sala 1960 ande li ser xwendina Rojhelatnasan ser bi Akademîya Zanistî a Sovyetê li bajarê Lênîngr de xwendîye. Di sala 1963 an de bawernameya Doktoratî, bi navnîşana Dîroka Wêjeya Kurdî a Nu wergirtîye.
5. Di sala 1973 ande pileya Yarîder Profesortî wergirtîye. Disala 1979 ande pileya Profesortî wergirtîye.
6. Zimanê Kurdî, Erebi, Turkî, Farisî û Rusî baş zanîye.
7. Rêveber û serokatîye dehan lêjne û bi dehan goftugoyên Macster û Doktoratî kirîye.
8. Xwedîyê 41 pirtûkên çapkirî û bi dehan Name û Govar bû.
9. Bi dehan Gotar û Hevpeyvîn bi Erebi nivîsandîye.
10. Rêveberîya 14 Nameyên ( Tezên ) Macisterê kirîye. Rêveberîya bi 10 an Nameyên ( Tezên ) Doktoratî kirîye.
11. Girîngtirîn pirtûka wî ( Dîroka Wêjeya Kurdî ) bû ku ji heft bergan pêkhatîye.
12. Pisporê wêjeya kurdîye, karîye mezintirîn zanîsta wêjeyî kombike.
13. Dîroka Wêjeya Kurdî, di sedsala 3 aKoçî de destpêkirîye. Ji alîyê Babe Tahirê Hemedanî ve hatîyê nivîsandin.
14. Dr.Meruf, diencama Dîroka Wêjeya Kurdî de, çendîn rexneyên zanîstî lê hatîye kirin.
15. Dîroka Wêjeya Kurdî gelek bandor bi ser wêjeya Welatên cîran de hebû.
16. Sedemên Ramyarî, Coxrafî, Sinoran û Mîrnîşana bandorekî zêde li ser pêşketina Dîroka Wêjeya Kurdî de hebû.
17. Nivîskar, Dîroknas, Rewşenbîr û Helbestvanên kurd hizir û fikrên cuda li ser vê wêjeyê hebûn.

## ÇAVKANÎ

- Azad Ebdulwahid Kerîm, Sosyolojî Edeb, Lêkolînewey rexneyî, 2011.  
-----, Niwêkirdnewe Le Şîrî Kurdî Da Le Dway Cengî Cîhanî Yekem Ta Salî 1970, Kerkuk, 2006.
- Anwer Muhimed Tahir , çend gutarekê rexneyî , ç1 ,1811.
- 'Arf hîtu , Hizir û Dîtin , weş. Êketya nivîserên kurd, Dihok 2004 .
- 'Bdalirhmin 'Bidulxefur Husin , ezmûnên nûxwazî di alyên grûpên nukrî , zanîngeha Koye 2012.
- 'Bdalle Yasîn 'Elî , peydabûnî rexney edebî le şî'rî klasîkî kurdî ta cengî cîhanî yekem , (master) , Hewlêr 1988.
- 'Bdalxalq Î'qubî , Rexna edebî û dibistanan , weş.Aras , Hewlêr 2003 .
- 'Bdî Hacî , Çend tiyorên rexneya edebî , çapa îkê , dezgeha Spîrêz , weş . Hacî Haşm , Hewlêr 2001 .
- 'Bidalqadir Muhimed Amîn , Wêneya şî'rî di edebyata romansîzm ya kurdî , çapa îkê weş. Serdem , Silfimanî 2002 .
- 'Bidalqharî Şêx , Ezmûnên hozana kurdî , weş.Pak , Hewlêr 2001 .
- Celal Mustefa , Biyavê xiwandinê , ç1 , ji weşanên ekteya nivîserên kurd – Dihok , weş .Hawar , Dihok 2004 .
- Binyad Meruf Xeznedar , Hevpeyvîn li gel 2017.
- Borekey, Sedîq SefîZade, Mêjoy Wêjeyî Kurdî, Antşarat Nacî, Çapî Yekem, 1370.
- Dilşad Ebdula, Nalî Xorêk Hemîşe Beser Sermanewe ( Jîyan û Berhem ), 2001.
- Eladîn Secadî, Mêjoy EdebîKurdî, Çapxaney Maruf, Bexda,1971.
- Ezîz Gerdî, Edeb û Rexne, Çapî Yekem, 1997.
- , Edebî Berawirdkarî, Çapxaney Zankoy Selahedîn,Hewlêr,1987.
- Emîn 'Bdulqadir , *têksit di navbera gotara rexneyî û rêbazên edebî da* , weş. Êketyanivîserên kurd, Dihok 2001 .
- Ibrahîm Ehmed Şivan, Edebî Konî Kurdî, Çapxaneya Zankoya Sellahedîn, 2012.
- Haşim Ehmed Zade, Azarman Ta Milet,erbil,2001.
- Hebîb Caf, Têrramanêk Le jîyanî Nalî, Govarî Koç ,1999.

Husên Mihemed Eziz, Yaqut û Zemrotî Kurdî, ( Xoşewîstî û Evîn )Silêmanî, 2013.

Hesen Caf ,çîrokî niwêy kurdî , weş .'Ela , Bexda 1815 .

Heval Selîm Teyb , bunyadgerî di nav rexneya kurdî da , destipêkê heta sala 2003ê , çapa îkê , dezgeha spîrêz , weş , Hacî Haşim , Hewlêr 2009.

Hîmîdad Husîn , derwazyek ji bo rexneya edebî ya kurdî , çapa îkê , weş,Mukiryani , Hewlêr 2003.

----- ,rêbazên edebî , çapa îkê , weş,Mukiryani , Hewlêr 2003 .

Husîn 'Arf , *çîroka hunerî ya kurdî* , 1825 -1890 , weş.Dar Tba'e ,Bexda 1830 .

Hejar Ehmed Abdulfexor Brwane Ruwanînekî Rexneyî Leser Nusînewey,

Fazil Mecîd Mihemed, Mêjoy Edebî Kurdî,Nemey Dokuratî, Zanokoy Silêman Silêmanî, 2013.

Kamil Hesen, Mêjoy Rexnesazî, Nawendî Xezel Nus, Çapî Yekem, 2015

Kemal Mezher, Çend Lapereyek Mêjoy Gelî kurd, Bexda, 1985.

Meruf Xeznedar, Le Babetî Mêjoy Edebî Kurdî we, Bexda, 1894.

-----, Şiirî Kurdî Sîyaser- Komalayetî û Kurdayetî Le Nêwan Herdu Cengî Cîhan, Roşenbîrî.

-----,Dîwanî Nalî Saxkirdnewe Leser Têkstî Destniwis û Çapkirwî Dîwanî Şaîr, Çapxaney Hacî Casim, Hewlêr,2008.

-----, Ezmunekî Le Rojgarêkî Nusînda, Dr. Azad Ebdulkerîm, Hewlêr,2011.

-----, Dîcle Hizrim, Hewlêr, 2009

Mela Ebdulkerîm Muderîs û Fatih Ebdulkerîm, DîwanîNalî, Çapxaney Kurî Zanyarî Kurd, Bexda,1976.

Maykl Asntfûrd, Dramdrî Br Flsfe Tarîx, Trcme Ahmd Kl Mhmd, 2006.

Muhamad Elî, Nalî Herle Lutkewe, Dezgay Çap û Pexşan Hemdî, Silêmanî,2009.

Osman Hem Xidir ( Deştî ), Şiirî Nawçey Mokiryani, Nîwey Yekemî Sedey Bîstem, Namey Dokuratî Zankoy Selahedîn,2007.

-----, Derbarey Nawerokî Sîyasî û Komalayetî Şiirekanî , Bedirxan, Silêmanî,2003.

Pertuk, Ziman û Edebî Kurdî Polî Duwazdeyî Amadeyî, Çapxaneyê Dar, Liblan,2012

Rêzan Salih Mewlud, Endîşey Şiîr Le Nêwan Rêbazî Kilasîk û Romansîkî Kurdî LeKurmancî Xwar, Namey Macester Zankoy Koyê, 2007.

Rafit Xenîm, Flsafe Al Tarîx

Rahnmay Nsrye Adbî Mhasr, M. Ebas Mxrb, Grhnû, Thran, Cac Duwem,2013.

Şêx Ebdalmohîn Merdoxî, Keşkulî Şiîrî Kurdî Goran, Saxkirdnewe Sereta Perawêz Nusînî Nunerî Sultanî,Silêmanî,2010

Rolan Bart , çêja deqê , çapa îkê, weş.Minare , Hewlêr 2003.

Selam Balayî , liber derzînkê têkistan , weş. Êketya nivîserên kurd Dihok 2004.

Selîm Reşîd êalh ,şewaz di çîroka kurdî da , weş.wezaretê roşnibîrî , Silîmanî 2005.

Semed Ehmed , dinav bazneya deqê da , ç1 , di blavkirya wezaretê roşnibîrî ,

Silêmanî 2003 .

Şêx Rezay Talebanî , dîwan , Bexda 1849.

Şikrî Muhîm 'yad , tiyorên edeb , wergîran(Serdar Ehmed) ,weş.Mardîn , Hewlêr 2010.

.Şukrîye Resul, Şiwên Zankoy Selahedîn, Kolêjî Adab, 20/2/2017 –Çawketin.

-----, Edebî Kurdî Hunerekanî Edeb, 1989,

.Nalî , Dîwana, Lêkolînewey Mela Ebdulkerîm Muderîs ûFetah Ebdulkerîm, Çapxaneyê korî Zanyarî Kurdî, Bexda, 1976.

.Nalî Her Le Lutkedaye, Senterî Ronakbîrî Êlbeğî Caf.

.Xorşîd Reşîd Ehmed, Rêbazî Romantîkî Le Edebî Kurdî da

Yasrê Hesên , *wexerek di nihênnyên deqêda* , ji weşanên îketya nivîserên Kurd , Dihok , weş . Hawar 2004 .

-----, *binyatê rîtmê di şî'ra nû ya kurdî da* ,weş .Spîrêz , Hewlêr,2003

'Zedîn Mustefa Resul , *edebyata nû ya kurdî* , weş , wezareta xiwendna blind ,  
Erbîl 1818 .

Hevpeyvîn Li gel Dr Ibrahîm Ehmed Şivan, Zankoy Sellahedîn, Kolêjê Adab,  
24,5,2017





**Hinek Wêneyên Meruf Xeznedar**









